

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN U ÇANDA KURDÎ



MEKAN DI ROMANÊN BILIND MIHEMEDÎ DA
(MÎNAKA SOTINGEH Ê GEHNOMÊ)



TEZA LÎSANS A BILIND

Xwendekar
Musafer Sharif NASER

Şêwirmend
Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

WAN - 2024

T.C.

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSİTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



BİLİND MİHEMED'İN ROMANLARINDA MEKAN
(SOTİNGEH VE GEHNOM ÖRNEKLERİ)



YÜKSEK LİSANS TEZİ

Öğrenci

Musafer Sharif NASER

Danışman

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

VAN - 2024

KABUL VE ONAY SAYFASI

Musafer Sharif NASER tarafından hazırlanan “**Mekan di Romanên Bilind Mihemedî da (Mînaka Sotingeh û Gehnomê)**” adlı tez çalışması aşağıdaki jüri tarafından **OY ÇOKLUĞU** ile Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enistitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak kabul edilmiştir.

Danışman: Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enistitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum.

.....

Başkan: Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ

Van YYÜ İlahîyat Fak. Tefsir Anabilim Dalı

Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum.

.....

Üye: Dr. Öğr. Üye. M. Şirin FİLİZ

Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enistitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylamıyorum.

.....

Tez Savunma Tarihi:

14/05/2024

Jüri tarafından kabul edilen bu tezin Yüksek Lisans Tezi olması için gerekli şartları yerine getirdiğini ve imzaların sahiplerine ait olduğunu onaylıyorum.

.../... / 2024

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

Yaşayan Diller Enistitüsü Müdürü

ETİK BEYAN SAYFASI

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü **Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;**

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim. (14/05/2024)

İmza

Musafer Sharif NASER

(Lîsansa Bilind)
Musafer Sharif NASER
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YIL
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
Gulan - 2024
MEKAN DI ROMANÊN BILIND MIHEMEDÎ DA
(MÎNAKA SOTINGEH Û GEHNOMÊ)

KURTE

Ev lêkolîn hewldanek e ji bo behskirina çawanîya mekanî wekî rêgezeke hunerî di nav romanê da û herwiha çawanîya pratîzekirina peywendîyên mekanî bi kes, rûdan, dem û dîyaloga metnên romanê ve ligel pratîzekirina cureyên mekanê. Anku lêkolîneka teorîk-pratîkî ye ku lêkolîna romanê ji aliyê çawanîya bercestebûna mekanî di nav pêkhateya hunerî ya romanê da dike. Şirovekirina metnên afirandî bi giştî û bi taybetî romanê, yek ji giringtirîn û karîgertirîn rêgezên hunerî ne ku karîgerîyê li ser tevahîya pêkhateya hunerî û dahênana edebî di nav romanê da dike. Dîsa mekan dibe alaveke rexneyê ya giring di destên lêkolerî da ku ji bo dîyarkirina wê wateya veşartî ya di nav du romanên Bilind Mihemedî da hatî bercestekirin. Ev tez, li ser sê beşan hatiye parvekirin. Beşa yekemîn ji bo danîna çarçoveya teorîk li ser zarav, têgeh, pênasê, karîgerî û rehendên mekanî yên di romanê da sekinîye. Beşa duyemîn û sêyemîn jî ji bo beşên teorîk û pratîkî hatiye terxankirin. Qismê pratîkî li ser her du romanên *Sotingeh* û *Gehnomê* ye û di beşa duyemîn da behsa peywendîya mekanî li gel çar rêgezên din yên hunerî yên romanê kes, rûdan, dem û dîyalogê hatiye kirin û paşî çendîn mînakên pratîkî ji her du romanan hatine şirovekirin. Di beşa sêyemîn da bi rengekî teorîk behsa cureyên mekanî hatiye kirin û bi berfirehî çendîn mînakên pratîkî li ser mekanan hatîne şirovekirin. Dawîyê ji bo me xuya bûye ku mekan weku rêgezeke hunerî bi rengekî berfireh û bi teknîkeka hunerî berceste bûye û peywendîyên mekanî bi rêgezên din ên romanê ve bi rengekî baştir hatine encamdan. Di romanan da cureyên mekanî bûne sedemên dîyarkirina wateya veşartî ya mijarên her du romanan.

Peyvên Sereke: Edebîyata nû, Roman, Mekan, Bilind Mihemed, *Sotingeh*, *Gehnom*.

Hejmara Rûpelan: I-V + 1-89

Şêwirmend: Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

(Yüksek Lisans)
Musafer Sharif NASER
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
Mayıs - 2024
BİLİND MIHEMED'İN ROMANLARINDA MEKAN
(SOTİNGEH VE GEHNOM ÖRNEKLERİ)

ÖZET

Bu tez, sanatsal bir yöntem olarak romanda mekânsal yöntemin tartışılmasının yanı sıra, mekân türlerinin pratiğiyle birlikte roman metinlerinde kişi, olay, zaman ve diyalogla olan ilişkisinin nasıl uygulandığını tartışmayı amaçlamaktadır. Başka bir deyişle sanatsal bir yapıya sahip romanda, mekansal perspektifi esas alarak hem teorik hem de uygulamalı ilerleyen bir çalışmadır. Genel bir çerçevede yaratılan metinlerin, özelde ise romanın yorumlanması, romandaki tüm sanatsal yapının ve edebi buluşun verimliliğini artıran en önemli ve etkili sanat yöntemlerinden biridir. Bilind Mihemed'in iki romanında da mekân, araştırmacının elinde gizli anlamın tespitinde kullanılan önemli bir eleştiri aracı haline gelir. Bu tez üç ana bölümden oluşmaktadır. Birinci bölüm, romandaki anlatı, kavram, tanım, verim ve mekânsal referanslar üzerine teorik çerçeveyi oluşturmaktadır. İkinci ve üçüncü bölümler teorik ve pratik kısımlara yer vermiştir. Pratik bölümlerde tartışma *Sotingeh* ve *Gehnom* adlı iki roman üzerinde odaklanmıştır. İkinci bölümde, romanın dört sanatsal unsuru olan kişi, olay, zaman ve diyalogun mekan ile olan ilişkisini açıklarken örneklem olarak seçtiğimiz iki romanelerden de örnek pasajlara yer verilmektedir. Üçüncü bölümde mekân türleri teorik olarak ele alınmakta ve mekânlara ilişkin çeşitli pratik örnekler ayrıntılı olarak anlatılmaktadır. Sonuç olarak, sanatsal bir yöntem olarak mekânın geniş bir biçimde ve sanatsal bir teknikle geliştirildiği, mekânsal ilişkilerin romanın diğer unsurlarıyla daha iyi sonuçlandığı görülmüştür. Örneklem olarak ele aldığımız iki romandaki mekân türleri, bu romanlarda ele alınan temaların gizli anlamlarını ortaya çıkarmaya olanak sağlamıştır.

Anahtar Sözcükler: Modern edebîyat, Roman, Mekan, Bilind Mihemed, *Gehnom*, *Sotingeh*.

Sayfa Sayısı: I-V + 1-89

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

(Master's Degree)
Musafer Sharif NASER
VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES
May - 2024
SPACE IN BİLİND MİHEMED'S NOVELS
(SOTİNGEH AND GEHNOM EXAMPLES)

ABSTRACT

This study aims to discuss the spatial method in the novel as an artistic method, as well as the practice of space types and how their relationship with person, event, time and dialogue is applied in novel texts. In other words, the novel, which has an artistic structure, is a study that proceeds both theoretically and practically, based on spatial perspective. The interpretation of texts created in a general framework, and the novel in particular, is one of the most important and effective artistic methods that increases the efficiency of the entire artistic structure and literary invention in the novel. In both of Bilind Mihemed's novels, space becomes an important critical tool in the hands of the researcher, used to detect the hidden meaning. This thesis consists of three main parts. The first part creates the theoretical framework on the narrative, concept, definition, efficiency and spatial references in the novel. The second and third chapters are divided into theoretical and practical parts. In the practical sections, the discussion proceeds through two novels, Sotingeh and Gehnom. In the second part, while explaining the relationship between the four artistic elements of the novel, namely person, event, time and dialogue, and space, sample passages from the two novels we chose as examples are also included. In the third chapter, types of spaces are discussed theoretically and various practical examples of spaces are explained in detail. As a result, it has been seen that space as an artistic method has been developed extensively and with an artistic technique, and spatial relations have resulted better with other elements of the novel. The types of places in the two novels we considered as examples made it possible to reveal the hidden meanings of the themes discussed in these novels.

Keywords: Modern literature, Novel, Space, Bilind Mihemed, Gehnom, Sotingeh.

Number of Pages: I-V + 1-89

Thesis Advisor: Assoc. Dr. Yakup AYKAÇ

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
DESTPÊK	1
1. TÊGEH, PÊKHATE Û REHENDÊN MEKANÎ	6
1.1. Zaravê Mekanî	6
1.2. Têgeh û Pênaseyên Mekanî	6
1.2.1. Têgeha Mekanî ji Alîyê Edebî ve	7
1.2.2. Têgeha Mekanî ji Alîyê Felsefeyê ve	8
1.2.3. Têgeha Mekanî ji Alîyê Hunerî ve	10
1.2. Bandora Mirovî li ser Mekanî û ya Mekanî li ser Mirovî	12
1.2.1. Bandora Mekanî li ser Mirovî	12
1.2.2. Bandora Mirovî li ser Mekanî	13
1.3. Rehendên Mekanî	14
1.3.1. Rehenda Cografîk	14
1.3.2. Rehenda Derûnî	15
1.3.3. Rehenda Dîrokî	16
1.3.4. Rehenda Babetî	17
1.4. Giringîya Mekanî di nav Pêkhateya Romanê da	18
2. PEYWENDÎYÊN MEKANÎ DI NAV ROMANÊ DA	21
2.1. Mekan û Kesayetî	21
2.1.1. Peywendîya Mekanî bi Kesayetîyên Romana <i>Sotingehê</i> re	23
2.1.2. Peywendîya Mekanî bi Kesayetîyên Romana <i>Gehnom</i> ve	27
2.2. Mekan û Rûdan	30
2.2.2. Peywendîya Mekanî bi Rûdanên Romana <i>Gehnomê</i> re	35
2.3. Mekan û Dema Romanê	37
2.3.1. Peywendîya Mekanî bi Demê Romana <i>Sotingeh</i> ve	40
2.3.2. Peywendîya Mekanî bi Demê Romana <i>Gehnomê</i> re	42
2.4. Mekan û Dîyalog	44
2.4.1. Peywendîya Mekanî bi Dîyaloga Romana <i>Sotingehê</i> re	48
2.4.2. Peywendîya Mekanî bi Dîyaloga Romana <i>Gehnomê</i> re	51

3. CUREYÊN MEKANÎ DI ROMANÊ DA.....	53
3.1. Cureyên Mekanî.....	53
3.1.1. Mekanê Vekirî.....	55
3.1.2. Mekanê Girtî	56
3.1.3. Mekanê Aşna.....	57
3.1.4. Mekanê Neaşna	57
3.1.5. Mekanê Ketwarî.....	57
3.1.6. Mekanê Hunerî.....	57
3.2. Cureyên Mekanî di Romana <i>Sotingehê</i> da	57
3.2.1. Mekanên Vekirî.....	57
3.2.2. Mekanên Girtî	65
3.3. Cureyên Mekanî di Romana <i>Gehnomê</i> da	73
3.3.1. Mekanên Vekirî.....	73
3.3.2. Mekanên Girtî	80
ENCAM	85
ÇAVKANÎ	87

DESTPÊK

Ev lêkolîn ji sê beşên sereke pêk tê û her beşek di nav xwe da li ser çend beşan parve dibe. Beşa yekê bi navûnîşanê têgeh û pêkhate û rehendên mekanî hatîye encamdan. Ev beş van beşan bi xwe ve digire: Zaravê mekanî, têgeh û pênasayên mekanî, bandora mirovî li ser mekanî û bandora mekanî li ser mirovî, rehendên mekanî, giringîya mekanî di nav pêkhateya romanê da. Beşa duyem bi navûnîşanê peywendîyên mekanî di nav metna romanê da hatîye encamdan. Ev beş van beşên sereke bi xwe ve digire: Mekân û kes, mekan û bûyer, mekan û dema romanê, mekan û diyalog. Beşa sêyem bi navûnîşanê cureyên mekanî di romanê da hatîye encamdan. Ev beş van beşên sereke bi xwe ve digire: Cureyên mekanî, mekanê vekirî, mekanê girtî, mekanê aşna, mekanê neaşna, mekanê ketwarî, mekanê hunerî, cureyên mekanî di romanên *Sotîngeh* û *Gehnomê* da. Dawîyê ev lêkolîne gihişte komeka encaman û listeya çavkanîyan jî bi xwe ve digire.

Vegêrana edebî bi taybetî roman piştbestineka rasterast li ser komeka teknîk û rêgezên hunerî dike û yek ji wan rêgezên hunerî mekan e. Anku em dikarin bibêjin mekan weku rêgezeke hunerî di nav romanê da dibe yek ji saxletên romanê. Helbet bikaranîna mekanî di nav romanê da ne pêvajoyeke eletexmînî ye. Bêguman pêdivî bi şarezayî û hûrbînîya nivîskarê romanê heye. Çinku eger mekan weku teknîka hunerî ya romanê di nav derdor-xwezaya xwe ya dirust da nehatibe bikaranîn, wê demê çi giringîya vî mekanî namîne. Ji alîyekî dîtir ve, ew kesayetîyên di nav her metneka romanê da rola xwe digirin ji bo pêşvebirina rûdanên romanê, pêdivîyatî bi mekanekî heye da bikare bi awayekî çalak rola xwe bigêrin û li dûv vê çendê em dikarin bibêjin eger mekan di nav romanê da nebe, vê carê kes nikare rola xwe bigêre û di encamê da saxlemîya romanê namîne. Her wisa rexneya edebî di nav pêvajoya şirovekirina bi giştî edebî û bi taybetî romanê da, piştbestineka mezin li ser rêgeza mekanî ji bo şirovekirin û hilkolana romanê dike da ku di encamê da bikare bi temamî wê wateya veşartî ya di nav da heye şirove û aşkera bike.

Mijara teza me tehlîleke li ser mekanên di romanên Bilind Mihemedî da ye. Cureyên mekanên edebî û têkilîya wan a ligel jîyana rasteqîn û derûnîya karakterên romanên hatîye nirxandin. Her wiha me ew teorî û mijarên hunerî weku rêgezên hunerî di nav romanê da diazirin, wekî arasteyek yan jî bingeheke teorîyê bo rexneya

edebî bi kar anî û me li ser her du romanên *Sotingeh* û *Gehnomê* pratîze kirin. Dîsa ji alîyekî din ve, ev tez bi rengekî pratîkî behsa mekanî di nav romanên nivîskar Bilind Mihemedî da dike. Her ji sernavê lêkolînê sînore vê mijarê dîyar û aşkera ye. Anku lêkolîn di nav sînore xwe yê teorî da, bi tenê rêgeza mekanî weku teknîka hunerî bi awayekî metodî bi xwe ve digire. Dîsa sînoren pratîkî yên vê lêkolînê bi tenê her du romanên *Sotingeh* û *Gehnomê* yên nivîskar Bilind Mihemedî bi xwe ve digire.

Armanca sereke ya vê tezê ew e ku dixwaze şîyanên hunerî yên nivîskarê romanê xuya bike. Erê, çawa û bi çi awayî karîye mekanî weku rêgezeke hunerî di nav romanên xwe da berceste bike. Anku dîyarkirina bihayê hunerî û edebî yê bikaranîna mekanî ye di nav her du romanên da ta di encamê da em bikarin wê wate û delaleta veşartîya li pişt rêgezê mekanî heye di nav her du romanên da xuya bikin. Lêkolîna me ji du beşan pêk hatîye: Alîyê teorîk ji wan mijar û teorîyên mekanî weku rêgezeke hunerî di nav romanê da didin naskirin pêk hatîye û alîyê pratîkî ji pratîzekirina peywendî û cureyên mekanî di nav her du romanên da pêk hatîye, me ji bo vê yekê rêbaza *wesfî – şirovekarî* bi kar anîye.

Cudahî û giringîya vê tezê ew e ku, ji tez xebatên berî xwe hatine nivîsandin berfirehtir e. Li ser hemû cureyên mekanî disekine û giringîya wê ya di nav metan romanê da nîşan dide ku alîyên veşartî yên romanê destnîşan dike. Her wiha di vê tezê da me dît ku rêgeza mekanî weku rêgezeke hunerî di nav romanê da hatîye encamdan ku vegêrana edebî xurtir dike. Her wiha bi aşkerayî tê dîtin ku romanên kurdî guncan in ku alîyê teorîyê ve bîna lêkolînkirin û rexneyeka edebî li ser bê kirin. Mekan weku rêgezeke hunerî di nav romanê da rewşa karakteran û honaka rûdanên romanê saxlem dike. Bi tezê jî aşkera dibe ku wekî hêmanên sereke bikaranîna mekanan di romanê da vegêranê dewlemendtir dike.

Kurtayek ji bo Jînenîgarîya Bilind Mihemed

Mihemed 10ê Cotmeha 1968an li Dihokê ji dayîk bûye. Bi gotina wî, sala ku ew ji dayîk bûye, saleke zehmet bûye ji bo malbata wî. Çinku hikumeta Îraqê xaniyê babê wî dişewitîne û malbata wî ji neçarî koçî Dihokê dike. Bilind, di malbateke hejar û xizan de mezin bûye. Piçûktirîna çar bira û du xwişkên xwe ye. Ew li xwendîngeha Newrozê di sala 1975an de dest bi xwendinê kirîye û heta çar salan bi

kurdî xwendîye. Lê piştî ji ber desthilatdarîya rejîma Beasê xwendina kurdî lawaz bû û zimanê erebî bû zimanê sereke yê xwendinê. Wî jî ji sala pêncan ve dest bi xwendina bi zimanê erebî kirîye û xwendina xwe ya navîn û amadeyî jî her dîsa bi erebî li Xwendîgehên Sêmel û Dihokê xwendine. Di navbera salên 1994-1995an de jî Peymangeha Mamosteyan a Dihokê der çûye. Sala 1985an jî alîyê rejîma Beasê ve tê girtin û bi qasî neh mehan serwinda dibe. Piştî di tarîxa 27/02/1986an de li Dadgeha Alpûreyê ya Bexdayê tê darizandin û bo deh salan tê zindankirin û li Zindana Ebûxerîb radizê. Di wan salan de rastî îşkenceyên cûr bi cûr û gelek giran tê. Gelek kes xwekî wî li wir rastî îşkenceyê hatine, hinek hatine kuştin, hinek bi komî hatine kuştin. Bi vî awayî ji xwendina xwe qut dibe û êdî tu xwendîgeh nikare wî wergire. Çinku rejîma Beasê bi înzeya Seddam Hîsên, biryarekê belav dike ku kesên ji ber tohmata siyasî hatine girtin dê nekarin li xwendîgehên fermî bixwînin. Sala 1986an, di meha Nîsanê de, Rejîma Îraqê efûyeke giştî radigihîne û ew jî di tarîxa 8/06/1986an de tê berdan û digihêje malbata xwe. Piştî tê berdan ew dîsa berê xwe dide xwendinê. Lê heta sala 1991ê dimîne ku li Başûrê Kurdistanê serhildan pêk tê. Ew jî di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî de vedigerin malên xwe li Dihokê. Hingê hemû sazîyên girêdayî hikûmetê ji Kurdistanê vedikêşin û kurd bi xwe îdareya xwe li van sazîyan dikin. Loma xwendîgehên bi zimanê kurdî careke din dest pê dikin. Bilind, careke din hewla xwendinê dide û pola şeşemîn a xwendina amadehîyê dibe serî. Ew li Peymangeha Melbendî ya Mamostayan Pişka Ziman û Edebîyata Kurdî xwendina xwe temam dike û bawernameya xwe ya bi zimanê kurdî bi dest dixe. Niha jî wekî Serperîştîyarê Çalakîyên Hunerî li Rêveberîya Çalakîyên Qutabxaneyan li Perwerdeya Giştî ya Parêzgeha Dihokê kar dike (Ebdulrehman, 2021: 83 û 113).

Hêza wî ya bo nivîsînê hêj zû de dest pê kirîye. Dema wî xwestîye helbestan guhdarî bike û çîrokan bixwîne, ew li qonaxa seretayî bûye. Wî xwe bi xwe hizir kirîye ka helbestvan şair van peyvên şîrîn çawa dihevin û bi rêk dixin. Ev pirs her li gel wî bûye ta ku wî di qonaxa şeşê ya perwerdeya sereteyî de ji bo Pişka Zarokan a Radyoya Bexdayê ya Kurdî dest bi nivîsîna çîrokan kir ku li ser radyoyê dihatin xwendin. Bi vî awayî hêza nivîsînê li gel wî peyda bûye û gelek keyfa wî pê hatîye. Ya rastî ew zarokê bêdeng bûye. Zêde nediket nav zarokan û pitir yekî veder bûye. Loma wî gelek heval nebûne û hevalê wî yê herî nêzîk birayê wî bûye ku tenê salekê ji wî mezintir bû. Lê ew jî pir zû çûye rehetê û tekane hevala wî bûye dayîka wî.

Babê wî jî nojdarekî millî bû ku birîn, şikestin û derdên xelkî derman dikirin. Ew niha xêzandar e û bi navê Arî û Havî du zarokên wî hene ku her duyan jî Qonaxa Zankoyê temam kirine. Her wiha hevjinê wî jî çîroknûs e û xwedî du romanên e ('Ebdulrehman, 2023: 154-155).

Bilind, sala 1988an yekem berhema xwe, wekî helbest di *Kovara Beyanê* da bi navê *Jivan* belav dike. Bi vî awayî ew li nivîsînê berdewam dike ku berî serhildanê di Rojnameya Hawkarî û Bizav ku li Bexdayê dihat weşandin berhemên xwe belav kiribûn. Her wiha karê rojnamegerîyê jî kirîye ku li kovar û rojnameyên weku *Tîroj*, *Peyv*, *Zaxo*, *Dicle*, *Nûbûn*, *Peyman*, *Birayetî*, *Xebat*, *Evro*, *Belavoka Gulzar* û *Waarê* nivîskarî û peyamnêrî kirîye û kanala *Dihokê*, *Bişkoj*, *Sivore* û Kanala *Perwerdeyê* ya Dihokê weku sernivîskarê nûçeyan xebitîye. Li Rojnameya *Evroyê* jî jimareya 1ê heta 98an weku sekreterê nivîsînê xebitîye. Li Rojnameya *Waarê* wekî berpirsê pişka Dengûbasên Navxweyî cih girtîye. Weku sernivîskarê Kovara *Nûbûnê* kar kirîye ku bi tîpên latînî li Dihokê ta sala 2014ê derdiket. Wekî sekretêrê nivîsînê li belavoka *Gulzarê* ya Çalakîyên Xwendingehan ku 19 jimare jê derçûne xebitîye. Wekî rêveberê kanala perwerdeya Dihokê di serdema 2021-2022an de kar kirîye. Berhemên xwe li piranîya kovar û rojnameyan belav kirine. Niha li perwerdeya giştî ya Dihokê bi pileya serperîştyarê hunerî li Rêveberîya Çalakîyên Xwendingehan mamosta ye.

Berhemên wî yên çapkirî ev in: *Şev û Yadgarî* - Helbest 1996, *Ji Bîrhatinên Mela Qasimê Koçer* - 1998, *Cografîya Guzarî* - 2000, *Semaya Xokuştinê* - Helbest 2001, *Tiştên Nemir* - Helbest 2004, *Sotingeh* - Roman 2005, *Eşîq li Jêr Pira Çînotê* - Helbest 2006, *Baxçeyê Awazan* - Helbest ji bo zarokan 2007, *Bêhodeyîya Canî* - Helbest 2022, *Gehnom* - Roman 2022, *Gokmêla* - Roman – 2023.

Derbarê gringîya nivîskarî, Shakespeare dipirse, gelo ez zindî me? Gelo ez heme? Gelo ji bo hebûnê hestkirin pêwîst e? Nexwe ez kîm e? Şikispîr bi vî awayî dipirse, em dikarin bibêjin Romman jî li van pirsan digere, hewl dide van pirsan zêdetir bixe rojevê. Lê bersivan di taryatîyê de dihêle, çima? Ji ber ku nivîser dixwaze bala xwendevanî ji bo nava nivîsî bikişîne. Ev bala xwendevanî ji bo nava tekestê giringîyeke mezin heye. Nêrîna min ewe ku, bi hev re mêjîyê xwe bilivînin, dibe armanc ji livandinê guhertin be. Hewla me di nivîsanê de ew e ku livîn di

mêjîyê mirovan de were kirin û rawestayî nemîne. Ji bo ku em zêdetir evê xalê zelal bikin, em dikarin bibêjin; divê armanceke nivîskarî hebe. Divê hizir û naveroka Romanê di xizmeta wê livînê debe, ji ber ku eger Roman bê armanc be, dê weke girareke bê xwê be, bê tam be. Roman mirovî ber bi hestên nû ve dibe, û bi xwendina romanê firehîya ferhenga ziman nîşan dide, tevî vê yekê roman dibe sedem ku romannivîs li pey zanyarîyan biçe, ji alîyek din ve jî li xewn û xeyalan bigere. Dema waqieke tehl û nexweş çêdibe, roman dibe navbeynek ji bo revînê.



1. TÊGEH, PÊKHATE Û REHENDÊN MEKANÎ

1.1. Zaravê Mekanî

Zaravên her mijareka edebî roleka mezin ji bo aşkirekirina babetî digêrin û lêkolera dê bikare pitir di nav kûratîya babetî da biçe xwarê. Sebaret zaravê mekanî di nav zimanê îngilîzî da *place* hatîye danan (el-Be'lebekî, 2008: 876). Lêbelê li gel vê çendê jî di nav zimanê îngilîzî da zaravek din jî bi kar tê, ew jî zaravê *space* (Hacî, 2012: 34) anku valahî ye. Ji vê çendê dîyar dibe ku di zimanê îngilîzî da her du zaravên *place* û *space* ji bo mekanî bi kar tên. Di zimanê erebî da zaravê *el-mekan* anku mekanê peydabûna tiştî tê gotin (Doskî, 2016: 907). Derbarê zimanê kurdî û her weku di piranîya çavkanîyan da amajeyê pê didin, ev zarave di ferhenga Kameran da ji bo mekanî *mekan*, *şûn*, *war* (Botî, 2002: 131) hatîye gotin. Li dûv vê yekê xuya dibe ku zaravê mekanî berceste ya xwe ya rexneyî di nav zimanên behskirî da wergirtiye.

1.2. Têgeh û Pênaseyên Mekanî

Metna edebî ya afirandî piştbestinê li ser komeka rêgez û teknîkên hunerî û edebî dike. Mekan ji bo danîna saxleta edebî û hunerî yek ji van rêgez û teknîkên hunerî ye. Ji alîyekî din ve, eger em li mekanî binêrin, dê bibînin ku her ji destpêka peydabûna mirovî li ser rûyê erdê heta niha berdewam mirovî bizav kirîye ku wan tiştên li derdora xwe nas bike û xwe ji nexweşî û derdeserîyên xwezayî biparêze (Qadir, 2006: 26). Anku, mekan bûye rehendeke sereke di nav jîyana mirovî da û mirovî hebûna xwe bi rêka mekanî parastîye. Dîsa mekan bûye rehendeke sereke û qulaçeka giring û hestiyar di nav mirovatîyê da cihê xwe girtiye (Hacî, 2012: 35). Li pey vê yekê, em dikarin bibêjin ku têgeha mekanî li cem mirovan derbirînê ji hindê dike ku *mekan* pêkhatyek civakî ye, derbirînê ji puxteya wê peywendîyê dike ya di navbera mirovî û civakê da heyî (Alneseer, 2004: 16), anku her karê ku li ser erdê tê kirin, rengvedana rewşa mirovan ya li ser wê erdê dide der. Dîsa her cihê ku mirovî xwe gihandîyê navek lê danaye û ew navlêkirin bûye sedema wê yekê ku mirov, aşnatîyê li gel mekanî peyda bike û bixe bin serwerîya xwe (Zetdîn, 2009: 60). Her wisa, ji alîyekî din ve, em bi rêya mekanî dikarin derûnî, hizir û awayê danûstandina mirovan li gel hevdu bizanin (Alneseer, 2004: 17).

Têgeha mekanî weku rêgezeke hunerî, warekî mezin bi xwe ve digire, ji bo xurtkirina vê yekê em dê pitir têgeh û pênaseya mekanî aşkera bikin. Li vir em dê têgeha mekanî ji van her sê alîyên xwarê nîşan bidin.

1.2.1. Têgeha Mekanî ji Alîyê Edebî ve

Mekanî roleka mezin û karîger bi giştî di nav edebîyatê de û bi taybetî di nav romanê da heye. Çinku mekan bandorê li ser metna edebî dike û bihayê metnê bilind dike û her wiha derbirîna ji meremên nivîskarî dike (Le'tîqî, Tiwatî û Bin 'Elî, 2013: 12). Loma, mekan bihayê edebî yê metnê bilind dike û dirûvê edebî yê metnê pirtir berceste dike. Hemî rêgez û pêkhateyên edebî yên romanê di nav têgeha mekanî de cihê xwe digire û mekan ligel karakteran çarçoveyeka danûstandinê çêdike û tevkarîya di navbera wan da digihêje yekbûnê organîzekirî, anku mekan û karakter bi hev ra rûdanan peyda dikin û wan araste dikin ku her yek a din bi pêş ve dibe (Ebas, 2017: 108). Ji vê yekê aşkera dibe ku mekan ji alîyê edebî ve, têgehekê berfireh bi xwe ve digire û dibe sedem ku hemî rêgezên edebî yên din di nav romanê da bi pêş ve biçin.

Nivîskar Yuri Lotman, ji alîyê edebî ve derbarê têgeha mekanî de dibêje ku mekan ji komeka tiştên li gel hev guncan pêk tê, weku diyarde û rewş, erk û wêne û delaletên ku peywendîyek mekanî di navbera wan da heyî (Foxalî, 2008: 173). Li gor vê yekê, têgeha mekanî ji alîyê edebî ve derbirîna ji wê peywendîyê dike ku di navbera mekanî û hemî rêgezên din ên di nav romanê da hene. Ger em ji alîyê din li têgeha edebî ya mekanî binêrin, dê bibînin ku mekan di romanê da ne ew mekanê navmalî ye ku em tê da dijîn, ew weku rêgezek ji rêgezên pêkhênerên romanê hatiye ristîn (Umer, 2007: 167). Anku, têgeha mekanê edebî cuda ye ji mekanê jîyanê û em weku rêgezek edebî serederîyê li gel mekanê romanê dikin. Dîsa, mekan ji alîyê edebî ve hatiye pênasekirin ku ew yek ji beşên sereke yê vegêranê di nav metnê da. Herwiha çî roman bêyî mekan nabin û çî rûdan nikarin bêyî mekan bêne rûdan û li dûv vê çendê xuya dibe ku mekan rêgezeke sereke ye di nav pêkhateya metna vegêranê da (Rizqî, Bilkwasî û Semad, 2020: 5). Têgeha mekanî ji alîyê edebî ve biyavekê berfirehtir bi xwe ve digire û tê dîtin ku mekanê edebî ji wê cîhana berfireh pêk tê ku komeka rûdanên romanê bi xwe ve digire û her tiştêkê li derdora me bi xwe ve digire (Lihemdanî, 1991: 63). Ji vê danasînê ji bo me xuya dibe ku mekan di nav

metna edebî da ji mekanê navmalî berfirehtir cih digire, çinku nivîskar dê mekanî li gor xeyala xwe bixe nav metna edebî û dê li gor hêza xwe mekanekî li nav metnê biafirîne.

Têgeha mekanî ji alîyê edebî ve li cem Greimas bi vî rengî hatîye dîyarkirin: Mekan ew pêkhateya metna edebî ye ku komeka rêgezên bêmekan bi xwe ve digire û ev rêgez li ser pergaleke endazyarî hatine binecihkirin û di encamê da ji wan peywendîyan wêneyekê pêk tînin yên ku di nav gotara vegêranê da hatine bercestekirin (Bin Haşim û yên din, 2017: 12-13). Anku, mekan di nav metna vegêranê da dibe sedem ku hemî pêkhateyên edebî bi hev ra bîrêdan û ev mekan dibe wêneyek li ser kar û çalakîyên hemî pêkhateya edebîya romanê. Çinku mekan dibe ew rehend ku em bi rêya wê li romanê temaşe dikin û dibe derazînkek ji wan derazînkên yên ku em bi rêya wan dikarin li nav cîhana romanê binêrin û di encamê da dikarin ramana kûr û veşartî ya romanê bizanin (Xelîl, 2010: 131-132). Her ji vê bergehê ve mekan ji alîyê xwe yê edebî ve dibe paşxaneyê hemî rûdanên romanê di nav da diqewimin (Qassim, 1978: 106). Ji derencamê vê nîşandana borî bo têgeha mekanî ji alîyê edebî ve, em digihêjin wê encamê ku mekan yek ji rêgezên sereke û binecih e di nav pêkhatina edebî ya romanê da. Her wiha dibe binemayeke sereke ji bo hindê ku hemî rêgezên din ên romanê rola xwe di nav rûdanên romanê da bigêrin û dîsa mekan dibe derazînk ji bo hindê ku em bi rêya wî bikarin wê wateya veşartî ya romanê bizanin.

1.2.2. Têgeha Mekanî ji Alîyê Felsefeyê ve

Ji ber giringîya mekanî ya di nav jîyana mirovan da, vî carê mekan bûye rehendeke sereke di nav hemî awayên hizirkirinê yên mirovî da. Mekan, weku piranîya zanistên kevn di nav felsefeyê da jî bi germî hatîye behskirin û hizra felsefî ya mirovî bi berfirehî li ser vî çendê rawestîyaye (Hacî, 2012: 35). Fîlozofan mekanekî taybet ji bo mekanî di nav pirtûkên xwe da terxan kirine. Gelek boçûnên ji hev cuda ji alîyê fîlozofan ve li ser têgeha mekanî ji alîyê felsefî ve hatîne derbirîn. Hêj ji berî Sokrates, her çiqas pirtûk nenivîsandibin jî ev babeta mekanî bûye mekanê giringî û pûtedana fîlozofan (Henîye, 2013: 16). Fîlozofê yewnanî Platon danasîna mekanî ji alîyê felsefî ve weha dike: Mekan ew amûr e ku di nav cîhana hestpêkirî anku cîhana dîyardeyên rastîder de tiştan li nav xwe digire û dibe mekanê guherîn û

bizavê (Henîye, 2013: 16). Ji vê danasîna Platonî ya ji bo mekanî xuya dibe ku erd an em dikarin bibêjin mekan bûye ew rehend ku Platonî behreya xwe ya felsefî jê wergirtîye û mîna amûrekî li qelemê daye ku hemî tişt diçe di nav da (Hacî, 2012: 35). Platon ji alîyeke din ve pênaseya mekanî bi rengekî kûrtir dike û bi dîtina wî mekan ew amûr e ku tiştan li nav xwe digire (el-Reşîdî, 2012: 30). Anku mekan dibe rehendek û hemî keresteyên cîhana heqîqî li nav xwe digire. Beramber vê dîtina Platonî li ser mekanî filozofê navdar Aristoyî nêrîneka din li ser têgeha felsefî ya mekanî heye û bi dîtina wî du cureyên mekanî hene, ew jî *mekanê giştî* û *taybetî*. *Mekanê giştî* ji wî mekanî pêk tê ku hemî *tînan* li nav xwe digire. *Mekanê taybetî* jî ji wî mekanî pêk tê ku kesan bi tenê li nav xwe digire û mekanê giştî wan hemî mekanên taybet jî bi xwe ve digire (Xuzir, 2012: 116). Ji vê nêrîna Aristoyî xuya dibe ku mekanê giştî, cîhanê hemîyê û bi hemî keresteyan ve bi xwe ve digire. Her di berdewamiya boçûnê Aristoyî da li ser têgeha mekanî, xuya dike ku mekan heye û em her çiqas di nav da bizavê bikin, bi rêya veguhastinê ji mekanekî bo mekanekî din hest pê dikin ku mekan bi sedema jinaçûna *tenan* ji nav diçe (‘Ubeydî, 2011: 28). Ji vê nêrîna Aristoyî aşkera dibe ku mekan her yê heye û em nikarin vê rastîyê red bikin, ji ber ku em li ser mekanî bizav û çalakîyên xwe dikin. Dîsa, ji vê boçûnê xuya dibe ku Aristoyî têgeha mekanî ji nêrîna Platonî berfirehtir kirîye (Bin Haşim û yê din, 2017: 9).

Nêrînên filozofên misilman ên li ser têgeha mekanî ji alîyê felsefî ve nêzîkî nêrînên filozofên yewnanî ne û bi taybet boçûnê wan gelek nêzîkî nêrînên Aristoyî ne (Henîye, 2013: 18). Îbnî Sîna bi vî rengî pênaseya mekanî dike: Mekan ew rûyê hundirîn e ku tiştêk li nav xwe digire (Xuzir, 2012: 117). Ji vê danasînê xuya dibe, ku mekan weku rûyekê ye ku tiştêk yan kerestek di nav da tê ragirtin. Her wisa Farabî li ser mekanî xuya dike, ku mekan heye û aşkera ye, tu tiştêk nîne ku bêtir mekanekî taybet hebe (‘Ubeydî, 2011: 29). Her weku dîyar ev zana ye jî di nav vê pênaseyê da tekezê li hindê dike ku dema ku tiştêk li ser tê danîn hingî hest bi mekanî tê kirin û tê famkirin ku mekan ji bo her dîtinekê aşkera ye. Ji alîyekî dî ve zana Gurganî têgeha mekanî bi vî rengî pênase dike: “Mekan li cem kesên xwedî danayî, ji wî rûyê veşartî ku tiştêk li ser hatîye ragirtin pêk hatîye û mekan ji bo kesên behsa mekanî bi axaftinê dikin, ji wê valahîyê pêk hatîye ku tiştêkî di xwe de dihevin û rehendên xwe yê di nav da berceste dike (Xuzir, 2012: 117). Ji danasîna

Gurganî xuya dibe ku mekan di nav têgeha xwe da ji wê valahîyê pêk tê ya ku tiştekî di xwe de dihevwîne û ev tişt dikare hebûna xwe ya rehendî di nav wê valahîyê da berceste bike.

Ji nêrînên felsefîk ên filozofên yewnanî û misilman ên ji bo têgeha mekanî, xuya dibe ku mekan hebûna xwe li gel hebûna tiştekî aşkera dike. Anku, belê mekan her heye û her rûyekê em hest pê bikin dikeve nav têgeha berceste ya mekanî û mekan dibe amûrek ji bo ragirtina hemî tiştên li cîhanê.

1.2.3. Têgeha Mekanî ji Alîyê Hunerî ve

Têgeha mekanî ji alîyê edebî û felsefî ve cuda ye û têgeha mekanî ji alîyê hunerî ve bi awayekî kûr ji alîyê felsefî, zanistî, cografî ve cuda ye (Hacî, 2012: 40). Ji ber ku, eger em li pêkhateya romanê temaşe bikin, em dê bibînin ku romanê bi rêya peyvan mekanekî aşopî yê xwedan rehendên taybet ava dike. Lewra veguhastin ji mekanê jîyanî bo mekanê hunerî, guherînek e ji cîhana jîyana xwezayî (Qadir, 2006: 47). Anku, mekanê hunerî wekhev nîne li gel mekanê xwezayî, lê belê dibe ku nivîskar ji hizir û xeyala xwe vî mekanî diafirîne. Sebaret azirandina têgeha mekanî ji alîyê hunerî ve û her weku piranîya çavkanîyan amajeyê pê dikin. Nivîskar Gaston Bachelard ji wan nivîskarên pêşîyê bû, yê ku behsa têgeha mekanî ji alîyê hunerî ve kirî û di pirtûka bi navê *Ciwanîyên Mekanî* li ser vê yekê behsa ciwanîyên mekanî dike û amajeyê dide hindê ku xala sereke li cem nivîskarî dibe sedem ku mekanê hunerî di nav berhemê xwe da biafirîne ew e ku mala kevn a nivîskarî, ew mala zarokîniya xwe lê borandî dibe mekanê naskirî û navenda xeyala nivîskarî ji bo afirandina mekanekî hunerî (el-'Emorî, 2021: 56). Ji vê çendê xuya dibe ku ew rehenda sereke dibe palder li cem nivîskarî ji pêxemet afirandina mekanekî hunerî di nav aşopa xwe da, ew mekanê ku zarokatiya xwe lê derbas kirî. Her wisa, Başlar li ser vê çendê dibêje ku ji arasteya dîyarkirina bihayên sembolîk yê girêdayî dîmenên di nav vegêranê da lêkolîn li ser mekanî kirîye ku nivîskar dikare wan dîmenan weku dîmenên malekê yan mekanekî girtî bibîne (Le'tîqî û yd., 2013: 9). Her weku dîyar, alîyê ciwanîyên sembolên mekanên hunerî, dibe alavek karîger di dest nivîskarî da ji bo afirandina hindek dîmenên mekanê hunerî di nav romanê da.

Yek ji saxletên herî giring ên mekanê hunerî bi xwe ve digire ew e ku mekanê hunerî, xwedan xweşîyeka ciwankarî ye û ev xweşîya ciwankarî di nav mekanên rasteqîn da nîne, ji ber ku mekanên hunerî, çalakîyên mirovatî yên dahênerane bi xwe ve digire ku bi sanahî tê belavkirin ji kesekî ji bo kesekî dî (‘Ubeydî, 2011: 34). Ji vê yekê xuya dibe ku beşa ciwanîyê saxleteke sereke ye di nav mekanê hunerî da, ev saxlete di nav mekanên rasteqîn da nîne. Ji alîyekî din, eger em li vê çendê binêrin, dê bibînin ku her çend em ji mekanên rasteqîn dûr bikevin û ladan li ser bikin, vê carê em dê karin mekanekî din di nav metna edebî da biafirînin (Sehlî, 2020: 20). Anku em dikarin mekanekî hunerî yê ciwan di nav metnê da berceste bikin. Her wisa, nivîskar Gaston Bachlard li ser vê yekê dibêje: “*Mekanî peywendîyeka bineretî bi karê hunerî ve heye, anku wêneyê hunerî ku bîrhatinên zarokîniyê li cem me peyda dike, anku, mekanê hunerî yek ji rêgezên sereke yên romanê ye û bi rêka wî mekanî, bîrhatinên wan mekanan ji bo vedigerin yên ku li dema zarokîniyê me jîyana xwe di nav da borandî. Mekanê rasteqîn yê ku em di nav da dijîn saxlet û taybetmendîyên xwe hene.*” (‘Ubeydî, 2011: 34). Yanî, ew mekanê mirov di nav da ji dayîk dibe û heta ku mirinê di nav da dimîne cuda ye ji wî mekanê hunerî yê di nav berhemekê hunerî da tê afirandin. Her wiha tevî giringîya mekanê rasteqîn, mekanê hunerî dibe beşek balkêş bo wergirî û gelek giringîyê pê dide, ji ber ku li vir wergir xweşîyeka mezin ji bo xwe ji mekanê hunerî werdigire (Henîye, 2013: 21). Li vir, pêdivî ye amajeyê bidin wê yekê ku xeyal roleka mezin ji bo afirandina mekanê hunerî digêre û dike ku beşa babetîbûnê li ser saxleta mekanê rasteqîn rabe, çunkî ev mekan ji encama xeyala nivîskarî peyda bûye û wî li gor xeyala xwe afirandîye (el-Zehra, 2018: 7). Li vir têgeha mekanê hunerî wê yekê digehîne ku saxletên rasteqînîyê ji nav tîr derxistin û xeyala nivîskarî û hindek saxletên hunerî mekanê xwe digirin. Her wisa, nivîskar Perêz Sabîr tekezê li vê çendê dike ku “Mekan di nav metna afirandî da ne mekanekî heqîqî ye û ji keresteyên madî nehatiye afirandin, belku ev mekan mekanekî xeyalî ye û bi rêya peyvan hatiye çêkirin.” (Sabîr, 2006: 325). Ji alîyekî din ve nivîskar Huviding li ser mekanê derûnî û mekanê nimûneyî xuya dike ku mekanê derûnî, mekanekî rêjeyî ye ku em bi hestên xwe dizanin. Belê mekanê nimûneyî ew mekan e yê ku em bi eqlê xwe hest pê dikin û ev mekanekî reha û hevgirtî ye (Hemod, 2015: 23). Ji vê axiftinê dîyar dibe ku mebesta nivîskarî ji mekanê nimûneyî ew mekanê rasteqîn e ku em di nav da dijîn û mebesta wî ji

mekanê derûnî mekanê hunerî ye ku di nav berhemên hunerî da berceste dibe (Sehlî, 2020: 19). Dîsa, nivîskarê navdar Yori Lotman di pirtûka xwe da ya bi navê *Muşkîlet el-Mekan el-Fenî (Arîşeya Mekanê Hunerî)* diyar dike ku mekanê hunerî xwedan çendîn rehendên diyar û aşkera ye û çend saxletan bi xwe ve digire, yek ji wan saxletan ew e ku mekanê hunerî xwedan dûmahî ye, lê belê ev mekan zarvekirina babetekê bêyî dûmahîk dike (Lotman, 1988: 68). Anku, dibe mekanê hunerî; sînorên wî yan jî çarçoveya wî destnîşankirî ye û dawîyek heye. Belê, ew babet yan naveroka ku ev mekan bi wê wî hatîye afirandin, babetekê berfireh e û çî sînor bo nehatîne destnîşankirin ku bi dîtina me, ev babete her girêdayî naverokên hizr û rewşenbîrî û jîyana civaka mirovî ye.

Em ligel van agahîyan digihêjin wê encamê ku mekanê hunerî, ew cureyê mekanî ye ku bi rêka xeyala nivîskarî tê afirandin. Her wiha di nav metna edebî ya afirandî da ev mekanê zarokîniya nivîskarî dibe bingeş ji bo afirandina vî mekanî û bi rêya awayên ciwankariyê nivîskar dixwaze bala xwîneran bikêşe û di vê mijarê da derbirîneka rasterast digihîne xwîneran.

1.2. Bandora Mirovî li ser Mekanî û ya Mekanî li ser Mirovî

1.2.1. Bandora Mekanî li ser Mirovî

Mekan ew pêkhate ye yan jî ew rû ye ku hemî candar li ser jîyana xwe berdewam dikin. Her wisa mirov endamek e di malbateka mezin da ku ew jî ew derdor û jîngeh e ya ku mirov têda radibe û mezin dibe, jê vedixwe û fêrî zimanî û tîltalan dibe, dinyayê tê da dibîne û xweşî û nexweşîyan jê werdigire (Qadir, 2006: 57). Anku, mirov her ji roja jidayîkbûnê û heta mirinê dibe candarek û li ser mekanî hemî bizav û çalakîyên xwe bi rê ve dibe û dîsa mirov li ser mekanî hemî zanyarî, werar û rewşenbîrîya xwe werdigire. Ji alîyekî din ger temaşeyî mijarê bikin, hûn dê bibînin ku mirov weku candarekê civakî û her ji berê ve ketîye di nav rehend û biyavên cografîk û topografîyên mekanî da. Ji ber ku her ji demên berê ve mirovên ewil, dema ku li cîhanê belav bûyîn, dest bi serederî û karîgerîyê kirîye, loma hest bi mekanê hewandinê kirîye, anku mekanên xweş ji mekanên nexweş cuda kirine (Hacî, 2012: 55). Em dikarin bibêjin ku ew mekanê mirov li ser mezin dibe û jîyana xwe di nav da diborîne, dibe sedemê wê yekê ku mirov bikeve jêr bandora wê erdnîgarî û

topografyaya erdê ku li ser jîyana xwe derbaz dike. Her wisa, seqa û bilindahîya topografyaya mekanan bandorê li ser mirovî dike. Ji cureyên cilûbergên mirov li xwe dike bigirin heta hemî cureyên arîşeyan (Hacî, 2012: 55). Ji alîyeke din ve, ger temaşeyî vê mijarê bikin, dê bibînin ku ew mekanê mirov li ser dijî bi wî rengî karîgerîya xwe li ser mirovî dike û bêyî ku mirov hest pê bike. Bo nimûne xwezaya çîyayî ya mekanê kurdan wisa kirîye ku kurd jîyaneka sext û dijwar li vî mekanî biborînin, belê ji alîyekî din mirovê kurd ji bo sûd ji vî mekanî wergirtîye û karîye di nav vî mekanê çîyayî da xwe ji dijminan biparêze. Dema ku peywendî di navbera mekanî û kesî da li ser binemayê lêkguherînê be, anku yek karî li ser yê din dike, wê demê bandora wê karîgerîyê çî rûserî be çî jî kûr û pir be, wisa dijarîya mekanî ya li ser kesî diyar dibe. Ev bandor li ser çend astên cuda ye, weku civakî, biyolojîk û derûnî (Qadir, 2006: 58). Ji vê çendê xuya dibe ku mekan karîgerîyê li ser mirovî dike û germî û sarîya mekanî û bilindî û nizmîya mekanî û çîyayî û deştîya mekanî, wan saxletan dide mirovî ku di nav her cure mekanî da hene û ev karîgerîye ji gelek alîyan ve çî hizrî û derûnî çî jî îdeolojîk an jî civakî li ser mirovî tê kirin.

1.2.2. Bandora Mirovî li ser Mekanî

Mirov yekem canewer e li ser mekanî ku xwedî şîyanên hizirkirin û aqilî ye. Anku, mirov dikare bi rêya şîyana xwe ya aqilî xwe ji piranîya astengan xilas bike û karîgerîyeka mezin li ser mekanî bike: bêguman ne ku tenê mekan karîgerîyê li ser mirovî dike, dike ku mirov jî karîgerîyê li ser mekanî dike. Bi vî awayî ew mekanê dirinde û tirsnaq bi karîgerî û xebata kesî tê guherîn û dikeve nav çarçoveyeke şaristanî. Wisa nav li ser mekanan hatîye danîn û bi rengekî baştir bûye çavkanîya jîyanê. Bi berdewamî mirovî xebat kirîye da di derdora xwe bigehe (Qadir, 2006: 59). Ew mekanê mirov li ser dijî heman cure ne. Anku, hindek mekan xweş in û seqayekê guncav ji bo jîyanê hene. Belê hindek jî gelek nexweş in û jîyana li van mekanan gelek bi zehmet e. Belê mirov kar û xebatê li dijî vî mekanî dike û bandoreka mezin lê dike, heta ku vî mekanî li dû hez û berjewendîyên xwe biguherîne. Her wisa, hewce ye amajeyê bi vê çendê bidin mekan gelekê nêzîkî mirovî ye, belkî jî her tim ligel mirovî ve ye. Belku mekan dibe ew cîhana derveyî ya ku hestên mirovî li ser tiştan berceste dike (Hacî, 2012: 88). Li pey vê çendê, em dikarin bibêjin ku mirov û mekan her yek temamkerê yê dî ye. Dîsa em dikarin bi

rêya mekanî cîhana derveyî bibînin û bi vî awayî mirov di qonaxên cuda yên jîyanê de pêş ketîye û vê pêşketinê jî bandor li ser awayên guherîna mekanan kirîye (Sabîr, 2006: 323). Axir, bi berdewamî û di hemî qonaxên jîyanê da, mirovî karîgerî li ser mekanî kirîye û jîyana xwe ber bi pêş ve birîye. Li dawîya vê beşê, em dikarin amajeyê bi vê yekê bidin ku di nav wê karîgerîya mirovî ya ku li ser mekanî kirî bû sedem ku di dirêjahîya dîrokê da mekan bibe cihê ewlehî û xweparastinê ji metirsîyan (Hacî, 2012: 61). Ji vê yekê aşkera dibe ku mirovî bi berdewamîya jîyana xwe hewl daye û dide ta ku jîyana xwe xweş bike guherînan li ser mekanî bike û mekanî bi heman awayî bixe jêr bandora xwe.

1.3. Rehendên Mekanî

Mekan di nav pêkhate û têgeha xwe da ji çendîn rêgez û pêkhateyan pêk tê. Her wisa, hatîye zanîn ku piranîya ew xwendin û lêkolînên li ser edebîyatê hatine kirin, amajeyê didin wê yekê ku mekanî di nav berhemên edebî da hinek rehendên sereke hene û Hevrehendek ji van perkekê taybet heye ji bo drustkirina binyatê delaleta deqê romanê û rêya rehendên xwe romanê berceste bike û rehenda xwe ya îdeolojîk pêk bîne û ev jî li gor asta şîyanên nivîskarî çêdibe, anku li gor bicihkirina mekanî ya di nav romanê da (el-Cibûrî, 2016: 12). Dîsa, ev pêkhateya sereke ya romanê xudan komeka raman û delaletan e û vî rêgezî hebûna xwe di nav zorbeya babetên epîstemolojîk da kirîye mîna bizavên edebî û zanistî (Şelaş, 2011: 244). Ger ev taybetmendîya mekanî bi rêya çend pêkhate û rehendan hebûna xwe di nav romanê da berceste bike, yek ji van pêkhateyan *rehenda mekanî* ye. Ji vê çendê dîyar dibe ku rehendên mekanî xwedî roleke erênî ne di nav pêkhateya romanê da û li ser piranîya rêgez û pêkhateyên din ên romanê karîgerîyê dikin. Loma ji vî alî ve, me hewce dît ku em behsa rehendên mekanî di nav vê xebatê da bikin. Sebareti bi cureyên rehendan di nav mekanî da, piranîya çavkanîyan tekezê li ser hindê dikin ku ev her çar rehendên li xwarê giştî û sereke ne di nav pêkhateya mekanê romanê da ku em ê yek bi yek li ser van rawestin.

1.3.1. Rehenda Cografîk

Ev rehend weku yek ji rehendên herî giring û sereke tê hijmartin di nav romanê da û nivîskar ji bo afirandina mekanî, bi taybet eger saloxdana romanê ya

girêdayî xwezaya mekanî û şêwe û ruhê mekanî be piştbestinê li ser mekanî dike (el-Zehra, 2018: 31). Ji alîyekî din ve, ger temaşeyî vê rehendê bikin, hûn dê bibînin ku cografîya weku babet û zarav, her derbirîne ji mekanî dike û peywendîyeka mukum li gel rehenda dîrokê heye (Şelaş, 2011, 245). Yanî dîrok di nav cografîyê da hebûna xwe berceste dike. Anku, zaravê cografîyayê taybet e bi cureyên meknanan ve û peywendîyeka rasterast digel dîroka mekanî heye. Dema ku nivîskar saloxdana rûyên meknanan dike weku xwezaya deştê û xwezaya çîyayan (Îsmâîl, 2010: 19). Ji vê yekê aşkera dibe ku rehenda cografî ya mekanî, behsa xwezaya xweristî ya mekanî dike, kanê ev mekane çîyayî yan deştî ye yan jî gelî û dol û nihâl e. Ev saloxdana nivîskar ya ji bo rehenda cografîk ya mekanî dike, girêdayî saloxdana wan meknanan e, yê ku nivîskarî di nav romana xwe da afirandine. Nivîskar navê hindek dever û meknanan tîne ku di rastî da ew mekan heman nava hildigire û hindek caran jî nivîskar navê meknanan dîyar nake û vê yekê ji bo xwendevanî dihêle, heta bi rêka xeyala xwe navê wan meknanan bizane (el-Zehra, 2018: 31). Bi awayekê giştî, mebest ji rehenda cografîk ya mekanî ew e ku nivîskar saloxdana awa û xwezaya erdê bike weku deşt, çîya, rûbar, derya û hwd (el-Cibûrî, 2016: 15). Ji vê yekê ji bo me xuya dibe ku têgeha mekanî, di pûxteya hemî rewşên xwe da amajê bi wî dîmenî yan jî wî binyata siruştî dike ku kesayetîya romanê di nav da dijî û kar û çalakîyên xwe encam dide.

1.3.2. Rehenda Derûnî

Alîyê derûnî yê nivîskarî bandoreka mezin dike li ser asta dahênana di nav berhemên edebî da û dîsa karîgerî li ser asta dahênana mekanî ya di nav romanê da heye. Nivîskar li dû asta hestên xwe yê bi meknekî ve karîger bûne, dê wateya di nav romanê da bide mekanî, anku bi awayekî giştî, nerênî yan erênî bandorekê dike (el-Reşîdî, 2012: 72). Ji alîyekî din ve, mekanî peywendîyeka mezin bi mirovî ve heye bi taybetî ev peywendîye karîgerîyê li ser derûnîya mirovî jî dike û mirov qesta wî mekanî dike yê lê xwe aram hîs dike. Belê di nav metna edebî da, nivîskar pitir wî mekanî di nav da berceste dike yê ku hez jê dike. Loma di rastîyê da berbelavtîrîn rehendên meknanên di nav berhemên hunerî da pêk tê ji rehenda derûnî ne (Salih, 1997: 55). Anku, ew meknanên derûnîya nivîskarî pê karîger dibe, ew mekan e ku di nav metnên edebî yê wî da reng vedide. Ji alîyekî din alîyê derûnî gelek peywendî digel romanê heye û bi taybet piştî ku romanê pêşketinên mezin bi xwe ve girtin, ev

çend bûye sedem ku gelek nivîskar ji bo encamdana lêkolînên li ser romanê giringîyê bidin zanista derûnî (el-Cibûrî, 2016: 16). Her wisa, dibe ku mekan di nav xeyala me da yê xwemekan be û di nav kûratîya derûnê me da hatibe bercestekirin bêyî ku em hest pê bikin. Belê em dikarin bi rêya hest û sozên xwe wî mekanî dîyar bikin û li vir ev mekan dê hest û hêzeka derûnî bide mirovî (el-Reşîdî, 2012: 72). Li dû vê nîşandana borî ji bo beşê rehenda derûnî ya mekanî, bo me xuya dibe ku yek ji rehendên herî giring û sereke ye wekî pêkhatiya mekanî ya di nav romanê da. Ji ber ku nivîskar ji encama karîgerîya derûnîya xwe bi mekanên rasteqîn ku li cem wî pir xweş in, vê yekê dike riwangeyek û cureyên mekanan bi rêya vê karîgerîya derûnî di nav romana xwe da diafirîne.

1.3.3. Rehenda Dîrokî

Helbet dîrokê rola xwe li ser mekanî heye û ne bi tenê ev e, belku dem û mekan du rehendên bi hev ra girêdayî ne û mekan ji demî nayê veqetîn û navê demmekanî li ser tê danan û ev demmekan dibe cêmîkek û rolekê sereke di nav gêrana rûdanên romanê da digêrin û dîsa dem û mekan, wate û delaletê bi girêya romanê didin (el-Cibûrî, 2016: 17). Ji alîyekî din ve, demê behsa rehenda dîrokî tê kirin, vê carê pêdivî ye amajeyê bidin van her du beşan: Yek; dîrok, mekanî ji alîyê ruxsarî ve diguherîne. Du; dîrok, desthilatdarîya li ser mekanî heyî diguherîne (el-Nedşed, 2012: 103).

Rehenda dîrokî, di çarçoveya mekanê romanê da nebe di nav romanê da nayê dîyarkirin yan hestpêkirin. Anku em nikarin bêyî mekanê romanê hest bi demê romanê bikin, ji ber ku her du beş, dem û mekan, bi hev ra girêdayî ne û ji encama hevqirtina her duyan guherîn li ser mekanî çêdibe (Xadet, 2002: 92). Dîsa, mekan weku nasnameyekê ye bo demî, ji ber ku dem nayê dîtin lê belê mekan keresteyeke madî ye. Loma dem li ser mekanî dîyar dibe û mekan dikare demî li nav xwe biguhere û biparêze û ji bo mirovî dîyar bike, ji ber ku mekan li vîrê dibe rehenda rengvedanê bo demî (el-Cibûrî, 2016: 17). Li dû vê yekê, em dikarin bibêjin, rehenda dîrokî bandora xwe li ser mekanî dike û kesayetîyên romanê jî rola xwe li ser mekanî digêrin û bi rêya kar û kiryarên kesayetîyên romanê, em dikarin vê bandorê li ser rûdan û kesayetîyan bi başî bibînin. Ji ber ku rehenda dîrokî dikare bi rêya yekgirtinê, li gel mekanî, hizr û nêrînên nivîskarî aşkera bike, anku dîtina nivîskarî

bibîne. Dîtina ku nivîskar bikare bi rêya wê berdewamîyê bide karê nivîsîna romanê û dahênanê di nav da bike (el-Zehra, 2018: 32). Ji encama nîşandana van nêrînan xuya dibe ku rehenda dîrokî, roleka mezin di nav romanê da heye û di encama karîgerîya demî li ser kar û rûdanên romanê da, karîgerîya demî li ser mekanê bercestekirî di nav romanê da dîyar dibe.

1.3.4. Rehenda Babetî

Rehenda babetî di nav romanê da li gor pêdivîyatîya wê babetê radiweste ku divê nivîskar bigehîne xwendevanî, dîsa rehenda babetî ya mekanê romanê di nav wan amajeyan da xuya dibe yên ku ji xeyala nivîskarî ji bo rastîya xwezayê tên kirin (Le'tîqî û yê din, 2013: 18). Nexasim, dema nivîskar hewl dide, wê xeyala di nav hizra xwe da bike rastî, li vêrê dê hewl bide li ber ronahîya mekanên xwezayî di nav rastîya heyî da mekanekî babetî di nav romanê da biafirîne. Li pey vê yekê em dikarin bibêjin ku babetîbûna mekanî di nav romanê da li ser afirandina mekanekî rasteqîn radiweste. Ew mekanê rastîder xudan rehenda cografîk e ku nivîskar bêyî ku çi guherînan li ser bike di nav da dijî (Le'tîqî û yd., 2013: 19). Dîsa, hatiye dîyarkirin ku di vê mijarê da ku nivîskarê berhemdar û xwedan şîyan ew e yê ku pêgîr be bi veguhastina mekanê rasteqîn bi awayekê babetî û dûr ji rehendên din weku rehendên felsefî. Belê, li vir gerek e nivîskar giringîyê bide alîyê ciwankariyê yê vî mekanê rasteqîn û bi awayekê ciwan di nav romana xwe da berceste bike ji bo balkişandina xwendevanî (el-Zehra, 2018: 35). Ji vê yekê dîyar dibe ku rehenda babetî di nav mekanê romanê da hebûna xwe ji mekanê xwezayî werdigire. Belê, di dema bercestekirina vî mekanî de pêdivî ye nivîskar dahênanê di vê bercestekirinê da bike û bi awayekê ciwan û balkêş bixe di nav romanê da. Ji alîyekî din ve boçûneka din li ser rehenda babetî ji bo mekanê romanê heye û nivîskar Alan Rob Girê cudahîyê dixê di navbera mekanê rasteqîn û mekanê romanê da û bi dîtina wî yek ji saxletên romana nû ew e ku mekanê rasteqîn û babetî ji nav dibe û nahêle (el-Cibûrî, 2016: 19). Armanca jinavgirtina mekanê romanê bi rehenda babetî ew e ku nivîskar bikare bi rêya vî rehendî, mekanên rasteqîn bi awayekê babetî di nav romana xwe da berceste bike bêyî ku çi kêmkirinekê yan zêdekirinekê li ser vî mekanî bike (el-Zehra, 2018: 34). Li ber van agahîyan li me xuya dibe ku rehenda babetî bo mekanî, karîgerîya xwe li ser romanê heye û nivîskar hizra afrandina mekanekî hunerî bo

romanê ji mekanê rasteqîn werdigire, belê gerek e bi renekî babetî û ciwankarî wê dahênanê bike û ji alîyekî din ve hindek nivîskar di wê bawerîyê da ne ku mekan di romana nû da pitir ne babetî ye û ev roman mekanê rasteqîn gelek bi xwe ve nagirit.

Sebaret van her çar rehendên borî yên me nîşan dayîn bo me xuya dibe ku pêdivî ye nivîskar van rehendan hemîyan bi renekî têkildar di nav afirandina mekanê romana xwe da berceste bike ku ji bo ku digel pêkhateya vegêrana wê metnê bigunce, ciwanîyeka hunerî ya mezintir bide romanê (el-Zehra, 2018: 35).

1.4. Giringîya Mekanî di nav Pêkhateya Romanê da

Her cureya edebî xwedan çendîn saxlet û rêgez in û roman jî komeka saxlet û rêgezan bi xwe ve digire û mekan yek ji rêgezên herî giring û sereke ye di nav romanê da. Ne tenê ev e belku roman nikare bêyî mekan hebûna xwe ragehîne û li ser vê çendê hatîye dîyarkirin ku mekan di nav romanê da li bilindtirîn pileyê tê danîn. Ji ber ku giringîyeka mezin heye û dibe yek ji giringtirîn stûnên sereke yên romanê, çunkî kesayetî rola xwe li ser mekanî digêrin û rûdanên romanê jî her dîsa li ser mekanî tên rûdan (Sehlî, 2020: 20). Her wisa, mekan di nav vê giringîdana xwe da bo rûdanan dibe egerê hevqirtina hemî rêgez û pêkhateya romanê û li dû vê yekê mekan dibe rehenda rêxistina rûdanan di nav romanê da û ev çende dibêt êk ji erkên sereke yên mekanî dinav pêkahata honerîya romanêda (el-Behrawî, 2016: 29) ji vê çendê dîyar dibe ku avakirina mekanê romanê girêdayî hêla zincîreyî ya rûdanên vegêrana romanê ye û ev guncana di navbera mekanî û rûdanên romanê da dibe sedema hevqirtina tevaya rêgezên pêkhateya romanê. Ger ji alîyekî din ve li giringîya mekanê romanê binêrin, dê bibînin ku mekan di nav romanê da ne bi tenê weku rehendekê endazyarî tê dîtin, belku pêkhateyeke ji pergaleke peywendîyan pêk tê (Şahîn, 2017: 69). Ev peywendîyên mekanî li gel rêgezên hunerî yên romanê, wî saxletî pê dide ku mekan bibe xala bingehîn ya ku tevahîya romanê li ser tê avakirin, weku rêgezên rûdan, kesayetî û demî (el-Ofî, 1987: 149). Ji vê yekê dîyar dibe ku mekan bi binemayê sereke yê avakirina romanê tê nivîsîn û gotara romanê ji çendîn binemayan pêk tê da ku derbirînê ji delaleta babeta romanê bike, loma mekan yek ji van binemayan e yên ku proseya vegêranê pêdivî pê heye (Benînî, 2008:191). Ji vê yekê xuya dibe ku mekan di nav romanê da, valahîyeke bo vegêranê û dibe rêgezeke

giring di nav pêkhateya wê da û derbirîne ji nihênîyên babeta romanê dike (Bexadid, 2017: 92).

Nivîskar Maykil Batler (Michael Butler) li dor giringîya mekanî di nav romanê da xuya dike ku xwendina romanê weku geşteke ye bo cîhaneka cuda ji wê cîhana em di nav da dijîn û her ji xwendina rûpelê yekem ya romanê xwendevan diçe cîhaneka xeyalî ku nivîskarî ji peyvan afirandîye û ev cîhana entîke hindek mekanên berovajî mekanên rasteqîn xwendevanî bi xwe ve digire (Qassim, 1978: 103). Ji vê yekê dîyar dibe ku giringîya mekanî di nav romanê da gelek mezin e, ji ber ku ev mekane dibe sedemê çekirina wê valahîya berfireh ya hemî romanê (Lihemdanî, 1991: 67). Anku, ev mekanê di rastîyê da heye dibe paşxane ji bo çekirina mekanê hunerî yan xeyalî di nav romanê da. Ji aliyekî din nivîskar Şaril Girîver li dor giringîya mekanî di nav romanê da xuya dike ku mekan berî nivîskarî dest bi nivîsîna çîrokê dike (Semar û Şakir, 2014: 29). Nexasim, mekan di nav romanê da weku wî rehendî ye ku dibe riwangehek ji bo afirandina hemî romanê. Ger cureyên mekanî di nav romanê da çi teng yan biçûk bin yan jî mezin û berfireh bin, dibin komeka kilîlan bo vekirina kodên girtî yê wateya romanê (Raxib û Hamidî, 2017: 19). Anku em dikarin bi rêya mekanên romanê, wê wateya veşartî ya di nav romanê da heye aşkera bikin. Sebaret armanca bercestekirina mekanî di nav berhemên edebî da, hatîye xuyakirin ku armanc jê ew e dubare mekanê rasteqîn bê afirandin, anku afirandineka nû bo mekanî bê kirin (el-Reşîdî, 2012: 42). Ev yeke jî tekezê li hindê dike ku ew mekan yek ji rêgez û binema û stûnên herî sereke ye di nav romanê da, belku tev rêgezên dî yê romanê bi rêya mekanê romanê kirarîya xwe werdigirin û bi rola xwe radibin. Bi taybetî kesayetî û rûdan û dem, dîsa em dikarin bi rêka mekanê romanê wê wateya veşartî ya di nav romanê da hatîye bercestekirin aşkera bikin.



2. PEYWENDÎYÊN MEKANÎ DI NAV ROMANÊ DA

2.1. Mekan û Kesayetî

Kesayetî yek ji rêgezên giring û sereke ye di nav pêkhateya hunerî ya romanê da û dibe rêgezeke navendî di nav hemî berhemên vegêranê da ta wî radeyî em nikarîn hizir bikin ku çi metnên romanê bêyî kesayetî hebin (Ze'reb, 2006: 117). Ji vê çendê xuya dibe ku nabe çi metnên romanê bêyî rêgeza kesayetî bîn afrandin, belku hebûna romanê ya girêdayî rola kesan e di nav pêkhateya wê ya hunerî da û kesayetî di nav pêkhateya romanê da zêdetir ji peywendîyekê bi xwe ve digire. Derbarê peywendîya kesayetîyan a bi mekanê romanê ve pêk hatîye ji wê valahîyê yan alavî ya ku karayîya xwe di nav mekanê romanê da werdigire (el-Cibûrî, 2016: 23). Li vê derê kesayetî dibe binemayeke bizvîner ji bo pêşvebirina rûdanên romanê li ser pêkhateya mekanî di romanê da. Nivîskarê rûsî Bûris Tûmaşiviskî (Boris Tomashevsky) li ser rola kesayetîyê di nav romanê da xuya dike ku: *“Kesayetî dibin stûnên zindî ji bo hemî rêgezên di yên romanê û kesayetî dibe eger ku xwendevan bi romanê ve bê girêdan û azirandinê ji bo çêbike”* (Mustefa, 2009: 8). Li vir rola kesayetîyê ji bo balkêşana xwendevanî di nav romanê da aşkera dibe û li gorî vê çendê em dikarin bibêjin ku ew tiştê di nav xwendina romanê da dimîne di nav hizira xwendevanî da, kesayetî neku rûdan e û ne pêkhateyên di yên (el-De'mî, 2017: 1). Anku gelek roman hene bi rêka kesayetîyan tên naskirin li dev xwendevanî. Ger temaşeyî zaravê kesayetî bikin dê bibînin ku zaravê inglîzî *Personality* ji zaravê Girîkî *Persona* hatîye wergirtin û ev zaravê girîkî wateya *rûpoşê maske* digehîne û mebest jê ew rûpoş e ku kesayetîyên zarveker di nav şanogerîyê da li ber xwe dikin (Feradî, 2016: 10). Anku kesayetî weku zarav ji zaravê girîkî yê navborî hatîye wergirtin.

Kesayetî dibe binemayekê sereke di nav romanê da û dibe sedemê xuya bûna wan hêzan yên ku ketwarê me di nav romanê da dilivînin û dibine bizaveka dînamîkî û derbirînê ji jîyana mirovan dike (el-Tuncî, 1993: 456). Li pey vê çendê kesayetî dibe xaleka bizvêner di nav romanê da û derbirînê ji puxteya jîyana mirovan dike. Dîsa kesayetî dibe alaveke mezin û karîger di destê nivîskarî da ku ji pêxemet hindê ku bikare bi rêka vê kesayetîyê derbirînê ji hizir û boçûnên xwe bike û li gor şîyanên xwe yên hunerî kesayetîyê di nav metnê da berceste dike (Ehmed, 2007: 37). Ev

kesayetîya nivîskarî di nav romanê da diafrîne dibe kesayetîyeka aşopî ya ketwarî û hemî rûdanên romanê li dor wan dizivirin (Wehbe û el-Muhendîs, 1984: 208). Ne şert e kesayetî di nav romanê da hemî ketwarî bin, belku dibe nivîskar kesayetîyên aşopî jî di nav berhemên xwe da biafrîne û bi rêya van kesayetîyan derbirîne ji hizir û boçûnên xwe bike. Ji alîyekî din pêdivî ye nivîskar kesayetîyên romana xwe rasterast pêşkeş neke, anku ne bi yekcarî kesayetîyan di nav romanê da xuya bike, belku pêdivî ye li gor peydabûna rûdanên romanê kesayetî bîn pêşkeşkirin (Ehmed, 2007: 31). Li vir ew kesayetîye bi encamdana rolekê di nav romanê da radibin, ji ber ku dibe kesayeteka talî û bi alîkarîya kesayetîyên din bi encamdana erkekê yan komeka erkan radibin (Lihemdani, 1991: 52). Car caran nivîskar wisa serederîyê li gel kesayetîyên romanê dike, her weku van kesayetîyan hebûneka fîzîkî heye (Hesen, 2014: 8). Anku serederîya nivîskarî li gel kesayetîyên romanê xaleke taybet bi xwe ve digire. Eger ku serederîyeka rasteqîne li gel van kesayetîyan bike û kesayetîyên romanê dibin rêgezên giring ji bo karakirina rûdanên û ev kesayetîye ber bi xaleka destnîşankirî ve diçin û dibe kesayetî ji gelek rûyan ve di nav da bîn pêşkeşkirin û her rûyekê di nav da bê pêşkeşkirin karîgerîya xwe li ser binyatê vegêrana romanê heye. Dîsa vê çendê rol heye ji bo afirandina astên vegêranê di nav romanê da, ev karîgerîya kesayetîyan di nav da li gor cureyê kesayetîyan radiweste. Ji bo mînak kesayetîya sereke bi rola rûdana sereke ya romanê radibe (Bexadid, 2017: 43). Ji alîyekî din, kesayetî di nav romanê da rehendekê din bi xwe ve digire û mina zîndewerekê xwedan bizav lê tê nêrîn û bi erkê bercestekirîne di nav romanê da radibe. Anku na-afrîne belku metnî romanê bercestedike (Murtaz, 1995: 126). Bi gotîneke din, kesayetîya romanê weku metn na-afrînî, belku dibe rêgezek ji bo bercestekirina ji ber ku kesayetî weku yek ji giringtirîn rêgezên pêkhênerên vegêranê dibe rehendekê bizvîner ji bo werara rûdanên û li gor çarçoveya dem û mekanî berceste ya xwe werdigire û dibe birbireya romanê (Yemîne, 2021: 126). Ji vê yekê xuya dibe ku karê sereke yê kesayetîyan di romanê da di erkê wan da diyar dibe yê ku di nav romanê da pê radibin. Nivîskar Vilademîr Prop (Vladimir Propp) li ser vê çendê dibêje, “*Erk rêgezeke giring û sereke ye di nav romanê da û ji pêxemet şirovekirina, navborî tekezê li ser wî erkê fikir yê ku kesayetî pê radibû.*” (Bin Tîşet û Basî, 2019: 15). Kesayetî ji derveyî sînorê romanê çî hebûn yan bandor nîne kesayetî di nav romanê da rêgezeke destçêker e û hatîye dahênan weku hemî rêgezên di yê

romanê, anku nekesayetîyek ketwarî ye û ji derveyî cîhana romanê çî hebûn nîne (Zeytonî, 2002: 114). Dîyar e ku kesayetî di nav metna edebî da bi giştî û di romanê da bi taybetî, kesayetîyeke dahênerane ye. Nivîskar ji encamê hest û hizrên xwe dadihîne û di ketwarî da çî hebûn nîne. Her wisa kesayetîya afirandî di nav romanê da bi dîtina hindê nivîskaran ji kesayetîyeka mirovî ya zindî û xwedan saxletên mirovane pêk hatîye û kartêkirinê li gel dem û mekanî di nav romanê da dike (Zexad û 'Elam, 2020). Anku tevger û serederîyên kesayetîyên asayî yên derveyî civakî pêşkêş dike. Ger ji rehenda civakî temaşeyî kesayetîyê bikin dê bibînin ku kesayetî ji çejnekê civakî pêk hatîye, derbirînê ji texeka civakî dike (Bû'ze, 2010: 39). Li dûv vê çendê, kesayetî dibe xodîkek ji bo rengvedana puxteyê jîyana texeka civakî ya dîyarkirî. Li gel vê çendê hemîyê jî her weku Todrov dibêje, *“Kesayetî berî her tiştî pêkhateyeka zimanî ye, ji derveyî peyvan çî hebûn nîne û bi tenê di nav rûpelan da hatîye afirandin”* (Fetah, 2012: 47). Wek dawîya vê beşê em dikarin bibêjin kesayetî rêgezeke sereke û herî giring ya pêkhateya hunerî û hizrî ya romanê ye û peywendîyeka rasterast bi hemî rêgezên romanê ve heye û peywendîyeka mikum li gel mekanî heye, ji ber ku pêdivî ye kesayetîyê rehendek yan valahîyek hebe da ku li ser rola xwe bigêre. Anku ger mekan di nav romanê da hebe, belê kesayetî nebe, vê carê çî hebûn ji bo romanê nabe, her wisa vî mekanî jî çî rol û arasteya pêdaçûnên rûdan û hemî rêgezên di yên romanê da nabe. Bi kurtî em dikarin bibêjin ku peywendî di navbera mekanî weku rêgezeke hunerî yê romanê di kesayetîyê da peywendîyeka cemserî ye. Anku ger kesayetî nebe mekanî jî çî hebûn di nav romanê da nabe.

2.1.1. Peywendîya Mekanî bi Kesayetîyên Romana *Sotingehê* re

Yekem peywendîya berçav di navbera kesayetîya sereke ya vê romanê, anku lehengê vê romanê û mekanî da xuya dibe, ew e dema ku vegêrê romanê dîmenekê ji wê zindanê werdigire ya ku kesayetîya sereke ya vê romanê bi navê Sîyabend di nav da hatî zindankirin. Li vêrê hêjayî gotinê ye ku rûdanên sereke yên romana *Sotingehê* behsê vegêrana serhatîya ciwanekî kurd dike ku bi destên hikumeta Beasê hatîye girtin û bi bêgunehî û zorî hatîye desteserkirin û çendîn cureyên nexweşî û îşkenceyên laşî û derûnî didine ber wî. Sîyabend di nav vê peywendîyê da li gel wî mekanê bi zorî lê hatî zindankirin, li ser zarê vegêrê romanê saloxa wî mekanî dike

anku ew jûra zindanê û kanê rewşa vî mekanî bi çi ava bûye. Di dîmenê vê peywendîya Sîyabendî bi vî mekanî ve Zindanê wisa xuya dibe ku Sîyabend yê di jûra zindana xwe da rûniştî ye û bi xemgînî û bi du çavên şeyda li vê jûrê dinêre. Ev jûre gelek bêserûber e, bêhteng û şehgirtî ye, bêhnên gelek nexweş ji vî mekanî tên û Sîyabend di nav da çû qurnetekê ji vê jûrê û ji ber sermayê leşê xwe gehand hev û bayê sar di nav da li leşê wî dide. Ne bi tenê eve, belku pîsatî jî her di nav vê jûrê da heye, anku pîsatîya mirovan di nav vê jûrê da ya ku Sîyabend di nav da zindan kirî. Ji vê peywendîya kesayetîya sereke ya vê romanê anku Sîyabendî bi mekanî ve ku jûra Zindanê ye xuya dibe ku peywendîyeka neçarî ye, kewate Sîyabend bi zorî û neçarî peywendîyê li gel vî mekanê nexweş û girtî da dike:

“Pelên çavên wî di geş in û çirîskên wan dipejine kujîyên wê jûra şehgirtî û bûhna genî bi ser hîlbûy. Li qurnetekê yê çûye têkra û bayekê sar yê gumlikê wî ji rûsatîya leşê wî cuda dike. Bêhnên genî difna wî dixwerînin. Bi lepequtî li kita pêlava xwe digere. Ser tiblên wî bi pîsatîyê dikevn” (Mihemed, 2005: 20).

Mekan weku rehendekê sereke di nav jîyana mirovî da, bandorê ji gelek alîyan ve li ser mirovî dike û di encama peywendîyên kesî yan mirovî de di gel mekanî ji gelek alîyan ve berceste dibin û yek ji van alîyan, peywendîya sazdarî ye ligel hinek mekanan.

Di vê romanê da ev cure peywendîye di navbera kesayetîya sereke ya romanê Sîyabend li gel mekanê vê romanê xuya dibe. Sîyabend dema bi zorî hatî desteserkirin û zindankirin ji layê hikûmeta Beasê ve û bo demekê dirêj dimîne di nav zindanê da, li vîrê bîrhatinên wî ji bo wî mekanî dizivirin yê ku peywendîyeka dilînî yan sozdarî li gel heye. Sîyabend di nav jûra zindanê da hizra wî bo xweşdivîya xwe Nêrgizê dizivire û bi rêya vegêraneka monologî ku li gel xwe dipeyive, wisa xuya dike ku ew ji hevdiîtinên xwe li gel evîndara xwe Nêrgizê xerîb bûye, her du evîndar li wan mekanan sozdarîya xwe bo hev radigihînin û li dawîya şevê Sîyabend xwe di ser dîwarê hewşa mala Nêrgizê ra diavêje û diçe jivana xwe ya li gel Nêrgizê. Li vîrê peywendîya kesayetîya sereke ya romanê li gel mekanî, anku hewşa mala Nêrgizê bi peywendîyeka evîndarî û sozdarî tê hejmartin. Sîyabend diçe ber dîwarê hewşa Nêrgizê û Nêrgiz jî tê ber dîwarî û herdu evîndaran şevbêriya xwe dibire serî û hastên xwe bo yekdu derdibirîn. Di nav vê peywendîya vê kesayetîyê romanê de

Sîyabend li gel vî mekanî, ber dîwarê hewşa mala Nêrgizê, peywendîyeka evîndarî û sozdarî ye:

“Bîrhatinên wê heye û ne yê min in. Şevbêrîyên me li direngî şevan li ser dîwarê hewşa mala wan bûn. Ez li vî alîyê dîwarî û ew li alîyê dî, em pitir nêzîkî hev dikirin. Bi zimanekê şîrî û şîrîn dipeyvî û di bîrdanka min da ya tomarkirî ye” (Mihemed, 2005: 20-21).

Hindek mekan hene di nav jîyana mirovî da, mirov bo xwe dike riwangehek aram, anku dibe ew mekan yê ku mirov xwe pê ji metirsîyan diparêze. Di nav vê romanê da ev cure peywendîye, anku peywendîya aramîyê di navbera kesayetîyên vê romanê û mekanê wê romanê da heye. Di navbera arasteya vegêrana vê romanê da û li ser zarê lehengê romanê Sîyabendî, behsa kesayetîyeka lawekî dike bi navê Mişîr ev kesayetîya lawekî, şoreşgêrek bû, rojekê dikeve di nav şerekê giran da li gel dujminî. Piştî ku Mişîrî mêranîyeka mezin di şerî da encam da û piştî hingê her du pêyên xwe ji dest dide. Şer yê dijar e û firokeyên dujminî jî li hindavî şoreşgêran e û bombeyan dihavêjin, demê bi vî rengî Mişîr bûyî. Êdî çî jê nehat ku şerî bike, vê carê li ser zikî xwe kêşa di nav tiraşekê da anku ev mekane nav tiraş jî bo Mişîrî bûye mekanekî aram ta xwe pê ji dujminî biparêze. Li vêrê hevalên Mişîrî anku şoreşgêrên dî Mişîr hêla li ber tiraşê û neçar bûn birevin û xwe gehandin kopên bilind ên çîyayan ku li vêrê ev kopên bilind ên çîyayan bûne mekanekî aram û penagehek dûr ji metirsîyê bo van şoreşgêran. Wekî encama vê peywendîya Mişîrî ya li gel nav tiraşan û peywendîya hevalên wî ya li gel kopên bilind ên çîyayan xuya dibe ku peywendîyeka aram û ewledar e. Anku van kesayetîyan ne tiraş ne jî kopên bilind ên çîyayan bo xwe kirine penageheka aram ji pêxemet xweparastinê ji serbaz û firokeyên dujminî:

“Mişîr bizotê şoreşekê bû, di şerekê giran da li gel dujminî, piştî her du pêyên xwe ji dest dayîn, hatibû girtin. Firokeyên şerker li hindava gelî hatinûçûn dikirin û qumbele diavêtin. Wî birnuya xwe avête di nav wê tiraşa dûrî xwe, xon ya dibin da dibe ger, yê kelexê xwe ber bi tiraşa mezin ve radixîşînit, hevalên wî naçarin xwe bigehînin kopên çîyayê li ser wê deştê zal da ku xwe ji semta dûrbîna firokeyan dûr bêxin û di dehlekî ra xwe berze bikin” (Mihemed, 2005: 54-55).

Herdem peywendîyeka rasterast di navbera kesî û wî mekanî da heye yê ku lê mezin bûye û zarokîniya xwe lê borandî. Di nav vê romanê da ev cure peywendîya di navbera kesayetê sereke Sîyabend û mekanê lê mezin bûyî de heye. Di arasteya demê vegêrana vê romanê da, nivîskarî paşvezivîrînek li dema vegêrana rûdanên romanê

dike û Sîyabend behsa wî gundî dike yê ku lê mezin bûyî û jîyana xwe ya zarokîniyê lê borandî. Behsê Danga Gundî dike, anku ber perê gundî, ew gundî lê mezin bûyî û di nav da jîyana xwe ya zarokîniyê lê borandî. Navê yek ji hevalên xwe yê zarokîniyê diîne ku navê wî Seo ye û wan her duyan li gel zarokên di yê gundî bi hev ra li dormanên gundî yarî dikir û Seo weku serkêşê zarokên gundî bû, van zarokan li nav vî mekanî yarî dikirin û xwe bi betenan da dixiştand, li vêrê ew peywendîya kesî bi mekanê zarokîniyê ve diyar dibe û di nav vê romanê da ku ew peywendî ye bûye eger ew bîrhatinên zarokîniyê bi zindî bimînin di nav hest û hizrên wî da:

“Bîrdanka wî li bar e û hemi rojên zarokîniya xwe di çavan da nîşan dide yan jî divîya xwe jîbîrve bike. Ji êş û azaran xwe veder kit û hindek bîrhatinên zarokîniyê vegefrînit. Seo, wê bi du salan ji wî mezintir, difneka zirav û rûyekê hilû û zimanekê berday, ji pesnên wî diyar bûn.

...

Li danga gundî li ser zûrka û givandan da xwe bîtehisînin. Seo, serkêşê koma zarokên gundî, her tiştekê wî kirba, divîya hevalên wî jî çî qenc yan xirab ew jî bi wî karî rabiban. Dema xwe di betenê da li ser gîyayê ter tehsandî, hemi zarokên di jî wekirin û berdewamî bi vî yarîyê didan” (Mihemed, 2005: 16).

Her di arasta peywendîyên kesên romanê bi mekanê tirs lê heye xuya dibe, anku hindek mekan hene, dibin mekanê metirsîyê belê mirov bi neçar dibe hindek caran biçe di navê van mekanan da û di ser hindê ra hestê tirsê li cem mirovî peyda dibe. Kesayetîyeka lawekî bi navê Evdê û hevjiîna xwe biryarê didin biçine bajêrî ji pêxemet kirina hindek kelûpelan. Belê di rêkê da Zalgehek ya rejîma Beasê heye û mekanekî gelek bitirs e û pêdivîye her tirombêla di nav vî zalgehê da biborît beşîn bo bê kirin û gelek kes li vî zalgehê dihatin girtin û êşandin û bêserûşûn kirin. Dema tirombêla Evdê û hevjiîna wî nêzîkî zalgehê bûyî tirs kete di dilê wan da anku peywendîya tirsê li vêrê di navbera van her du kesan da û wî mekanê çêbûy, anku ev mekane ye metisîdar e û dema ew tirombêla digehe zalgehê Evdê û hevjiîna xwe li vî zalgehê tên êşandin û girtin:

“Evdê di sîh salîyê da ye, ji nû mamê wî kiça xwe lê mehir kirîye.

... wê nîvroyê baraneka hûr dibarî, dema Evdê û hevjiîna xwe ya dotmam li tirombêlê siwar bûyî û ber bi bajarî ketîne rê.

... tirombêl pitir nêzîkî bajarê bû, di sînorên wî da bane zalgehê diyar kir....

Li dûmahîyê pêngav mezintir lê hat û di çavên Evdê û hevjiîna wî da dergehê heftê yê dozexê awazeka melûl di serî da dijenî. Li gel rawestana tirombêlê û vebûna dergehên wê dilên wan jî rawestîyan” (Mihemed, 2005: 123-126).

2.1.2. Peywendîya Mekanî bi Kesayetîyên Romana *Gehnom* ve

Li destpêka vê beşê me bi fer dît, em puxteyekê bidin ser vê romanê. Bi rengêkî giştî, ev roman e vegêrana çendîn babet û rûdanên civakî dike û rûdana sereke ji ew bû ku dayika kesayetîya sereke ya vê romanê bi navê Hoşzan rûbirûyê revandinê dibe li ser destê hindek kesên ku dujminî yan xwîndarî li gel xêzana wê heye û piştî hingê û piştî destdirêjî li ser tê kirin, bi tenê diavêjin nav daristanekê. Hindek kes vê jina bêguneh dibine dev xwe xudan dikan û piştî bi ducan dikeve zarokek bi navê Hoşzan dibe. Yek ji kesayetîyên din yê ku rol diparastina vê jinê da heye û xwedankirina wê bi navê Çîro bû. Wî rolekê berçav hebû di xwedankirina vê jinê da û navê wê guherî bû kiribû Cênder û jê re karek li fermangeheka hikûmî bo dîtibû. Piştî sê salan malbata Cênderê dizanî li ku ve diji û tên li nav taxa Gehnom dikujin û zarokê wê yê sê salî dimîne û piştî hingê dibe mala êtîman. Piştî çendîn salan li were dimîne ji mala êtîman direve û tê mala xwe li taxa berî çemê bajarî ku navê Gehnom li ser wî taxî danaye. Ji ber ku kesên hejar û destkurt lê dijîyan. Hoşzan karê komkirina betlên lekî û qudîkên pipsîyan dike ta debara jîyanê bike. Hoşzan hewl dide ku bizane kanê babe wî kî ye û dayîka wî ji ber çi mirîye?

Jêyatîya mirovî bi mekanê jîyara mirovî gelek bandorê li ser reftar û serekerîyên mirovî dike. Anku ew mekanê mirov lê dijî karîgerîyê li ser astê hizrî û cesteyê mirovî dike. Kesayetîya sereke ya vê romanê Hoşzan di nav xeweka şîrîn li nav kolkê xwe da ye. Ew kolkê bi karton û naylonan çêkirî û di nav taxa Gehnomê da û dema baran hatî çipkên baranê bi ser naylonê ketin ew ji xew hişyar bû. Dema hişyar bûyî bi tinê dengê zirîna kerekî dihat ku taxa Gehnomê hemî vedigirt. Li vêrê peywendîyeka rasterast di navbera vî kesayetî Hoşzanî û vî mekanî Kolkî wê li taxa Gehnomê heye, ji ber ku jîyana hejarî û destkurtîyê wekirîye ku ji neçarî Hoşzan bê vî taxa hejar û bêyî xizmetguzarîyên jîyanê. Ji alîyekî din ve, ev xanîyê ji nalyonî çêkirî, amajeyeka rasterast e bo bercestekirina wê rastîyê ku Hoşzan ji vî mekanî ye û di nav vî mekanî da jîyana xwe berdewam dike:

“Hoşzan Cindêr Gozê.

Cirfêk bi te kevt, xew verevî, hizr verevîn, sere te yê giran û tijî xewn ji nav miqawan bilind bû û te.... lê tenê zirîna kerekî ji nêzîk dihat û çi lorîn û qêrî jî ji gehnomê te nebihîstin û hemî xewnên te di kolîreyan ra asê bûn” (Mihemed, 2022: 17).

Kesayetîya sereke ya vê romanê Hoşzan û piştî ji karê komkirina betilên pipsîyê û naylona dizivire ve, ew weku bêhinvedanekê bo xwe li çayxaneyê Çîro yek ji kesayetîyên lawekîyên vê romanê ye û gelek harîkarîya Hoşzanî û dayîka wî kirbû. Li vêrê Hoşzan weku babekî li vî kesî dinêre, anku dema Hoşzan diçû çayxaneyê Çîro wî hest bi aramîyê dikir. Ji ber ku bîrhatinên dayîka wî bo dizivirîne ve, li vêrê peywendîyeka rastewexwe di navbera kesayetîya sereke Hoşzanî û vî mekanî da Çayxaneyê da heye. Çinku xwedanê çayxaneyê bi çavên diloanîyê temaşeyî Hoşzanî dikir. Dîsa Hoşzanî dixwest bi rêka vî mekanî hindek zanîyarî ji xêzana xwe bizane weku erê ew kî ye û Dayîka wî çawa mirîye?

“Çayekê bo Hoşzanî bînin.

Piştî li mekanê xwe yê her car li ber xebengê li nêzîkî mêzeya jimêryarîya çayxaneyê mêhvankî li erdê rûdiniştîm, Mam Çîro yê xwedanê çayxaneyê wegot. Çayçî jî peyaleya çayê dana ber min û got: Keremke seyda” (Mihemed, 2022: 22).

Mam Çîro, kesayetîyeka lawekî ye di nav vê romanê da û kesekî dewlemend e û xwedan serborên jîyanê ye û gelek qelis e. bi xwe pîyaleyeka çayê bêberamber nade çî kesa bi tenê Hoşzan nebe. Ev kesayetîya henê nivêja rojê dikir û li vî demê Çîroy nivêj dikir, gelek dibî qelebalix û gelek li ser cadeyê derbaz dibûn. Belê ew merema di nav dilê Çîroy da heye kanê ji ber çî li vî mekanî û li vî demê ew nivêjê dike, kesî bersiv nedizanî. Li vêrê peywendîyeka rasterast di navbera vî kesayetî Çîroy û vî mekanî û çayxaneyê da heye, ji ber ku Çîro bi xwe xwedanê çayxaneyê ye û dîsa mekanekî taybet e ku li nav çayxaneyê dema nivêjê dike. Herwisa karê Çîroy ye biçe ber çayxaneyê xwe:

“Piştî nivêjê tê kiirn û roj bejnekê li hindavî bajarî xwe bilind dike, mam Çîro nivêja rojê li mekanekî berçav li çayxaneyê dike, ku wî bi tenê merem ji vî nivêjê dizanî, wî demî xelk bo kar û kokên xwe bi cadeyan werdibin” (Mihemed, 2022: 22).

Kesayetîya lawekî Çîro xwedanê çayxaneyê bû, qatê duyê yê çayxaneyê mala Çîroy lê bû. Ew li gel jina xwe ya bi navê Roslîn û kiça xwe ya yekane bi navê Îzêl dijîya, anku peywendîyeka rasterast di navbera Çîroy û her du kesayetîyên di yê lawekî Roslîn û Îzêlê û vî mekanî heye. Anku çayxaneyê heye, ji ber ku mala wan li qatê duyê ji avahîya çayxaneyê ye û li were dijîn:

“Nihomê duyê yê çayxaneyê mala wî bû. Sê mezelik û lîwaneka mezin û lînangeh û tewelêt û serşoyeka ava germ Cakozî danabû... Di vî avahî da, çîro û jina wî roslîn û

kiça wî Îzêl ya saxletên ciwanîyê ji dayîka xwe wergirtin dijîyan” (Mihemed, 2022: 26).

Gelek caran mirov bi neçarî ji mekanê jîyana xwe mişex dibe û qesta mekanekî dî dike. Ev mekanê nû bo mirovî dibe mekanekî namo û nexweş. Di nav vê romanê da kesayetîyeka lawekî heye bi navê Sorûbelek xelkê gundan e û karê cotyarîyê dike. Genim, ceh û keskatîyê diçîne, belê ji ber ku gundê wan dikeve deverên sînori, ew ji neçarî mişext bûye û hatîye bajarî. Li vêrê ev mekanê nû bo wî yê nexweş e û hest bi aramîyê nake û bêkar maye û ji neçarî maye li bajarî û xanîyek box we bi kirê girtîye. Ji ber ku Sorûbelekî ji neçarî gundê xwe hêlaye, çunku gelek topbarana wî gundî dihat kirin. Vê carê hatîye bajarî û çî kar jî nînin bike, lewra bi berdewamî diçe çayxaneyê û dema xwe diborîne. Li vêrê peywendîyeka rasterast di navbera vî kesayetîya lawekî ya vê romanê û vî mekanî da heye Çayxaneyê. Ew jî peywendîya neçarî ye anku bineçarî li bajarî û vî mekanî dimîne:

“Sorûbelek, wê xir difin, ku dumahîyên simbêlên xenakirî bo serî bilind dike, cotyarekê ki karê cotyarîyê veqetyay, bi bergîzên xwe yên xîç xîç rojê hemûyê kerawîtê gewir bernade... wî zevîyên mezin û berfireh yên genimî û cehî diçandin û karê bacanan û xîyan û kulindan û bamîyan û bacanreşkan dikir. Lê nuke ji egerê topbaranên sînoran gund berdaye û li bajarî akincî bûye” (Mihemed, 2022: 28).

Kesayetîya lawekî bi navê Siloyê Xecê di nav çayxaneyê da dikeve danûstandinê û dengûbasan li gel kesên din û dema ew diçe ser kerawîtê ku dikeve kujîyê serî yê çayxaneyê. vî kesî pirsyar ji van kesan dikir yên ku di nav çayxaneyê da rûniştî, kanê çî dengûbas hene. Ji vê çendê xuya dibe ku vî kesayetî Siloyê Xecê peywendîyeka rasterast li gel vî mekanî heye anku Çayxaneyê, ji ber ku dema dixwestî dengûbasan bizane, qesta çayxaneyê dikir:

“Ew ê li kujîyê serî rûniştî û qaçik di devî da û fir li çayê dida, digot Siloyê Xecê, lifka dersoka cemedanî havêtbû ser mile xwe û digot, çî heye û çî nîne?” (Mihemed, 2022: 29).

Hindek mekan hene di nav jîyana civakî da kesek yan jî komeka kesan gelek karîgerîyê li ser wî mekanî heye û di nav vê romanê da kesayetîyeka lawekî heye bi navê Mam Têlo li taxa Gehnom dijî, anku taxa hejar û belengazan dijî. Gehnom navê gelîyekî ye dikeve sînore bajarê Qudsê li welatê Felestînê di nav vî gelî da qurban bo xwedawend Morlox dihatin pêşkêşkirin. Anku mekanekî nexweş û pirî azar û kuştin. Hoşzan kesayetîyê sereke ya vê romanê navê ew taxa lê dijî bi navê Gehnomê bi nav

kirîye, çunku yê nexweş e û bi tenê taxa hejaran e. Mam Têlo yek ji akincîyên vî taxi ye û yê bernîyas e bi gotina stranan û hemî xelkê taxa Gehnomê xweşî bo xwe bi awazên Mam Têloyî dibirin. Li vêrê peywendîyeka rastewexwe di navbera kesayetîya lawekî Mam Têlo û vî mekanî Gehnomê da heye. Ji ber ku awazên şîrînên wî di nav vî mekanî da bernîyas in û mekanê dilxweşîya xelkî ne:

“Mam Têlo bi awazên xwe canekî cadoy dihavête ser xemên Gehnomê û hero da serê xwe nizmîne ser ava çemê kevn û xewna xwe bo pêlan bêje...” (Mihemed, 2005: 69).

Kesayetîyeka din bi navê Cango ku yek ji zarokên hevalên Hoşzanî bû, hevalên wî dihatin cem xwendingehê û jivanek hebû. Ew da amajeka dengî denê, vê carê ew jî yekser ji xwendingehê derdiket. Li vêrê peywendîyeka rasterast di navbera wî û mekanî da heye. Ji ber ku revîna Cango ji xwendingehê amajeyeka rastewexwe ye bo hindê ku Cango hez li ser xwendinê nîne.

“Cango, li gel fitika waneya dûmahîyê, bi lez ji fêrgehê derdiket û digehişt mal, dîwarê mala wî jî bi fêrgehê ve bû...” (Mihemed, 2005: 159).

2.2. Mekan û Rûdan

Rêgezên hunerî yên her metneka edebî peywendîyeka rasterast li gel hev du heye û rûdan jî weku rêgezeke hunerî di nav romanê da peywendî bi hemî rêgezên din ve heye û rûdan dibe birbireya hemî rêgezên vegêranê di nav metna edebî da, weku kesayetî, dem û mekan. Rûdan pêkhatîye ji komeka kar û kiryan û bi rengekî egerî hatîne rêkxistin di nav romanê da û behsa babetê romanê dike. Dîsa rûdan amajeyê dide di navbera kesayetîyên romanê da û rûdan dibe beşê bineretî di nav romanê da û hemî rêgezên din bi hev ra tên girêdan (Hemîdatu û 'Emarî, 2019: 36). Ji alîyekî din û sebareet giringîya rûdanê di nav pêkhateya hunerîya romanê da nivîskar Reşad Ruşdî xuya dike ku “Her rêgezeke hunerî ya di nav pêkhateya vegêranê da weku saloxdan, diyalog û vegêranê ye. Gerek e di xizmeta vegêranê da bin û ev çende dibe eger ku rûdan werarê bi xwe bibîne û pêş bikeve.” (Roşdî, 1962: 115). Li pey vê çendê û ji ber giringîya rûdanê pêdivîye hemî rêgezên din yên hunerî yên romanê kar ji bo karakirin û bercestekirina rûdanê bikin. Helbet rûdana di nav romanê da ne weku rûdana jîyana ketwarî ye, anku ne bi temamî weku wan rûdanan e yên ku di nav jîyana me da bi rengekî ketwarî rûdidin û sererayî hindê ku rûdanên

romanê hizrên xwe ji rûdanên ketwarîyên jîyana me werdigirin, belê ne weku yek in (Yusif, 1997: 27). Ji alîyekî din ve, binyatê rûdanê di nav vegêranê da bi giştî û romanê da bi taybetî bi tenê nahêne karakirin, ji ber ku peywendîyeka mikum di navbera rûdan, dem, kesayetî û mekanî da heye. Kesayetî dibe sedema çêkirina rûdanê û mekan jî dibe ew valahîye ya ku rûdanê li nav xwe digire û dîsa pêdivî ye rûdan li dûv rêzkirineka demî bê rêkxistin û vegêran (Kazim û Kazim, 2012: 67) Li dûv vê çendê ji bo me giringîya rûdanê di nav pêkhateya hunerîya romanê da xuya dike û rûdan di nav têgeha xwe da di nav vegêranê da pêkhatîye ji sistemekê kara û bikerek pê radibe ku ew jî kesayetîyek e vê carê rewşa kesayetîyan ji doxekê bo yeke din tê guherîn weku guherîn ji xemgînîyê bo bexbeşîyê (Zaqot, 2019: 172). Li dûv vê çendê rûdan dibe ew rehenda bizvîner bo encamdana karan û karakirina encamên karan û ev çend e dibe sedema peydakirina guherîna rewşa kesayetîyan di nav romanê da. Nivîskar Mike Pall li dor têgeha rûdanê xuya dike ku rûdan pêkhatîye ji guherîna rewşekê bo rewşeka din di nav romanê da. Rûdan ew tişt e ya ku dibe sedema guherîna tiştêkî yan jî afirandina bizavekê ji bo berhemanîna tiştêkê di nav romanê da (Muhemed, 2018: 21-22). Rûdan bi dîtina nivîskar Roland Pronov pêk hatîye ji hevrikîya hêzên hevdîj di nav helwesteke dîyarkirî da, ji ber ku her çirkeyek di nav rûdanê da dibe sedema çêbûna hevrikîyekê di navbera kesayetîyên romanê da (Ewîlîye, 1991: 144). Xuya dibe ku ji encama hevrikî û milmilaneyê di navbera kesayetîyên romanê da, rûdan di nav romanê da çêdibin û romanê vegêranek e ji komeka rûdanan pêk tê ku kesayetîyên romanê ev rûdan e li dem û mekanên dîyarkirî encam dane û ev çende li gor dîtina nivîskarî ye bo cîhanê û redeste karîgerîya wî bi jîngeh û derdora wî ve (Hemîdî, 2015: 58). Hizir û dîtina nivîskarê romanê rolekê mezin û karîger digêre ji bo çawanîya bercestekirina binemayên rûdanan di nav romana xwe da, anku ew rengvedana hizir û îdolojîyayê bo nivîskarî ji cîhana ji derve çêdike û beşdarîyê di dariştina rûdanên romana wî da dikin û li gor pileya karîgerîya xwe bi cîhana ji derve. Romannivîs puxteyê wê karîgerîyê di nav rûdanên romana xwe da berceste dike. Her wisa rûdanan di nav romanê da weku yek ji rêgezên serekeyên romanê tê hijmartin ku babetê romanê li dor wê rûdanê dizivire û nivîskar vê teknîkê ji bo pêşxistina helwest û kesayetîyên romanê bi kar diîne. Nivîskar hizira van rûdanan ji jîngeha derdora xwe werdigire ta bikare arîşeyên ketwarî yên civaka xwe di nav da nîşan bide (Bin Berîket, 2016: 33). Anku ew

rûdanên di nav romanê da hene ji encama wan rûdanan hatîne bercestekirin yên ku di nav jîyana civakî da heyn û li vêrê nivîskar romanê ji bo xwe dike alavek ji pêxemet nîşandana arîşeyên civakîyên ketwarê xwe, belê li vêrê pêdivîye amajeyê bidin xaleka here giring li dor çawanîya afirandina rûdanê di nav romanê da, ew jî çêkirin yan dahênana rûdanê di nav romanê da pêdivîyatîya bi zîrekî û şarezayîyê heye, her wisa pêdivî ye nivîskar yê şareza be di rêzkirina rûdanên romanê da li pey sistemekê taybet ta bala xwendevanî bi babetê romana xwe rabikêşe û xwendevan neçar bibe bi rûdanên romanê ve bê girêdan (Şiwax, 2018: 22). Şarezayîya nivîskarê romanê roleka giring û sereke ji pêxemet afirandina rûdanên balkêş di navromana xwe da digêre. Ta xwendevanî bo babetê romana xwe rabikêşe û karîgerîyê li ser bike. Arasteya bercestebûna rûdanan di nav romanê da li ser gelek astan giringî û karîgerîya xwe berceste dike û tiştê xwezayî ye ku çî roman di vala nebin ji rûdanan ji ber ku rûdan dibin bizvînerê serekeyê babetê romanê û rûdan neşên berceste bibin, tine di nav mekanekî dîyarkirî da, rûdan ji wan rêgezan tê hijmartin yên ku karîgerî li ser astê avahîya vegêrana romanê hey, vê carê rûdanan roleka mezin heye di avakirina mekanê romanê da û kanê çawa rûdan karîgerîyê li ser mekanî dikin vê carê bêguman dê mekanî jî karîgerî li ser rûdanên romanê hebe (Buqret Şehret û Ehlan, 2017: 82-83). Li vêre bo me dîyar dibe ku rûdan ji wan rêgezan e yên ku karîgerîya xwe li ser hemî pêkhateya romanê heye û karîgerî li ser mekanê romanê heye. Karabûna hemî rêgezên hunerîyên romanê û karakirina wan hemîyan pêkve dibin sedema hindê peywendîyên binyatên romanê yên navxweyîyê bihêz bikevin û di encama da dibin sedama wê çendê ku pitir sîmayên rûdanê di nav romanê da xuya bibin û bi tenê li wî demî dê rûdan weku rêgezeke hunerî peywendîyê li gel rêgezên dî yên romanê bihêztir bike (Behyatî, 2016: 12). Anku dê ji encama karabûna hemî binyatên navxweyî yên romanê pitir bercesteîya rûdanê hebûna xwe werbigire û paşî dê rûdan peywendîyên bihêz li gel kesayetî, dem û mekanî rêgezên dî yên hunerî yên romanê girê bide.

Li dawîya vê beşê û ji encama vê nîşandana borî bo vî babetî, em dikarin bibêjin rûdan weku yek ji giringtirîn û sereketirîn rêgezên hunerîyên romanê ye û karîgerîya xwe li ser tevaya pêkhateya navekî û derekîya romanê heye û rehendek giring e ji bo balkêşana xwendevanî bo babetê romanê. Belê, rûdanan pêdivîyatî bi kesayetîyekê heye heta wan rûdanan encam pê bide û ev kesayetîye jî pêdivîyatî bi

mekanekî heye ta bikare li ser mekanî bi role xwe rabibe û rûdanên romanê encam bide.

2.2.1. Peywendîya Mekanî bi Rûdanên Romana *Sotîngehê re*

Yekem rûdana sereke ya vê romanê li ber çav dikeve ku peywendî bi mekanî ve heye, ew rûdana desteserkirina lehengê vê romanê Sîyabendî ye. Vegêrê romanê di saloxdan, rêkxistin û hûrbînîyê da û rûdana girtina vî kesî di nav rehendên çendîn mekanên romanê da berceste dike. Li destpêkê saloxdanekê dide wê tirombêlê ya ku Sîyabend di nav da hatîye girtin û kelamçekirin û çavên wî girtî û ev tirombêle di arasteya bizava xwe da ji du mekanên olî derbaz dibe ku ew jî dêr û mizgeft in û ev tirombêle tê di nav meydana wî avahî da yê ku zindan di nav da heye. Lê vêrê rûdana girtin û înan Sîyabendî bo zindanê ji nav rehendên van mekanan xuya dibe dêr, mizgeft, meydak, avahîyan zindanê, her wisa di nav vê rûdanê da rehendên wê zulim û sitemê dîyar dibin ku rejîma Beasê derheqê gelê kurd da encam daye. Piştî tirombêl di nav meydana avahîya zindanê da rawestayî çend zelumên rapêçayî û biçek Sîyabend ji tirombêlê derêxistin û di rê da her yekê ji wan kulmek didana Sîyabendî û gelek êşandin ta birîye di nav jûra zindanê da û kire di pişt şifşên zindanê da. Ji vê rûdanê û şûnda çendîn rûdanên din yên lawekî ji vê jûra zindanê dest pê dikin. Ji vê rûdanê xuya dibe ku peywendîyeka rasterast di navbera rûdana girtina Sîyabendî û ew mekanê bo hatî veguhastin da heye û bi rêya vê çendê amaje bi wê zulim û zorîya li kesên bêguhêz dihatî kirin di nav zindanên rejîma Beasê da:

“... Tirombêlê, dêr û mizgeft li pişt xwe hêlan û bi lez çep da û bi meydanka wî avahîya bilind û asê keft û rawestya, wan zelumên baş rapêçayî û tilên wan li ser loleyên tivengan, xwe jê havête derê û xortekê çavgirêdayî û dest û dest ji pişt ve kelamçekirî ji pişt tirombêlê rakêşane derê û her êkê ji alîyekî xwe ve dana ber mist û kêlincîya û bi jûr êxistin... û li ber şifşên jûrekê rawestandin.” (Mihemed, 2005: 12-13).

Di nav zindana rejîma Beasê da, hemî cureyên êşan û eşkenceyê di derheqa zindankirîyan da bi kar dihatin, weku cestey û derûnî. Yek ji rûdanên here mezin û bitirs a bi serê Sîyabendî di nav zindanê da hatî. Ew e ku ji layê cestey û derûnî ve Sîyabend dihat êşandin. Piştî Sîyabend hatî zindankirin û piştî hingê hatî veguhastin bo jûra lêkolîn û eşkencedanê. Anku ev rûdanên nexweş ên bi serê Sîyabendî hatî di nav jûra lêkolînkirinê da bi sere Sîyabendî hatî. Dema lêkolîn li gel hatî kirin ji layê

du efseran ve yek bi navê Necim bû. Vî kesî hewl da bi zorî danpêdanan ji Sîyabendî werbigire û gelek kiryarên nemirovatî di derheqa wî da kirin. Yek ji wan Sîyabend bi pankê ve hilawîst û pank zivirî. Herwisa cigare bi leşê Sîyabendî vemirand. Dîsa Sîyabend da ber karebê. Eve hemî ji alîyê cestey ve bûn, belê rûdana karîgerîyeka derûnî ya mezin li ser hasten wî kirî, ewe dema ku yek ji efseran bi navê Ebid mîztîye ser leşê Sîyabendî. Vê rûdana mîztinê gelek nexweşîyên derûnî bo Sîyabendî çêkirin ku dibe ew nexweşî ji nexweşîyên cestey li cem wî biêştir bûn. Peywendîya vê rûdana eşkencedana Sîyabendî peywendîyeka yekser bi wî mekanî ve heye yê ku di nav da hatîyê eşkence dan ku ew jî jûra lêkolînkirinê li nav zindanê bû:

“Necim, demê xwe ji ser piştê wî havêtî xwar, sola sertûja wî ji lêvê girit û vizkên xwînê bi lêvan da hatin. Wî qamçî ji destê hevalên xwe îna der û bi hemî hêza xwe binê pêyên Sîyabendî dawêşand...”

... Wî cigare bi sere çîşkê wî vemirand, piştî rekirîye ser pêyan. Tîfkirinê û kenîyeka kirêt rahêla piştî hevalê wî qirase êxistî sere çîşkê Sîyabendî. Derpê kurtkê wî îna xwarê û ya dî bi gunên wî ve çespan û serên wayîran gehandin patirîyê...

... Li dûv xwe kêşan û bi asinê pankê ve hilawîstin û werîs kêşan, bejneke pêyên wî ji erdê xulole bûn...

... û li hindav rawestîyan û zincîreya pentelonê xwe yê zeytûnî kêşa xwarê û mîzte bi kelexê Sîyabendî ve û sê carkî çizka mîzê ji pêyan û heta serî vêra hîna.” (Mihemed, 2005: 44-49).

Kesayetîya lawekî bi navê Mam Hacî înaye di nav wê zindanê da ya ku Sîyabend di nav da hatîye zindankirin. Sîyabend pirsyarê jê dike, erê ji ber çi hatîye zindankirin? Mam Hacî behsa rûdanekê dike ku peywendîyeka rasterast bi gundê wî ve heye, anku ev rûdan rasterast girêdayî mekanî ye û dîyar dike, dema leşkerê hikûmeta Beasê hêrişî gundî kirî, li vêrê yek ji wan serbazan agirî berdide xwendingeha Gundî anku rûdana agirberdana gundî bi destên serbazan vedigêre û ji arasteya vegêrana vê rûdanê. Bi gotineke zelaltir sotina gundî û mal û xwendingehan dîyar dibe ku mekan di nav da navendê sereke ye, kewate ew kiryare bi sere mekanî hatîye:

“Salek ji salan hêrişeka giran bi ser millet û welatê me da hat. Gund xirab kirin, av pîs bû, darûbarî xemla xwe guhert. Dema bi her du destan min mekîneya wî vegirtî, min jûr da li erdê da û li bin pê xwe herişand. Ew gelek bi vê kiryarê dilgiran bû, lewra agir berda sêvandeya fêrgehê...” (Mihemed, 2005: 97-103).

Kesayetîya lawekî bi navê Mişîr di vegêrana rûdaneka diltezîn da, amajeyê dide rûdana kuştina dîyka xwe ku li axûra gundê wan ketbû, anku vê rûdanê peywendîyeka rasterast li gel vî mekanî heye ku ew jî gundê lehengî ye. Dema

hêrişeka hikûmeta Beasê hatîye ser gundê wan û gund talankirî û sofî. Li vêrê dayîka lehengî çûye avê bo male bikêşe û cerkê avê li ser milî ketbû û bi guleyan hatibû kuştin. Şûn pêlavên serbazên dujminî jî li ser û çavên wê çêbibûn, dayîke kesek sivêl a bêguneh bû. Vê rûdanê jî karîgerîyeka mezin kirbû ser derûn û hestê vî kesî:

“Dayîka min cerkê avê li ser milan ketbû, li kujîyê axûra sed metirekan ji gundî dûr cerkê wê pirt pirt bibû. Çendekê wê li ber lêva rê bû. Pêyên wê bi temamî di rê da mabûn û sere wê jî li ber lêva rê varê bibû. Xûn û av têkil bibûn. Nîşana postaleka leşkerî li ser sîngî çap bibû û golekê enya wê ya hero bo kirina nivêjan kirnoş dikir...” (Mihemed, 2005: 143).

Dûmahî rûdana di nav vê romanê da li ber çav dikeve ewe, dema ku Sîyabendî çar salên zindanê bi bêgunehî derbaz kirin, hate berdan û li mekanekî germ ku xîzê şaryaye anku li ber derê zindanê dayîka wî ji ber vê rûdanê bêhiş bibû, kewate hindî keyfa wê xweş bû vê carê bêhiş bûye, rûdaneka xemgîn bû piştî ku hişên wê tîn serî, Sîyabend li gel diaxive û dibêje ku ew nemirîye û hîna zindî ye. Ev rûdane li mekanekî germ û nexweş anku di nav hewşa zindanê da bi dîdara dayîka xwe şad dibe:

“Meydaneka pan û mezin e, di nav çar dîwarên konkirêtî û bilind û hilû da ye. Ev dîmene du cîhana jêk cuda... li ser xîzê germ, doşeka nîf metirî zirav û car û nîva dirêj raêxist û ew jina dilgirtî li ser razand, piştî çipkên avê li ser rûyê wê reşandîn, hişyar bû. Ji gel xwe havêtê û kire girî. Dadê, negirî... ezê saxim... nexew û ne jî...” (Mihemed, 2005: 226).

2.2.2. Peywendîya Mekanî bi Rûdanên Romana *Gehnomê re*

Di nav arasteya vegêrana vê romanê da, gelek caran hebûna rûdaneka mezin û diltezîn dibe egerê hindê ku bandora xwe li ser mekanî peyda bike. Anku ji ber wateyên nexweşên vê rûdanê, saxleta xwe li ser mekanî zal dike. Sorûbelek yek ji kesayetîyên lawekîyên vê romanê ye û ew bi xwe berî niha li gundî dijîya, lê ji ber topbarankirina gundên sînorî, ew bi neçarî mişextî bajarî bûye û bo xwe xanîyek bi kirê girtiye. Rûdana birîndarkirina her du kiçên wî li gundî, her dem li bîra wî ye û çî caran vê rûdanan nexweş ji bîr nake, firokeyan bombe havêtine gundî û bombeyek ji wan bi xwendingeha gundî dikeve û her du kiçên wî di nav xwendingehê da birîndar dibin. Li vêrê ev rûdana henê û ji ber wê wateya nexweş digehe û bandora xwe li ser mekanî xwendingehê berceste dike û li vêrê ew peywendîya bo me xuya dibe di

navbera rûdana bombebaran kirina xwendingehê û birîndarbûna her du kiçên Sorûbelekî da rûdaneka diltezîn e dijî mafên mirovahîyê:

“Sorûbelek çi caran ji bîr nakit ew bombeya ji nişkekê ve bi fêrgeha gundî ketî û her du kiçên wî birîndar kirin. Evro ji neçarî xwe di jûreka bikirê li kolaneka vî bajarî da heşar daye û her şev ji ber xew vediciniqit...” (Mihemed, 2022: 31).

Hindek mekan hene ku ji alîyê serve aşna ne û bo mirovî xweş in, belê mirov hest bi xweşîyê nake, belku bi zûtirîn dem ji wî mekanî direve. Anku li vêrê rûdana revînê ji vî mekanî xwe di nav hemî pêkhateya vegêrana romanê da dibîne. Rûdan dibe hevterfêbê li gel wî mekanê jê direvî û ta digehe wî mekanê ji bo diçe, piştî ku dayîka Hoşzanî dimire, ew tê veguhastin bo Mala Êtîman, raste li vî mekanî hemî pêdivîyên jîyanê hene weku xwarin, vexwarin, cilûberg, serşo, xwendin û fêrkarî... Belê Hoşzan yê aram nebû, piştî du salan biryarê dide ku ji Mala Êtîman bireve. Li vêrê mekan weku rehenda serekeyê vê proseya ku Mala Êtîman e dikeve jêr bandora rûdana revîna Hoşzanî ji vî mekanekî dî ku ew jî taxa Gehnom e. rast e li taxa Gehnomê hemî pêdivîyên jîyanê bo Hoşzanî li ber dest nînin. Belê li vî mekanî pitir hest bi aramî û soza dayîka xwe dike:

“... Bi taybet dema mana min li Mala Êtîman fêrî gelek tiştan bû... Xwarin, vexwarin, mekanê şuştinê û nivistinê hebûn, lê xem hevalcêmkî min bû. Di vederîyê da bûm û min hest bi zindanê dikir û min divîya zû ji were derbikevim. Lewra pitir ji carekê ji were revîm. ...Piştî du salan ji manê, ji mala êtîman bi yekcarî revîm, weku her car min qesta mekanê bûna xwe dikir ku bêhna dayîka min jê dihat, henaseyeka kûr û bêhneka fireh dida min. Gehnom...” (Mihemed, 2022: 112-113).

Xirvebûna jimareyeka mezin ya kesan li mekanekî dibe egerê hebûna rûdaneka mezin bo vî mekanî, anku ji encama xirvebûna gelek kesan li mekanekî yan çend mekanan, ev çende dê bibe amajeyek bo hebûna kiryarekê yan jî rûdaneka giring û mezin. Di nav arasteya vegêrana vê romanê da, nivîskar amajeyê dide rûdana kombûna xirvebûna xelkî li demê êvarîya roja Newrozê. Xelk li ser cadeyan û li ser banên malan û li ser gir û çîyan xirve bûn ji bo saxkirina roja newrozê û van kesan agir û çira û çemalik hilkirbûn. Eger em temaşeyî çawanîya binemekanbûna vê rûdanê bikin, dê bibînin ku komeka rêgezên hunerîyên romanê beşdarî di bercestekirina vê rûdanê da kirîye, weku mekan mebest jê seryan, cade, gir û çîya. Dem ku demê êvarî ye û jimareyeka mezin ya xelkê ye û li vêrê rûdan weku rêgezeke

zal xwe di navê van rêgezan da bijare dike ku mebest jê rûdana saxkirina roja Newrozê û sersala kurdî ye:

“Wê êvarê xelk hemû pêkve daçiryanê ser cade û serbanan, ser çîya û giran. Her der tijî mirov bibûn, bizotên agirî û çirak û fanos li hemû mekanaan danabûn. Her der ron dibû, teqteqa devên tivengan bû, yarîyên agirî bilind dibûn û çirîsk belav dibûn.” (Mihemed, 2022: 128).

Di nav romanê da gelek caran hindêk rûdan ji nişkekî ve rûdidin, anku kesayetîyên romanê, çaverêyê wê rûdanê nakin belku di arasteya vegêranê da tîr pêş û dîsa hindêk rûdanên taybet rûdidin. Di vê romanê da mekaneke heye bi navê Qere Xanim her li taxa Gehnomê ku gelek kes li vê kolanê amade dibûn bi mebesta temaşekirina kişî taxî. Kesayetîya sereke ya vê romanê Hoşzan şevêkê di nav wê kolanê da derbaz bû, kesayetîyeka lawekî di nav vê romanê da bi navê Kurdê, ku kişî gelek ciwan e. Dema hîna zarok tûşî nexweşîyêkê bibû, anku şêr bibû. Li vê demê Kurdê xwe havêrê pêşîya Hoşzanî wî jî Kurdê hembêz kir û kiryarê sêksî li gel kir. Ji vê rûdanê dîyar dibe ku Hoşzan çaverêyê wê rûdanê nebû, belku demê ew di nav vî mekanî da derbaz bûyî Kurdê ji nişkekî vex we havêrê ber singî û wî jî bi delîvê zanî û hezên xwe yêr sêksî li gel kirin:

“Ez wê gavê derbazî wê kolana zirav û dirêj dibûm, ya bi navê Qere xanim dihat naskirin. Kolaneka teng bû, min ew kolane hêdî hêdî dibirî û baranê jî gelek lez li barîrê dikir... Li ber wê ronahîya tijî romantîk pêyên wê yêr sîs pitir dîyar dibûn. Baranê pêjîna wê nixavt bû. Ji nişkekê vex we havêrê pêşîya min û singê xwe rûs kir. Memikên xwe yêr biçûk yêr bi bêgunehîyê barkirî, rîştîne ber singê min. Xorsik bûne tepên agirî û bi valehîyê ve peqîn. Tezînekê kêşî vî cane mirar û qeme kete di naxa birîrê da. Ew Kurdê bû. Hêştî zarok tûşî elemekê yan kêmkî heyvê bibû” (Mihemed, 2022: 157-158).

2.3. Mekan û Dema Romanê

Ew peywendîyên di nav pêkhatiya hunerî ya romanê da dibin sedema parastina saxleta edebîyatê li nav romanê da û yek ji wan peywendîyan ew e yaku di navbera mekanê romanê û dema romanê da heye. Dîsa lêgerîn li ramana demî nayê kirin, bi tenê bi rêka lêgeryanê di nav jîyana mirovî da û bi rêka şarezayên ezmûna jîyana xwe hest pê dike (el-Herbî û 'Ubeyd, 2019: 222). Anku, em dikarin bi rêka kar û helwestên serederîkirina mirovan di nav jîyanê da hest bi ramana demî bikin. Têgeha demî weku zaravêk zimanî pêk hatîye. Ji navekî bo hindêk yan gelek demî û koma vî zaravî pêkhatîye ji serdeman yan deman (Abadî, 1952: 233). Belê wateya

demî di nav metna edebî da cuda ye ji têgeha ferhengîyê demî. Dem di nav romanê da weku rêgezeke hunerî ji wê valahîya destnîşanker ya ku kontrolê li ser bizava kesayetîyên romanê dike pêk hatîye û çarçoveyê demî di nav romanê da ji bo behsa rûdanan dike li pey demekî ku nivîskar wî demî destnîşan dike (el-Cibûrî, 2016: 36). Demê romanê li gor hizir û pêdivîyatîya nivîskarê romanê tê destnîşankirin, anku nivîskar dê biryarê bide kanê dema rûdanên romanê dê çend yê kurt yan dirêj be.

Edeb weku têgehek ji hunerên ciwan tê hijmartin weku yek ji giringtirîn janrên hunerîyên ku peywendî bi jîyana mirovî ve heye û hebûna xwe di nav derûnê mirovî da berceste dike. Anku huner sînorê derûnê mirovî dibire û xwe di nav da berceste dike, yek ji giringtirîn janrên edebî yên bi demî ve tû nivîsîn roman e û dem dibe bibireya romanê, û hemî pirtên wê pêkve girê didin (Moqerî, 2017: 13). Roman weku hunerê afirandina edebî gelek bi demî ve girêdaye û dem dibe saxletek hunerî li ser romanê ji pêxemet yekgirtina hemî rêgezên di yên hunerî yên romanê. Nivîskar Jann Richardo li ser dema vegêranê xuya dike ku cudahî heye di navbera dema vegêrana romanê û dema çîrok yan babetê romanê da (Yeqtîn, 1997: 68). Anku dema vegêranê, mebest jê ew dem e yê ku nivîskar dest bi nivîsîna romanê dike û demê babet yan çîrokê mebest jê ew dem e yê ku çîrok ji nav hatîye wergirtin yan behs jê hatî kirin. Bi dîtina nivîskar Moyerî, cîhana aşopî ya romanê, xwe di nav demî da berceste dike û nivîskar cîhana xwe ya romanê di nav da ava dike û rûdanên vê romanê di çarçoveyê demî da ava dike ('Ebiddulhûseyîn, 2017: 8).

Ji vê çendê xuya dibe ku babetê aşopa romanê xwe di nav hembêza demekê da berceste kirîye. Anku sererayî hindê ku babetê romanê ji aşopa nivîskarî hatîye wergirtin, vê carê pêdivî ye rûdanên vê romanê li gor demekî hatibin afirandin. Dem di nav metna edebî da bi giştî û di nav romanê bi taybetî li sere van her du cureyan parve dibe. Yek, dema xwezayî ye. Yanî ew dem e yê ku di saxleta xwe da her dem ber bi pêş ve diçe û çî caran berev paş ve nazivire. Du, dema derûnî ye û ev dem e yê taybet e bi hizir û wijdana her kesekî ve û ev cureyê demî bi rêka saetê nayê pîvan (el-'Emrî û Sehnîn, 2015: 12). Li dûv vê çendê xuya dibe ku bi awayekê giştî dema xwezayî dema çû êdî venagere û dema taybeta derûnî her kesek beşdarîyê di pêkanîna dema romanê da dike. Dem û mekan di nav gotara romanê da giringîyeka mezin ji bo hevgirtina rêgezên romanê heye û bercestekirina dem û mekanan di nav

romanê da bi rêya vegêranê tê kirin û bi vê çendê nivîskar dikare mijara romanê li pey dem û mekanên destnîşankirî ji bo xwendevanî pêşkêş bike (Hefîdî, 2010: 10). Anku dem û mekan di nav pêkhatiya romanê da, her yek ji wan temamkerê yê din e û her du pêkve dibin alîkar ji bo pêşkêşkirina rûdanên xwedan rehendên aşkerayên demî û mekanî di nav romanê da. Nivîskar Gerard Birns wiha xelet e. Divê navê wî rast orîjînal binivîsî bi vî rengî pênasêya dema romanê dike ew dem e yan demên biçûk in yên ku helwest û rûdan di nav romanê da rûdidin û ew dem e yê ku vedikêşt ji bo nîşandana wan helwest û rûdanan e di nav romanê da (Birnis, 2003, 201). Mebest jê ew dem e yê ku nivîskar dest bi babetê romanê dike û vedigêre dîsa ew dem e yê ku babetê romanê ji nav hatîye wergirtin. Ji alîyekî din ve, nivîskarên romanê her zû hest bi giringîya demî kirîye weku rêgezeke hunerî di nav romanê de, vê carê hewldane vê demê di nav metnên romanên xwe da destnîşan bikin û rêyên hemcure bi kar biînin ji bo pêşkêşkirina demî di nav romanê da. Hindek nivîskaran demekê bilind bi kar anîye ku herdem ber bi pêş ve diçe û hindek nivîskaran jî her du teknîkên paşvezivîrîn (*analeis*) û pêşdaçûn, (*prolepsis*) bi kar anîne (el-Cerif, 2012: 1014). Anku nivîskarên romanê gelek teknîka bi kar anîne ji bo çawanîya bercestekirina demî di nav romanê da. Belê, sererayê vê yekê têgeha demî di nav romanê da weku yek ji wan têgehan e ku wateyeka aşkera û çarçoveyekê dîyar kirî nîne ji ber ku dem xwedan formekê derûnî ye û ne madî ye û ew deme ye ku rûdan di nav da tên rûdan û pêşkêş kirin di nav romanê de (Kuyr û Derdax, 2017: 58). Her wisa gelek nivîskar û rexnegir ji wî rehendî ve temaşeyî romanê dikin her weku romanê pêkhatîye ji wî hunerî yê ku bi rêka demî tê afirandin (Qesrawî, 2004: 56). Anku dem dibe saxletek here giring û sereke di nav romanê da û roman bêyî dem nikare hebûna xwe pêşkêş bike.

Li dawîya vê beşê û ji encama nîşandana babetî ji bo xuya dibe ku peywendîyeka yekcar mezin di navbera mekanî û demî da heye, ne tine eve belku herdu dem û mekan weku cêmkêkê hebûna xwe di nav romanê da berceste dikin û mekan dibe ew valahîye ya ku kesayetîyek rola xwe li ser bigêre û bibe sedema çêbûna rûdanan û rûdan jî pêdivîyatî bi çarçovekê demî heye ta bikare hebûna xwe di nav pêkhatiya romanê da rabigehîne.

2.3.1. Peywendîya Mekanî bi Demê Romana *Sotîngeh* ve

Nivîskar di saloxdanekê da bo bajarî, anku ew mekanê bûye riwangeh bû peydabûna piranîya rûdanên vê romanê. Bi rêka demî bi rêka demî saloxdana xwe li ser hemî pêkhateya mekanî anku bajarî berceste dike. Ev sal e anku behsê niho yê babetê sereke yê romanê dike û dîyardeya hatina befreaka zor li ser bajarî dike di nav pêkhateya mekanî da. Li vêrê nivîskarê romanê şîyaye bi rêka bercestekirina demê niha yê babetê romanê ev sal e peywendîyeka rasterast di navbera dema niha yê romanê û mekanê rûdanên romanê da çêdibe:

“Befirê xwe bi ser rûkên bajarî û daran da dadaye û hemî rê û rêbaz vegirtîne, ev sal e befirê jî eşqa har xwe bi ser bajarî da girtîye û kela xwe darêtîye, jî ber ku eve çendîn sal e ya zîz” (Mihemed, 2005: 9).

Dema lehengê romanê Sîyabend hatî zindankirin û piştî çend roj bi ser dema zindankirina wî da derbaz bûn. Vegêrê romanê amajeyê dide wan guherînan yên ku bi ser vî kesî da di nav zindanê da gatîn, anku bi rêka bercestekirina peywendîya demî ji roja yekê û mekanê ku jûra zindanê ye, amajeyê dide çendîn guherînan ku bi ser leşê Sîyabendî da hatîn. Li vêrê dem bo rehendek jî bo derbirîna delaleta wê nexweşî û azarên Sîyabendî di nav zindanê da dîtîn ku pora sere wî gelek dirêj bûye û keveşk ketîye serî û çavên wî di serî da zîq bûne û difna wî jî zirav bûye. Ji vê çendê xuya dibe ku demê roja yekê Sîyabend hatîye zindanê pora wî ne ya dirêj bû, herwisa difna wî jî ne ya zirav bû:

“Hestpêkir muyên pirça sere wî bihostekê ji wê roja êkê li vêderê bûye mêhvan dirêjtir û hilû bûn, her weku di nav mekanên guherîna rûnî da kar kirî. Keveşkê zîq xwe di nav da komvekirîye û her careka destê xwe pêda dihînit, li ser mila keveşik xalên spî dihêlit. Çav yên di serî da zîq bûn û difneka zirav li hember wan bûye stûn.” (Mihemed, 2005: 15-16).

Li mekanekî dî jî vê romanê lehengê romanê Sîyabend di monologê da li gel xwe paşvezivîrînekê li bîrhatinên xwe didet û amajeyê dide wê demî, dema ku hîna zarok li xwendingeha seretay. Li vêrê peywendî di navbera dema bîrhatinan û mekanê bîrhatinan da heye. Sîyabend li wî demê hîna zarok li xwendingeha seretay, rojekê mamostaya wî bi navê Leyla pirsyarek jê kir û wî bersiv nezanê bû, vê carê mamostaya wî ew quta û siza da. Li vêrê amaje hatîye dan bo wî demê kevn û

mekanê kevn yê bîrhatinan di dem û mekanê niho da ku li vî mekanê zindanê jî gelek nexweşî birîne û qutan xwarîye:

“Hindî min li bîr e, tinê carekê li xwendingeha seretayî qutaneka giran min dîtîye. Ew jî dema mamosta Leyla Ezîz Xakî rakirî me ser textereşî û hindek pirsyar ji min kirin û bersivên çî ji wan li cem min nebûn ... wê rojê bi tundî ji layê mamosta leylayê ve hatin siza dan” (Mihemed, 2005: 32-33).

Nivîskar di vegêrana rûdana kesayetîyeka lawekî ya vê romanê da bi navê Xalid amajê bi rêka paşvezivirînekê bo dema borî ji babetê romanê dide dem û mekanekî, anku vegêrana du deman di nav qalibê tek demî da ye. Ew jî *rojeka dî* û *êvareka direng* bû, anku roja dî her demê borî ye û di vê rojê da jî li dema êvarî û mekan jî li ser Pirê ye. Ev kesayetîya lawekî bi navê Xalid bi destên rejîma Beasê hatibû girtin, êşandin û mîna kesekî şet lê hatibû ji qehrên xêzana xwe da, her gav yê mest û serxweş bû. Li vêrê behsê yek ji wan deman dike, demê Xalid yê mest û li ser pirê box we diaxivt û amahe dida hindê ku hikumeta Beasê bi bêgunehî babe wî sêdare dayî:

“Rojê dî jî, êvareka direng bû, li gel betilê xwe yê wêskî yê li ser pirê rawesta bû. Di navberekê ra destê xwe li betlî da û daquta gelalîşka xwe.” (Mihemed, 2005: 36).

Ew avahîya mezin yê zindan di nav da heye, gelekê nexweş bû. Zindanî di nav da bêzar bibûn ji jîyana xwe û dem di nav da hêdî diçû. Nivîskarê romanê, di dîmenekê da ku amajeyê dide demê êvarî yan jî demê rojavabûna rojê li hindav wî avahîya zindan di nav da heye ku rasterast amaje da ye demê rojavabûnê anku berî hatina şevê ku li vêrê peywendîyeka rasterast di navbera vî demê rojava dibe û wî mekanî da heye, anku zindanê da ji arasteya vê peywendîya vê demê bi wî mekanî ve heye xuya dibe ku nivîskarî divêt amajeyê bide bidawîhatina rojeka dî ya pirî nexweş di nav zindanê da û bi destpêkirina şeveka dî ya pirî nexweşî û azar:

“Roj ji bilindahîya xwe hatibû xwarê û davên xwe şûrtir kirbûn, tilfîyê wê xûnelo bobû, li pişt wan dîwarên bilind û asê û dergehên pûlay, di kelha mirinê ve, di jûrên teng û şehgirtî da û mirovên ji her tiştekî wêran bi tenê bawerî nebit, dijiyan.” (Mihemed, 2005: 68).

Li mekanekî dî ji vê romanê, dem û mekan pêkve bûne rehendek û amaje daye rûdaneka diltezîn ku bi sere du afretan di nav vê romanê da hatîye. Vegêr saloxeta berî vê rojê û li mala Xalidî serbazên hikûmeta Beasê çûne di nav malê da û Xalid nehiş kir û dayîka wî û xûşka wî ji nav malê bi zorî desteser kirin û birin û roja

paştir li ber çîyayê li nêzîk bajarî termên herduyan hatin dîtin. Li vêrê ew peywendîya rasterast ya di navbera demî roja paştir li ber çîyayî anku mekanê her du jin bi kuştî hatîne dîtin:

“...Wê gave Xalid li ser şemilkê bû û nivêj dikir. Li gel dengê qêjîya deykê û xûşkê wî silava mila veda. Nîal kire pêyê xwe û ji derazînkê jûrê derbaz bû, yekê quntaxa mîrata tivengê li şelka serê wî da û bêhiş kir. Her du jinên male bi xurtî kirine di tirombêlê da û bi lez çû. Roja paştir jî, li kêleka çîyayê sîberê li bajarî dike, termên wan hatin dîtin” (Mihemed, 2005: 69).

Ji encama peywendîya demê bi mekanî ve heye, derbirîn ji rûdana tirisê li cem kesayetîya sereke ya vê romanê Sîyabendî hatîye kirin. Ji arasteya vegêrana vê romanê amaje hatîye kirin ku li demê êvarê kolan hatibûn valakirin ji mirovan û dem berev şevê ve diçû. Sîyabend di nav kolanên bajarî da diçû bo dîtina dilbera xwe Nêrgîzê û birêve tirs di nav dilê wî da hebû. Anku ji encama hatina demê êvarî li ser kolanên bajarî û valabûna van kolanên ji mirovan tirs li cem Sîyabendî peyda bûye:

“Li wê êvara direnga kolan vala kirin û hêdî hêdî gewratîyê hemî dir girtin, roj dihêla asoyî da hat daûran û heta berzebûyî... wê êvarê, pêngav bi tirs û bi şerim dihavêtin. Recfekê dilê min girtbû û sed awaz digotin...” (Mihemed, 2005: 76).

2.3.2. Peywendîya Mekanî bi Demê Romana *Gehnomê re*

Kesayetîya sereke ya vê romanê û di arasteya vegêrana babetê romanê da amajeyê dide demekî nedîyar ku di nav vê romanê da karekî dike. Şev ji nîvê diqulipit anku dem bi temamî ne yê dîyar e. Belku çarçovê giştîyê demê şevê ye ku ji nîva şevê û pêda û bi wî karî radibe û do nav rehendên vê demê da. Mekan yê aşkera ye, ew jî ber xebenga çayxaneyê Çîroyî ye. Di nav vê demê da Hoşzan diçe ber xebenga çayxaneyê û li were bêhn dike tovçayê û di nav çaydankên çayxaneyê da xweşîyê box we jê çêdike. Ji arasteya vê demê -nîva şevê û pêda- di peywendîyê da ye li gel mekanî -çayxane- xuya dibe ku barê hejarîyê yê Hoşzanî gelek nexweş e:

“Piştî dergehê çayxaneyê tê girtin û şev ji nîvê diqulipît, caran diçime ber xebenga çayxaneyê û bêhna çayê û çaydankan heldikêşim. Tîjî sîhên xwe bêhna tovçayê dikim. Wê kêlikê Shest bi şahatîyê dikim...” (Mihemed, 2022: 24).

Li mekanekî ji vê romanê behsê demekê dîyarkirî û mekanekî destnîşankirî hatîye kirin. Romannivîs wisa xuya dike ku sê danên rojê anku herroj -spêdeyê, nîvro û êvarî- xelk diçe çayxaneyê Çîroy û di nav çayxaneyê da jî li ser kerawîtan

rûdiniştin xwarê û ew qumaşê li ser kerawîta heye Çîroy ji kelepîrê serhildana 1991ê îname. Ev dem û mekan e amajeyê didin hindê ku xelk rojane û jimareyeka baş diçin çayxaneyê Çîroy:

“Sê danên rojê dadçiryanê ser kerawîten çayxanê yê bi perukekê xakî dapoşin. Behsek hebû ev peruke xakî li serhildana biharê ji serbazekê weku porê Çîroy bi destxwe ve îname.” (Mihemed, 2022: 36).

Di vegêrana romanê da xuya dibe ku li dem û mekanekî dîyarkirî anku dem û mekan pêkve ektivîya xwe werdigirin û pêkve amajeyê didin babetekî. Dem li êvara dereng û mekan jî Meydana Şoreşê. Li vêrê kesayetîya lawekî Mam Çîro li êvarîyên direng û piştî xebengên çayxaneyê diîne xwar li beramber avahîya çayxaneyê xwe raweste û temaşeyî navûnîşanê li ser çayxaneyê xwe bike ku navê hevîna wî li ser bû:

“Li êvarîyên direng demê xebengên çayxaneyê dihatine xwar, Mam Çîro da çite Meydana Şoreşê û li beramber vê peyvê rawestit û hîzr di guherîna dîzayna wê da dikir. Digot: divêt navê Roselînê bi tîpên zêrî bîn nivîsîn.” (Mihemed, 2022: 37).

Li mekanekî dî ji vê romanê, vegêr amajeyê dide demekê nedîyar û dîsa mekanekî nedîyar. Şevêkê dîyar nekirîye kanê çî şev e yan jî dikeve kîjan rêketê û di cadeyekê da diçûm anku navê cadekê ye û dîyar nîne kanê dikeve kîrê. Kesayetîya sereke ya vê romanê Hoşzan şevêkê rêka lêgeryana xwe bo lek û laylonan diguhere û diçe nav cadeyeka din û di nav setleka gilêşî da hindêk rojname û kovar dîtîn. Anku di nav vê demê da Şevêkê û li mekanekî nedîyar -cade- ew rojname û kovar dîtîn û hest kir, wî zanistekê mezin bi dest xwe ve anî:

“Şevêkê min rêya xwe guhart û di cadeyekê ra çûm, di tenekeyeka gilêşî da çêbd bitil û tîrar û amanên şkestî yê lekî min dîtîn. Li gel da komeka rojname û kovaran jî dîtîn. Min ew pêçan û dane binkefşê xwe, binkefşê min germ bû, min hest kir ku hemû zanistê vê dunyayê yê ketîye di lepên min da.” (Mihemed, 2022: 48).

Her di nav arasteya demê assayê vegêrana vê romanê da, amaje bi demê spêdeyê hatîye kirin û mekan jî ava rûbarî ye, anku ava çemê kevn, li vêrê dem û mekan aşkirine. Dem spêde zû ye û mekan jî çemê kevn e. Li vê demê û mekanî Hoşzan kesayetîya sereke ya romanê amajeyê dide hindê ku xwe di nav ava çemî da şûştî ye û ev her du rêgezên romanê dem û mekan li vêrê dibin rehendekê delalî û amajeyê didine hindê ku Hoşzan kesekî hejar e û di nav mala xwe da serşû nîne, anku gelek hejare:

“Spêdê zû min bi ava çemê kevin xwe şûşt. Li ber wê parçe xodîka tirtir min serê xwe bi tifê şekir.” (Mihemed, 2022: 103).

Di paşvezivîrînêkê da bo dema niha yê vegêrana romanê, amaje bi roja berî vegêrana Duhî vê demê niho diaxive, hatîye kirin û vegêr xuya dike ku duhî, anku rojekê berî niho, kesekî dewlemend hatibû taxa Gehnomê, ew taxe yê kesê hejar û belengaz lê dijîn. Li vêrê dem jî yê aşkera ye duhî ye. Ji arasteya peywendîya vê demê bi vî mekanî ve xuya dibe ku nivîskarî vîya ye amajeyê bide hindê ku hindê kesên dewlemend hene bi navê Hikûmetê û yasayî mafê xelkî dixon, ji ber ku ev kesên dewlemend gef li taxa Gehnomê dikirin û digotin ku ev erdê hûn li ser dijîn yê hewe nîne:

“Duhî devbeşekê têr pare, bi serekê gambol hatibû û gehnomê hemû yê tapo bike. Da bo hewe bêjim, ev erde yê bajarvanîyê ye û hûn bi zêdegavî yê li ser dijîn, hewe bi zorî ya xwe bi ser daday.” (Mihemed, 2022: 67).

2.4. Mekan û Dîyalog

Yek ji wan saxletan ên ku metna edebî ya vegêranê ji hozanê cuda dike ew e ku dîyalog binemayekê sereke ye di nav vegêranê da. Bi giştî romanê bi taybetî peywendîya rêgezê vegêranê di nav romanê da li gel rêgezên dî yê hunerî yê romanê peywendîyeka pir giring e û dibe sedem ku rehenda delaleta xuya bibe û dîyalog jî yek ji wan mîkanizman e yê ku roman piştbestinê li ser dike ji bo avakirina pêkhateya vegêranê di nav romanê da (el-Cibûrî, 2016: 40). Yek ji mercên peydabûna dîyalogê di nav her metnekê da ew e ku pêdivî ye du layen yan du kes hebin yan pitir û ev kese hevpeyvînê li gel yek bikin û axivtînê li gel yek biguherînin (Ezîz, 2012: 3). Dîyalog di arasteya bexşîna xwe da piştbestinê li ser hîlbijartîneka rast û durîsta peyv û wêne û hizirên bijare di nav peregrîfên kurt û puxt da dike û ger dîyalog ya kara be vê carê dê bikare bi rengekî baş derbirînê ji hizir û babetê romanê bike (Suleyman, 2013: 347). Anku dîyalog ji encama danûstandin û hevpeyvînê di navbera kesayetîyên romanê çêdibe û dibe sedem ev dîyalog e ya aşkera be û peyvên bijare hebin ku bibe sedem ku hizirên romanê bi sanahî bêne nîşandan. Li pey vê yekê xuya dibe ku ziman berê binyatî ye ji bo avakirina dîyalogê di navbera kesayetîyên romanê da, anku bikaranîna hemerengîya zimanî dibe saxletek di navbera dîyalogê û kesayetîyên romanê da. Her weku nivîskar, Mikhail

Bakhtin dibêje “Ziman bi tenê bi rêka diyalogê di navbera wan kesan da zindî dibe yê ku wî zimanî bi kar diînin.” (Bakhtin, 1986: 268).

Mikhail Bakhtin, (1895-1975), wekî teorîsyenekî Rûsî tê nasîn ku di sed sala 20. de bi nerînên xwe, bi taybet di babeta demcîhê (Chronotype) de şîyaye guherînan di aliyê hizra edebîyatê de durist bike. Mikhail Bakhtin têgeha *demcîhê* (Chronotype) ji zanayê fîzîkê (Albert Einstein) wergirtiye, ku bi (Space- Time) di nav fîzîkê de bi nav kiri bû (Qasimî û Sa'dî, 2018: 86). *Chronotype* weke têgeh ji du zaravan hatiye wergirtin ku yek ji wan *Chronos* bi wateya *dem* û *type* bi wateya *cih* hatiye bikaranîn. Ev yek nîşanê li ser wê çendê ku Baxtînî têgehê *demcîhê* rast e rast ji edebîyatê neînaye, belku ew ji zanîna fîzîkê wergirtiye.

Chronotype, karê wê diyarîkirina peywendîya di navbera têgehên dem û cihî de tê xuyakirin ku ew bi karê avakirina vegêranê radiibe. Bakhtin xwedî wê bawerîyê ye ku kiriyara demcîhê karê wê "peywendîya pêkguherînê ye di navbeyna dem û cihê wergirtî yê di edebîyatê da, anku ew wergirtina hunerî ye (Qasimî û Sa'dî, 2018: 86). Anku ew dema Bakhtin jê re dibêje di edebîyatê da, ew dema saykolojîya karakterên berhema edebî ye, nek dema gerdûnî ya pêkve grêdayî, ew dema armancdar û pilankirîye li dev mirovan, ev peywendî jî wê demê temam dibe, dema livîn û hereket hebe.

Manfred Jahn bi navê *Vegêrannasî; Derîyek Ji Bo Teorîya Vegêranê* pirtûkek nivîsîye. Ev pirtûk ji aliyê lêkolînvana filistînî Emanî Ebo Rehme ve hatiye wergerandin bo ser zimanê erebî. Jahn di beşeka vê pirtûkê da behsa têgeha *demcîhê* dike ku dibe beşek ji avakirina vegêranê di nava berhemên dastanî da. Manfred Jahn têgeha *demcîhê* di nav edebîyatê da weha daye xuyakirin "Edebîyat li hember hunera cihî hunera demî (temporal art) ye û weku wêne û neqşandinê ye. Her ji ber vê yekê teorîya giştî wê yekê xweya dike kartêkirina demcîhê li ser vegêrana gotinê, weku çarçoveya wê ya demê û zincîra peywendîyan giring nîne" (Menfirêd, 2011: 127).

Manfred Jahn, ji bo prywendîya tiştan a bi mekanê re dibêje ku "Di navbera wan de peywendîyeka bihêz heye; bo nimûne gula avê li pêş çavên me tişteke ji bo masîyê ye, di heman demê da ew ji bo masîyê bi xwe mekan e, anku nerîn li dûv

dîtina kesan diguhêre." Her wiha Manfred Jahn derbarê mekanê edebî da sê cure mekanan dîyar dike:

1- Fezaya Edebî (Literary Space): Ew cure mekan e ku tişt û kesayetî têda tên bicihkirin, bi taybet jî kesayetîyên berhema edebîyatê.

2- Fezaya Çîrokî (Story Space): Ew alîyê jîngehî û kartêkirina demcihê ye ji bo rûdanên çîroka dirustî.

3- Fezaya Gotarê (Discourse Space): ew alîyê jîngehî yê nihayê vegêranê ye, bi rengekê giştî ew hemî aliyê jîngehî ye yê vegêran li ser dihê avakirin (Manfred, 2011, 128-129).

Gérard Genette wekî yek ji teorîsyenên edebîyatê tê nasîn ku di navbera salên 1930-2018an de jîyaye. Ew wekî yek ji zanayên fransî ku xwedî rêgez tê hesibandin û nasîn ku bi nerîn û hizrên xwe yê edebî û zanistî şîyaye karîgerîyê li ser beşeka zêde ya cîhanê bike. Gérard Genette cudahî di navbera sê têgehên da kirîye, wekî çîrok (story), naveroka vegêranî (indication) û gotar (récit), eva dibit hember (dal)ê, anku li dev wî vegêran ew kiryar e ku berhemekê vegêrankî dirust diket.

Gérard Genette ji bo binemayên metnê komeka pirsan diazîrîne. Her yek ji wan pirsan, bersivê li ser metnê bi dest ve di îne. Û dibêje "Ji bo têgihiştina her metnekê divê em di binemayên wê metnê da bigihêjin û em mê bi rêya binemayên metnê bigihêjin rastîya babetî (Bil'abid, 2008: 51).

Ji ewan pirsên di nava têkstîde der di kevin û di bine binemayên dîyarkirina pêkhateya têkistî:

A- Pirsê cihî "Kî ve?" merem jê dîyarkirina mekaekî ye.

B- Pirsê demî "Kengî?" merem jê dîroka nivîsîna metnê ye.

C- Pirsê çawanîyê "Çawa?" merem jê dîyarkirina şêwaza hebûnê ye, anku ev hebûn çawa heye.

D- Pirs lihevguherînê "Kê?", merem jê peyamber, peyama, wergir e ku karê gihandinê û lihevguherînê radibe.

H- Pirs wezîfeyê "Dê çi lê kin?" merem jê dîyarkirina wezîfeya peyama metnê ye (Bil'abid, 2008: 51). Genette ev cure pirs ji bo binemayên metnê dîyar kirine, ku li van pirsan digere.

Bi nerîna Genette, pirs demê "Ku ve?" ye ku ew weke pirsê giring di nava metnê da tê nasîn. Ev pirs dibe tevgerê ji bo gotara maddî ku pêdivî bi dîyarkirina cihê metnê heye. Ew cihê di nav fezaya metnê da tê vegirtin, bo nimûne: navnîşan, lapera bergî, derketina hindek navbiran di metnê da, navnîşanên beşan, serebabet...hwd. Her dîsa hemî nameyên derveyî pirtûkan jî bi xwe ve digire, ji danûstandin û hevpeyvînên (rojnamevanî, radyo, televîzyonî) li gel nivîskarî, her dîsan hindekên di jî (Bil'abid, 2008: 52).

Ziman hebûn û karayîya xwe bi rêka bikaranîna werdigire û dîyalog jî yek ji wan mîkanizman e yê ku ziman di nav da dibe keresteyê sereke yê bikar anînê. Ji aliyekî din ve dîyalog weku yek ji rêgezên giring tê hijmartin di nav romanê da, dîyalog dibe sedem ku kesayetîyên romanê bi rengekî rasterast aşkera bibin. Her wisa dîyalog, hest û soz û berkarên kesayetîyan xuya dike (Muhîy, 2016: 61). Dîyalogê giringîya xwe di nav romanê da heye û helwest û berkarên derûnî yê kesayetîyan bo xwendevanî berçav dike. Ev helwest û berkarên di nav romanê da dîyar dibin ji encama firezimanîyê çêdibin û di vî bîyavî da Bakhtin xuya dike ku firezimanî dibe sedema rêkxistin û guncandina yeke yê hemerengên derbirînên zimanî di nav romanê de, anku dîyalogeka civakî ya çûnî di navbera firezimanî da di nav romanê da peyda dibe (Rehîm û Bil'uzuqî, 2021: 32 64). Dîyalog dîyardeyeka edebî ye hemî warên jîyana mirovan bi xwe ve digire ji ber ku pêkhatîye ji wê gotin û axivtinê ya ku di navbera xelkî da tê kirin û kesek yan du kes yan jî pitir beşdarîyê di nav da dikin û hizir û boçûn û hestên xwe di nav da pêşkeş dikin ('Ezîzî, 2016: 12). Her weku bibêjin dîyalog dibe yek ji rêgezên vegêranê û dîsa dibe wêneyê ku bi axivtinê tê nîgerkirin û nivîskar bi rêka dîyalogê rêgezên hunerî yê dem, mekan û kesayetî aşkera dike (el-Cibûrî, 2016: 41). Belê li vêrê pêdivî ye amajeyê bi vê yekê bidin ku ew kesayetîyên bi rêka dîyalogê danûstandinê dikin, hizirên xwe li ser babetên ji hev cuda derdibirin (Zawî, 2015: 25). Anku dîyalog dibe alavek ji bo

pêkguherîna hizir û bîran di navbera kesayetîyan da. Dîyalog di nav romanê da gelek erik hene û ji ber ku dîyalog dibe yekem alav di dest kesayetîyan da ta derbirînê ji hizir û boçûnên xwe bike vê carê dîyalog li vêrê dibe xeleeke ji bo bi hev ra girêdana hemî ast û rêgezên vegêranê di nav romanê da ('Ezîzî, 2016: 4). Dîyalog di nav romanê da bi awayekê giştî bi du şeweyan xwe pêşkeş dike. *Dîyaloga Derekî* û *Dîyaloga Navekî*, dîsa dibe dîyalog di navbera kesayetîyên romanê da bîn pêşkêşkirin (Nayif, 2022: 591). Anku di nav dîyaloga kesayetîyên romanê da, durist e kesayetî bi şewazê zimanê kolankî û edebî baxive ku bi dîtina me li vêrê zêdetir azadîya derbirînê bo kesayetîyên romanê berhev dibe. Ji alîyekî din giringîya dîyalogê di nav romanê da hinge xuya dibe, dema ku dîyalog dibe harîkarek bo avakirina rûdanên romanê û dibe beşek ji rûdanê, her wisa li vêrê dîyalog dibe rehendek bo aşkerakirina demî û mekanî, ji ber ku dem û mekan dibin sedemên pêşveçûna romanê ('Ezîzî, 2016: 5). Her wisa peywendîya di navbera mekanî û dîyalogê da bi peywendîyeka aşkera tê zanîn û ev peywendî ye di nav çendîn forman da berceste dibe û dîyarkirina ew mekanê dîyalog li ser hatîkirin yek ji giringtirîn forman e (el-Cibûrî, 2016: 41).

Li dûmahîya vê beşê û ji encama vê nîşandana borî bo babetî xuya dibe ku dîyalog rêgezeke giring e di nav pêkhateya hunerî ya romanê da û dibe sedema peydakirina danûstandin û pêkguherandina hizir û bîran di navbera kesayetîyên romanê da. Nivîskarê romanê dikare bi rêka dîyalogê çendîn babetan li ser zarê kesayetîyên romanê pêşkeş bike û peywendîyeka rast e rast di navbera mekanê romanê û dîyalogê da heye. Mekan ew valahî yan bîyave ye ku tevaya rêgezên hunerîyên romanê rola xwe li ser digêrin. Kesayetî bêtî mekan nikare karîya xwe werbigire û dîyalog li ser zarê kesan tê kirin. Anku li pey vê yekê dîyalog jî hebûna xwe li ser mekanê romanê berceste dike, ji ber ku kesayetî li ser mekanî tên danan û dîyalog jî li ser zarê kesan tê arastekirin.

2.4.1. Peywendîya Mekanî bi Dîyaloga Romana Sotîngehê re

Di nav arasteya vegêrana vê romanê da, dîyalogek di navbera lehengê romanê Sîyabendî û dilbera wî Nêrgizê da xuya dibe, piştî ku Sîyabend diçe ber dîwarê mala wan Nêrgiz jî di nav hewşa mala xwe da tê ber dîwarê, anku Sîyabend li alîyê ji derve yê dîwarê hewşa mala Nêrgizê ye û Nêrgiz li alîyê ji nav da ye û di ser dîwarê ra

dîyalogekê li gel yek dikin û radeya mezin ya hezkirina û evîna xwe bo yekdu derdibirin. Ji arasteya vê dîyalogê di navbera wan da xuya dibe ku peywendîyeka rasterast di navbera vî mekanî ber dîwarî da û hewşa mala Nêrgîzê û wê dîyalogê da heye ya ku di navbera wan da rû dide:

“Şevan li ser dîwarê hewşa mala wan bûn, ez li vî alîyê dîwarî û ew li alîyê dî, em pitir nêzîkî hevdu dikirin. Bi zîmanekê şîrî û şîrîn dipeyvî û di bîrdanka min da ya tomar kirîye dema digote min:

- Sîyabend tu dizanî bi peyvên xwe yê cadoy min dîn dikî?
- Kîçê te ez gelek yê guhartîm, mane tu dizanî ez çend şermîn bûm. Tu serhatîya destpêkirina evîna min û xwe dizanî. Lê...
- Lê çi? Bêdeng be!
- Heyva he ya li hindav sere min û xwe dibînî? Tu jê ciwantirî” (Mihemed, 2005: 20-21).

Lehengê romanê Sîyabend bi destên polîsên rejîma Beasê hatîye girtin û di zindanê da ye û Sîyabend di nav jûra zindanê da ye û ji nişkekê ve dergehê zindanê yan jûra ew di nav da zindankirî ve dibe û polîsek tê dîyalogê li gel dike û tirs dikeve di nav naxê Sîyabendî da. Polîs bi gotinên ne ciwan û pîs hevpeyvînê li gel Sîyabendî dike û daxwazê jê dike ku avl bidetê. Ev dîyaloga li vî mekanî peyda bûy, anku jûra zindana Sîyabend di nav da polîsî û Sîyabendî peywendîyeka rasterast bi vî mekanî heye, ji ber ku ji arasteya bersiv û pirsyarên polîsî li gel Sîyabendî xuya dibe ku hemî peyv nexweş in û wateya zordarî û bindestîyê digehînin:

“Dergeh vebû. Pêlava qeytana sê rêzî kete hember çavên wî. Jêhel li bejna polîsî meyze kir... Hîvî û daxwaz di gelalîşkê ra bûne stîrî û wijdan di dilî da bi ezmanê xwe lê xurî.

Hilo kurê sey zadî bixwe.

Pîçek avê bide min.

Qudîka teqîn di bin da, lêvên wê, tevpîrkê tevnê xwe sê rêzî pê ve raçandî, li hember çavên wî dana...

Dizanim ya Seyan e, lê vexwe, çunkî Se ji hewe paqijtîr in.” (Mihemed, 2005: 31-32).

Li mekanekî dî di nav vê romanê da nivîskarî amaje daye dîyalogekê di navbera Sîyabendî û mamostay Leylayê ku paşvezivînek e li bîrhatinên Sîyabendî, dema hîna zarok li xwendîngeha seretayî û rojekê mamosta leylayê pirsyarekê ji Sîyabendî dike. Belê bersivê nizane, vê carê mamostaya wî jê tore dibe û sîza dide. Li vîrê jî peywendîya di navbera vê dîyalogê û di navbera Sîyabendî û mamosta Leylayê da heye bi vî mekanî ve heye. Anku xwendîngehê ji ber ku pirsyar û

bersivdan ji qutabîyan li xwendingehê tê kirin û dîsa sizadana mamosta Leylayê jî bo xwendekaran her di çarçoveyê wî mekanî da hatîye kirin ku xwendingeh e:

“Hindî min li bîr e, bi tinê carekê li xwendingeha seretayî qutaneke giran min dîtîye. Ew jî demê mamosta Leyla Ezîz Xakî rakirîm ser textereşî û hindek pirsyar ji min kirin...
... ji layê mamosta Leylayê ve hatim sizadan. Dareke hilû îna û got:
- Destên xwe veke... heye bê mejî, êk heye nizanî li zivistanê çi fêqî û keskatî heye!” (Mihemed, 2005: 32-33).

Dîyalog di nav jûra eşkencedanê di navbera Sîyabendî û polîsekî da hatîye kirin, piştî ku Sîyabend ji layê rejîma Beasê hatîye girtin û zindankirin bo demekê dirêjmeye di nav zindanê da û rojekê hate veguhastin bo jûra eşkencedanê. Di nav vê jûrê da çendîn cureyên êşan û nexweşîyan dane ber Sîyabendî û bi hemi şeweyan givaştinên derûnî diêxistine ser Sîyabendî ji pêxemet hindê ku danpêdanê bi tawaneke bikit ku wî nekirîye. Li vêrê peywendîyeka rasterast di navbera vê dîyalogê û mekanê dîyalogê lê hatî kirin heye, ji ber ku ji arasteya wateya vê dîyalogê dîyar dibe ku ew cure peyv û riste di nav vî mekanî da, anku jûrên eşkencedanê ten derbirîn:

“Sîyabend weku depekê li ser kursîkê rûniştî ye û bi kursîkê ve hişk girêdane, wî gelek pirsyar jê kirin. Piştî li pişt mêzê rûniştî, got:

- Te çi got? Min desthilat ya heye te bihinêrim mal û bi dîtina xêzana xwe şad bibî.
- Gewrem, min tiştek nine bot e bêjim, tinê ez mijûlî xwendina xwe me û ev tiştê hûn ji min daxwaz dîkin, min çi pêzanîn li ser nînin!
- Sîyabend, min tore neke û rastîyê bêje?
- Eve rastîyê bo te dibêjim!” (Mihemed, 2005: 42-43).

Dîyalog di navbera gundîyan da rûdide, dema ku lehengê romanê Sîyabend paşvezivîrnekê li bîrhatinên xwe dide, dema ku hîna zarok û li gel hevalê xwe yê zarokînyê bi navê Seo şevêkê hindek kesan hewl dan mirîşkên gundî bidizin û li gel vê çendê seyên gundî pêhesyan û dengê seyan bilind bû. Li vêrê gundî ji xew rabûn û li vî dengî derketin û demê hemi li kolana gundî xirvebûn, ev dîyaloge hat kirin:

“Stêra zîq kir. Li danga gundî send kesan bizava dizya kulkê mirîşka kir. Li gel rewîna sa, gundî bi fanos ve derketin kolanê û semta dengê sa nêrîn.

- Ew çi bû?
- Dîyar e dizîker bûn, kurê Muradî bi hevalên xwe ve li pey çû.
- Muradê Gundî?
- Seoyê Se.” (Mihemed, 2005: 216).

Piştî ku bo dema çar salan Sîyabend hatî zindankirin, piştî hînge lêbûrîneka giştî ji wî û komeka zindaniyên di girtin, ev car hemî zindani di nav holekê da komkirin ji bo hindê ta ku bêne berdan û di nav vê hole da diyalogek di navbera van zindaniyan da hat kirin û her yekê behsa çîroka zindankirina xwe dikir. Yek ji wan zindaniyan sera pirtûkekê hatibû zindankirin û ev diyaloge di navbera wan da bi vî rengê li xwarê bû:

“Danûstandin di navbera kesên di hole ve ya germ bû. Her yekê bi awayekê çîroka xwe bo yê beramberî xwe vedigêra.

- Min çî nexweşî negehandîne çî layenan.
- Baş e boçî vê demê hemîyê bêyî dadgeh maye di vê govê ve? Bibûre, lê ya ji min ve bi temamî eve gov e!
- Rast e gov e!
- Guneha te çî bû?
- Pirtûka Komona Parîsê bû!
- Pirtûk!
- Piştî biraderekê nêzikî min, ev pirtûke li nik min dîtî û
- Zêlamên desthilatê pê agehdar kirin. Li ser wê hatîme girtin.
- Kuştina hizrê ye.
- Dirust e, ew e ya te gotî.” (Mihemed, 2005: 292).

2.4.2. Peywendîya Mekanî bi Diyaloga Romana *Gehnomê re*

Di nav vê romanê da û bi rengekî giştî, diyalog weku rêgezeke hunerîyê romanê çî amadebûnên bihêz berceste nekirin, belku zêdetir vegêran li ser zarê kesayetîya sereke ya vê romanê hatîye arastekirin û dîsa her Hoşzan bi xwe li ser zarê hindê kesayetîyan diyalogek araste kirîye, anku hebûneka lawaza vegêrana rasterast di nav romanê da heye. Bi rengekî giştî ew peywendîyên di navbera mekanî û diyaloga romanê da berceste dibin, birîtîye ji bîranîna wî mekanî yê ku diyalog di nav da hatî kirin û behskirina wî mekanî yê ku li dema niho yê romanê diyalog li ser tê kirin û dîsa behskirina wî mekanî yê ku diyalog li dor metnên wê di navbera kesayetîyan da tê kirin. Mam Çîro xwedanê çayxaneyê û li dema Hoşzan kesayetîyeka sereke ya romanê li çayxaneya wî amade dibe, ev car Mam Çîro diyalogekê li gel çaygêr dike û wî radispêre ku çayekê bo Hoşzanî bihîne. Ew peywendîya di navbera vî mekanî Çayxaneyê û wê diyalogê da weku peywendîyeka rastexwe ye, ji ber ku ew kes e diçe çayxaneyê çayê vedixwe:

“- Çayekê bo Hoşzanî bînin.

Piştî li mekanê xwe yê her car li ber xebengê li nêzîk mêzeya jimêryariya çayxaneyê mêhvankî li erdê rûniştîm, Mam Çîro yê xwedanê çayxaneyê we got.” (Mihemed, 2022: 22).

Di nav vegêrana vê romanê da û weku bîranînek bo wê dîyalogê yak u di navbera ew kesên li çayxaneyê rûniştî û xwedanê çayxaneyê da, peywendîyek di navbera mekanî û wê dîyalogê da berceste dibe. Çîro hatibû birîndarkirin li şerekî û bi zorî gîyanê xwe ji nav şerî rizgar kirbû. Ew kesên li çayxaneyê dîyalogek arasteyî Çîro kir û digotin: Dê bêje sere birakujîyê bû? Belê, Çîro ew zarave pê nexweş bû û bi dîyalog bersiva van kesan dide. Ev cure peywendîye di navbera mekanî ku çayxaneyê û dîyalogê da dibe bîranînek bo ew mekanê dîyalog di nav da hatî kirin:

“Birîndar bûm, yan jî min xwe birîndar kir da ji vî şerî dût bikevim. Heke yekê gotîbayê eve newêrekî bû, bihaneya vê hebû... Ew ji nizane bo cara çendê bû vê bihaneyê jirûve dike.

- Dê bêje sere birakujîyê bû.
- Hest bi tehlâtîya şehre di nav gîyanê xwe yê pîs da kir û got:
- Ew zaravekê kirêt e, nehejî ye li ser mêzeyekê bi ziman bînîn.” (Mihemed, 2022: 40-41).

Li mekanekî dî ji vê romanê dîyalogek bi rengê paşvezivîrîne ji dema asayî yê romanê xuya dibe. Ev dîyalog e di navbera kesayetî ya sereke ya romanê Hoşzanî û dayîka wî da rû dide. Hoşzan li dema zarokîniyê derdikevît nav hevalê xwe, belê hevalên wî sifkatî pê dikirin, ji ber ku piştî wî ya qof bû, Hoşzan gelek tore dibû û yekser ji nav hevalên xwe direvî û qesta dayîka xwe dikir û jê dipirsî, çima piştî wî qof e? Her wisa dayîka wî jî bersiveka ciwan didayê û dilê wî aram dikir. Dîyalog bi rengê bîranîne li mekanekî hatiye kirin ku mala Hoşzanî ye:

“... bîra min tê wextê min divîya biçim nav zaroyan, hemûyan bi hêbetî li min meyrê dikir û digotin min piştqos, kulindok, piştkovik [...]

- Ew çi tepe ye bi nav milên te ve? Bîne derê da tepanê bo xwe pê bikin. Zaro hemû dikenîn, min sere xwe şor dikir û ji kenîya wan dût diketim. bi derûnekê şkestî qesta dayîka xwe dikir û min xwe di nav dehmena wê rapêça. Wê dizanî çi rûday, lê min fam nedikir ku ew dizane.
- Dadê, kê ev kulindek bo min çêkire? Boçî piştî min qos bûye?
- Beramber pîrsa min ya tijî hêbetî, tijî çavên dayîka min rondik dibûn...
- Kurê min tu ji vê dunyayê hemî yê ciwantirî. Xwedê tu ji her tiştêkî û mirovekî ciwantir çêkirî.” (Mihemed, 2022: 118-119).

3. CUREYÊN MEKANÎ DI ROMANÊ DA

3.1. Cureyên Mekanî

Helbet piraniya rêgez û têgehên teknîkî û hunerî yên metna edebî bi giştî û metna romanê bi taybetî li ser çendîn cureyan parve dibe. Mekan di nav metna romanê da jî li ser çendîn cureyan parve dibe. Berî em derbazî nav rehendên vî babetî bibin, em dixwazin amajeyê bi vê yekê bidin ku fireboçûnî li ser cureyên mekanî di nav metna romanê da heye. Anku her nivîskarek behsa çend cureyên mekanî kirîye. Ew tiştê bala me ji bo vî babetî radikêşe, eve ye ku her nivîskarek ji arasteyê berjewenda lêkolîna xwe, çend cure bo mekanî di nav romanê da dîyar kirine. Bi vê yekê jî van nivîskar û lêkolanan çarçoveyê giştî yê lêkolîna xwe parastîne. Ji pêxemet pîtir rohnîkirina cureyên mekanî di nav metna romanê da, ev yeka li xwarê nîşandaneke e ji bo nêrînên nivîskaran ku behsa cureyên mekanî di nav lêkolînên xwe da kirine:

a) Nivîskar Roemer Mol: Ev her du nivîskar ji wan rexnegir û nivîskarên pêşeng bûn ku behsa cureyên mekanî kirin. Ev nivîskar cureyên mekanî li ser van her çar cureyan parve dikin:

1. Mekanê Min: Yan mekanê li cem min heye. Mebest jê ew cure mekanî ye ku mirov hemî kar û kiryarên xwe di nav da dike. Anku ev cureyê mekanî dikeve jêr kontrola mirovî.

2. Mekanên Kesên Din: Yan mekanê xelkê din, ji bilî mirovî. Ev cure mekanî jî her weku cure berî nuke ye, lê di nav vî corî da mirov hest dike ku dikeve jêr kontrola hindek kesên din ('Ebidulqadir û Nasirî, 2018: 11).

3. Mekanê Giştî: Ev cure mekane ne milkê kesekî dîyar kirîye. Belku milkê dewletê yan hikumetê kontrol li ser vî mekanî heye û mirov di nav vî mekanî da ne yê azad e.

4. Mekanê Bêdawî: Bi rengê giştî ev cureyê mekanî yê vala ye ji xelkî, anku ev cure mekanî nakeve jêr kontrola çi kesan weku biyabanan. Dîsa ev cure

mekane ne milkê çî kesan e, lê şarstanî û sazîyên medenî li van cure mekanan kêmin (el-Cibûrî, 2016: 68).

b) Vladimir Propp: Vladimir Propp navê nivîskarî yê nasnameyî binivîse, ev nivîskar cureyên mekanî li sere van her sê cureyan parve dike.

1. Mekanê Resen: Mebest jê mekanê jidayîkbûna lehengî ye û mekanê xêzan lê dijî.

2. Mekanê Demkî: Mebest jê ew mekane bo demekî lê dimînî, anku helbijartineka kandîdkirîye ji bo vî curê mekanî.

3. Mekanê Navendî: Ew cure mekanî ye ku rûdanên sereke li ser rûdidin (Bî'rî).

c) Xalib Helsa: Ev nivîskar mekanî li ser sê cureyan parve dike.

1. Mekanê Xwaze: Ew cure mekanî ye ku di nav wan romanên da xuya dibe yê ku mekanî bo xwe dikene gurepana rûdanan.

2. Mekanê Endazyarî: Mebest jê ew cure mekanî ye ku bi regekî hûrbîn û temam di nav metna romanê da berceste dibe û ji riwangeya rehendên derekî ve tê têkşikandin.

3. Mekan weku ezmûneka jîyarê di nav romanê da. Ev cure dikare bîrhatinên wergirî bizivîrîne, belê gelek bi degmenî ev mekane di nav metna romanê da tê dîtin (Qewasim û Qeys, 2019: 16-17).

d) Ebdilhemîd Borayo: Ev nivîskar cureyên mekanî li pey erkê wan di nav metna romanê da dabeşî van her du cureyên xwarê dike.

1. Mekanên Vekirî: Mebest jê vekirina valahîya mekanî ye ji bo hembêzkirina gelek mirov û rûdanan.

2. Mekanên Girtî: Mebest jê ew mekanê taybet e ku cureyekê bi tinê ji peywendîyên mirovatî li nav xwe hembêz dike (Buqret Şehret û Ehlan, 2017: 12).

e) Remezan Hecî Qadir: Ev nivîskar ji bilî hindê ku amajeyê bi çendîn cureyên mekanî li cem nivîskarên Ewropî, Erebi û Kurdî, ev nivîskar e behsa cureyên mekanên hunerî û jîyarê jî dike (Qadir, 2006: 47-51).

f) Newzad Ebdila Hacî: Ev nivîskar di nameya xwe ya dîktorayê da cureyên mekanî ji alîyê beşan ve weha parve kirine.

1. Cureyên mekanî ji alîyê çavkanîyan ve.

2. Cureyên mekanî ji alîyê cografî ve.

3. Cureyên mekanî ji alîyê hunerî ve (Hacî, 2012: 51).

Piştî ku me ev nîşandana borî li ser cureyên mekanî di nav nêrînên şeş nivîskaran da, niha jî em dê behsa çendîn cureyên mekanî bikin ku bi awayekê berbelav di nav hizir û boçûnên nivîskaran da hatine behskirin. Cureyên mekanî di nav metna romanê da.

3.1.1. Mekanê Vekirî

Ew cure mekanî ye ku delîveyê li beramber kesayetîyan vedike ji pêxemet hindê ku bi aramî rola xwe di nav metna romanê da bigêrin. Vebûna mekanan alîkar e ji bo peydakirina aramî û xweşîyê li cem kesan, kesayetî di nav van mekanan da hest bi ektîvîyê dikin û pitir karlêkê li gel rêgezên din yên romanê dikin (Xerîb, 2016: 25). Li pey vê yekê xuya dibe ku mebest ji mekanên vekirî ew mekan in yên ku kesayetîyên metna romanê azadîyeka temam di nav da heye, anku kes dikare bêyî sensor rola xwe bigêr e û pitir têkelî rûdan û hemî rêgezên din di nav metna romanê da bibe (Tewam, 2016: 55). Di nav mekanên vekirî da, kesayetî dikare berev cîhana derve biçe û kiryan bike. Anku berev cîhanê û qederê û çarenivîsê xwe biçin. Ji alîyekî din ger em temaşeyî mekanên girtî bikin, dê bibînin ku pêkhatî ye ji wê valahîya mekanî ya vekirîya derveyî û çî sînorên teng nakevin ber û valahîyeka bijare bo kesayetîyan di romanê da çêdikin (Sehlî, 2020: 34). Ji vê yekê xuya dibe ku mekanên ku mekanên vekirî bi awayê rehenda derekî berceste ya xwe werdigire. Dîsa sînorên vî mekanî jî ne gelek berteng in. Bi rengê giştî em dikarin têgeha mekanê vekirî di nav metna romanê da bi vî awayî xuya bikin: Mekanên vekirî berovajî

mekanên girtî ne. Mekanên vekirî hewl didin amajeyê bidin wan guherînan yê ku di nav civakê da rûdidin û ev guherîn e ta çi rade karlêkê li gel mekanî dike ('Ubeydî, 2011: 95). Her wisa mekanê vekirî derbirîne ji wan mekanan dike yê ku ji sînorên jûrekê derbaz dibe û mekanekî berfireh e û bi rengekî giştî kes bi awayê erênî serederîyê li gel van mekanan dike (Bin Haşim, û yê din, 2017: 27). Mekanên vekirî jî di nav xwe da parveyî çendîn cureyan dibin weku bajar, gund, bîyaban, çîya, tax, cade, derya, dol, nihal, gelî.

3.1.2. Mekanê Girtî

Mekanê girtî û di nav arastekirina destnîşankirina rehendên wî da derbirîne ji wî mekanî dike yê ku rober û pêkhatiya wî hatîye destnîşankirin weku, jûrên nivistinê, qesir ('Ubeydî, 2011: 43). Anku pêkhatî ye ji wî mekanî yê ku morkeka taybet heye û ev taybetmendî ye bi rêka karlêka kesayetîyan li gel mekanî dîyar dibe (Mu'emerî, 2004: 77). Dema kesek ektivî û serederîya xwe ya taybet di nav vî mekanî da dike û reftareka taybet di nav sînorên vî mekanî da berceste dike, dibêjin vî mekanî, mekanê girtî. Mekanên girtî xwedan sînorên destnîşankirî ne û bi rêka rehendên dîyarkirî amajeyê didine nefîkirin, goşegîrî û tinêbûnê (Tewam, 2016, 57). Destnîşankirina sînorên mekanên girtî saxleteka berçav e di nav vî cure mekanî da, anku ev sînorên tî destnîşankirin dibin sedema peydakirina saxletê berdewamîdana jîyana kesî di nav van cure mekanan da û mekanê girtî, mekanê jîyana mirovî ye û mirov di nav da tê vehewandin û mirov bo demên dirêj di nav van cure mekanan da dimîne, vê carê çi mirov bi heza xwe lê bimîne yan jî bi zorî lê bimîne ('Ubeydî, 2011: 44). Ji vê çendê dîyar dibe ku jîyana kesî bo demên dirêj di nav mekanên girtî da ye û berdewamîyê bi jîyana xwe dide. Belê hindek caran mirov bi necarî dimîne di nav mekanên girtî da bo nimone weku zindanê. Mekanên girtî saxleteka taybet heye ku girêdayî jîyana mirovî ye, ji ber ku di nav hembêza van cure mekanan da dijît û hemî hûrkariyên jîyana xwe di nav da diborîne (Qewasim û Qeys, 2019: 18). Mekanên girtî jî di nav xwe da li ser çendîn cureyan parve dibe, bo nimone mal, jûr, çayxane, pirtûkxane, yarîgeh, pêşangeh, zindan, kargeh, kilînîka noşdarî.

3.1.3. Mekanê Aşna

Mebest ji vî cure mekanî ew e ku mirovî peywendîyên baş li gel hebin (Qadir, 2006: 49). Anku pêdivî ye ev peywendî ye di erênî bin. Kesayetî di nav vî cure mekanî da, hest bi aramîyê û xweşîyê dike, anku ew mekan e yê mirov di nav da aşna be û ev cure mekanî karîgerîyeka mezin li ser hest û sozên mirovî dike weku mekanê gencatîyê û her demê mirov biçe di nav vî mekanî da ji alîyê derûnî û hizrî ve aram dibe (el-Cibûrî, 2016: 71).

3.1.4. Mekanê Neaşna

Mebest jê we cure mekanî ye yê ku kes naxwaze di nav da bijît weku zindanan û mekanên dûrxistî yan jî ew mekanên metirsî di nav da li ser jîyana mirovî heyî. Mirov di navê van cure mekanan da hest bi aramîyê nake, belku pitir hest bi nexweşîyê û nearamîyê dike (el-Cibûrî, 2016: 75). Ev mekan e hestekê nearamîyê li cem kesî peyda dike û dibe mirov gelek caran bi necarî biçe di nav van mekanan da.

3.1.5. Mekanê Ketwarî

Mekanê ketwarî ew cure mekanî ye ku di nav metna romanê da berceste dibe û bi wî awayî ku di nav ketwarî da heye. Kewate ew mekan e di nav ketwarî da yê çawa ye weha di nav romanê da berceste bibe ('Ebdullah, 2018: 123).

3.1.6. Mekanê Hunerî

Mebest jê ew mekan e ku nivîskarî ji encama aşopa xwe di nav metna romanê da çêkirîye. Anku bi rêka aşopa nivîskarî tê avakirin û çêkirin, gelek caran nivîskar dikare bi rengê wisa dirust bike, ku gelek nêzîkî ketwarî be. Belku piranîya caran ji ketwarî ciwantir û balkêştir dîyar dike, yan reng e mekanê afrandî di ketwarî da nebe û çî mînakên wekhev jî bo nebin (Hacî, 2012: 54).

3.2. Cureyên Mekanî di Romana *Sotingehê* da

3.2.1. Mekanên Vekirî

Bajar

Yekem cure mekanî di vê romanê da berceste dibûyî û karîgerî li ser arasteya rûdanên romanê heye, mekanê vekirî ye û ew jî bajar e. Piraniya ew rûdan û mekanên ev romane bi xwe ve hembêz dike, di nav vî bajarî da berceste bûne. Anku bajar mekanê sereke yê li nav xwe girtina piraniya mekanên xwedan karîgerîyeka delalî di nav vê romanê da hatine weşandin. Bajar mekanê vekirîye û çî sînorên dîyarkirî bo nînin. Ev bajarê nivîskar behs dike, mekanekî ne aşna ye, anku nivîskar destnîşan nekire ku kîjan bajar in. Li gor arasteya rûdanan û babetên serekeyên xwe di navê van mekanaan da berceste kirine. Em dikarin bibêjin, dibe ku mebesta nivîskarî ji vî bajarî yek ji bajarên Herêma Kurdistanê be û ji navê van bajaran jî û li gor babet û rûdanên romanê, em texmîn dikin ku bajarê Dihokê be. Helbet mekanî pêdiviyatî bi demekî heye. Belê nivîskarî çî dem jî destnîşan nekire bo vegêrana rûdanên romanê li ser vî mekanî bajarî. Li gor pêşbînîya me bo dîyarkirina wî serdemî yê ku rûdanên vê romanê li ser hatîne rûdan û ji encamê wê delaleta ji metna romanê bo me xuya bûye, em texmîn dikin ku serdemê rûdana vê romanê bo dawîya salên 70yan û destpêka salên 80yan ji sedsala 20î vedigerin. Ew jî, ew serdeme ye dema ku rejîma Beasê ya hikûmeta Îraqê bi zorî bajar û gundên başûrê Kurdistanê dagîr kirin û hewên girtin û zindankirin û eşkenceyal lawên kurd yên bêguneh encamdayîn.

Bajar weku mekanekî vekirî yê sînor di nav vê romanê da, ew saxlete ji dest daye, anku sererayî hindê ku bajar mekanekî vekirîye. Belê, ji arasteya rûdanên romanê bo me xuya dibe ku ev bajarê mezin yê bûye Sotingeh û mina zindanekê lê hatîye û li vêrê peywendîyeka rastewexwe li gel navûnîşanê vê romanê heye ku ew jî Sotingeh e. Li vêrê Sotingeh mekan e anku mekanekî pirî nexweşî û tev azar û êş e. Bi dîtina me, mebesta nivîskarî ji navûnîşanê Sotingeh ew bajar yan mekan e yan ew zindan e ya ku li jêr dagîrkirina Beasê. Yekem mekanê vekirî yê xwedan karîgerî di nav vê romanê da hatîye bercestekirin û saloxdan bajar e. Nivîskar di nav saloxdana xwe da bo vî mekanî weha xuya dike ku berfeka zor li vî mekanî hatîye û çîyayên dormanên bajarî û nav bajarî bi xwe jî li ser cade û kolanan berfeka zor hatîye. Dibe li vêrê mebest jê hebûna zulm û sitemê li ser vî bajarî be:

“Befirê xwe bi ser rûkên bajarî û daran dadaye û hemî rê û rebar vegirtîne. Ev sal e, befirê ji eşqeka har xwe bi ser bajarî da girtîye û kela xwe dariştîye...Tayrên

tirombêlan, texên befîrê li ser cadeyê dibirîn û permîçikên wê vedijenîn.” (Mihemed, 2005: 9).

Li mekanekî dî ji vê romanê, nivîskar pitir di nav saloxdana bajarî da diçe û bi temamî rehenda dorpêçkirin û zindankirina bajarî dîyar dike ku amajeyeka rasterast dide hindê ku ev bajarê vekirî yê sînor niho yê hatîye dagîrkirin û li jêr stema dujminî da ye. Dîsa bajar hemî anku xelkê bajarî yê bêdeng e û çî bizavan anke û ev bêdengî ye ya kujek e anku hemî xelkê bajarî di bê deng in û her weku ji mirinê revîn û xwe di nav malên xwe da veşartî:

“... bajar jî di nav bêdengîyeka bitirs û befrîn da pêça.
... bêdengîyeka kujek xwe bi ser hemî alîyên jîyanê da girt bû. Kolanan bi tenê ronahî ji befîrê werdigirt. Pencereyên malan di bê çira bûn. Bêhna mirinê difin dixwarindin.” (Mihemed, 2005: 10).

Ew bajarê nivîskarî mekanekî vekirî û destpêka rûdanên vê romanê li ser avakirina bajarkekê nepêşketî ye, anku xelkê wê hîna ji alîyê hizrî ve ne pêşketî ne û saloxetên jîyana gundan li ser hemî gehên jîyana wan zal e û xewê xwe bi ser jîyana vî bajarî da dadaye. Anku ev xelke hemî ji ber zulim û zordariya dujminî bêdeng ma ye û neşên çî bizavan bikin:

“Dengê dîkîlan bilind bû, rojê şaperên xwe bi ser wî bajarê hêşt civaka wî pitir gundî dapoşîn, xewê xwe bi ser perdeya dilê wî dada û hizra wî ji wê cîhana ew kirîye maka kul û janan û janeser bo kirîye cêmik.” (Mihemed, 2005: 30-31).

Li mekanekî din nivîskarê romanê wêneyekê pirî bêdengî û bê bizav bo bajarî kêşaye û saloxdanekê didetê, her weku efrîtekê ev bajare dagîr kirî, anku ji ber zulim û zordariya rejîma Beasê ev bajar e hatîye dagîr kirin. Ne bi tenê eve belku dengûbasên girtin û kuştin û şer û nexweşîyan di nav da tîn belavkirin û ev bajar e pêdivî bi kesekî zîrek û çavnetirs heye, te ku vî bajarî ji bin destên dujminî rizgar bike:

“Bêdengîyê bajar dagîr kirîye, her weku xîfis lê hatîye kirin! Di cergê bajarî da ye û bajar bûye term. Efrîtê heftser weku di çîrokên efsaneyî da behs jê hatî kirin.” (Mihemed, 2005: 35).

Ger temaşeyî wêneyê bajarî bikin, di nav romana *Sotingeh* da weku mekanekî vekirî dê bînin ku nivîskar ev bajar e weku bajarekê dagîrkirî û zindankirî da ye nasîn û ew kesên di nav bajarî da dijîn. Her dîsa bê bizav in û nikarin çî karan bikin û ev çende amajeka rasterast ya ku redeste zordarî û stema rejîma Beasê gelek diwar û

dirinde ye. Rejîmê bajar hemî kontrol kirine û xelkê bajarî li jêr derd û jan û stemkarîyê dinalin.

Çîya

Çîya weku mekanekî vekirî biyavekê mezin bi xwe ve digire ji bo hatinûçûna kesan û çîya ew mekane yê ku sînorên wî vekirî bin. Kurdan çîya bo xwe kirineew mekane yê ku dikarin bi rêka wî berevanîyê ji xwe bikin û karîne bi rêka çîyayan xwe ji dujminî biparêzin. Di nav vê romanê da çîya hatîye wênekirin weku ew mekane yê ku şoreşgêrên kurdan xwe bi rêka wan diparast û berevanî ji xwe dikirin. Di nav vê romanê da kesayetîyeka lawekî heye bi navê Mişîr ku ew jî li gel Sîyabendî ketîye di zindanê da. Ev qaeman e li çîya tûşî sereke bibû li gel serbazên rejîma Beasê û ev birîndar bibû, hevalên wî jî neçar bûn wî bihêlin û xwe bigehînin hopîtikên bilind ên çîyayî ta jîyan xwe rizgar bikin:

“Mişîr bizotî şoreşekê bû, di şerekî giran da li gel dujiminî piştî her du pêyên xwe jîdestdayîn hatibû girtin.

...hevalên wî neçarî xwe bigehînin Gopîtikên Bilindên Çîyayê li ser wê deştê zal da ku xwe ji semta dûrbîna firokeyan dûr biêxin.” (Mihemed, 2005: 54-55).

Li mekanî din ji vê romanê, nivîskar karîye bi rêka bercestekirina çîyayî weku mekanekî vekirî, amajeyê bide wê dîyardeya rakirin û veguhastina gundên kurdan li ser çîyan bo nav bajarên ku hikûmeta Beasê ev yeke bi zorî kirîye. Di nav vê romanê da, kesayetîyeka lawekî bi navê Mam Hacî heye. Gundê wî dikeve ber hêrişa Beasê û gundê wî tev bi darûbar û bi her tişt ve tê sotin, lewra xelk neçar bû malên xwe ji binarê çîyayî veguhêzin bajarî:

“Salek ji sala, hêrişeka giran bi ser millet û welatê me da hat. Gund xirab kirin. Av pîs bûn, darûbarî xemla xwe guherî. Teyr û pezkûvî nîvek mirin û nîva din jî rateqîn. Herwisa mirov jî. Ez jî yek ji wan bûm yên ku vîya gîyanê xwe biparêzit. Lewra min jî mala xwe ji gundekî li binarê çîyayî veguhastin bajarî.” (Mihemed, 2005: 97).

Bi rengê giştî çîya weku mekanekî vekirî di nav vê romanê da bi merema wî mekanî hatîye berceste kirin yê ku dibe rehendekê aram ku lehengên kurd qest dikir, ji pêxemet rizgarkirina jîyana xwe û parastina gîyanê xwe.

Gund

Gund bîyavekê vekirîye û çî sînoren destnîşankirî nînin. Gundan mekanekî taybet di nav jîyana kurdan da heye û hêmayekê karîger e di nav hizra azad ya kurdan da. Li mekanekî ji vê romanê Gund weku mekanekî bîrhatina zarokîniyê hatiye bercestekirin. Sîyabend lehengê sereke yê vê romanê di arasteya vegêranaa bîrhatinên xwe yên zarokîniyê da, amajeyê dide hindê ku wî li gel hevalên xwe anku zarokên gundî pêkve li danga gundî yarî dikirin û ji xwe ra dileyzîn:

“Bîrdanka wî bi ba, hemî rojên zarokîniyê xwe di çavan da nîşan didin, yan jî divîya xwe ji bîr ve bike ji êş û azaran.

...
Wî, bi xurtî hevalên xwe li rojên biharî piştî baran vedikir û hewran xwe vedida û cave rojê li gerkên avê dida û sîmayekê dilveker û rohin û geş jê dipehî û serinca mirovî bi nemazeyî zarokan dikêşa. Li danga gundî li ser zûrka û kivandeyan xwe bitehsînin.” (Mihemed, 2005: 16).

Gund ew mekanê aramê vekirî yê xelik di nav da dijîyan ji hêrşên dujminî rizgar nebibûn û rejîma Beasê bi berdewamî û ji nişkekê ve, hêrîş dibirin ser gundan û xelik di nav da digirtin û azar didan. Ji vê çendê dîyar dibe ku gund bibûn mekanekî nexweş weku zindanan ji ber hêrîşên dujminî:

“...ji bextreşîya min bû wê şevê, piştî ez vegerîyame mal, çand çekdar bi nav gundî ketin û ew girtin. Piştî du heyvan hêlayn û eşkencedayn, berdan. Ez jî êk ji wan qurbanîyanim yên wî dayne girtin...” (Mihemed, 2005: 77).

Gund ji arasteya sereke ya navûnîşanê vê romanê *Sotingeh* bi başî di nav vê romanê da hatiye bercestekirin, anku gundên kurdan jî bibûn sotingeh, mekanên nexweş û pirî azar û kavlan û sotin û jinavbirin, herwisa li dema hêrîşên Beasê gundên kurdan bi hemî pêkhate ve dikirin armanc û bi xwe jin û zarok jê rizgar nedibûn û agir ji ber didan xaniyan:

“Me deng û basên talankirin û bi serdagirtina gundên deverê bihîst, çî rêk nemabûn, bi tenê cane xwe rizgar bikî û sînoran bibezînî. Dayîka me, cerkê avê ji ser mila ketbû.

... nîşana postaleka leşkerî li sîngî çap bibû û golek b enya wê ya hero bo kirina pênc nivêjan kirnoş dikir, enya wê ya her careka jê dûr ketbam, lêvên min awazek li ser dixwend û waneyek jê werdigirt, maç kiribû. Dûkêl ji xanî diçû.” (Mihemed, 2005: 143).

Cade

Yek ji sîmayên bajaran, cade ne û cade dibin bîyavên delalîyên berfireh bo mekanî di nav romanê da. Di nav vê romanê da, cade weku mekanekî vekirî pirî

raman hatîye bercestdkirin û kesayetîyên vê romanê rol û ektivîya xwe li ser gêran e, belê sîstemê cadeyan her di nav mekanekî vekirî yê mezin da taybetmendîya xwe ya delalî werdigire ku ew jî bajar e.

Sîyabend lehengê vê romanê di arasteya vezivîna bîrhatinên xwe da ji bo mekanekî li cem wî aşna anku mekanekî li cem wî xwedan bihayekê sozdarî, amajeyê dide dilbera xwe Nêrgizê û li vêrê nivîskarê romanê mifa ji cadeyê wergirtîye weku mekanekî veguhastinê û ji pêxemet hindê Sîyabend bigehe dîdara xweştivîya xwe, li vêrê li destpêkê Sîyabendî cade derbas kir û ji nû çûye ber dîwarê mala nêrgizê û jivanê xwe li gel wê borandîye:

“Piştî cade birî û jêhel bi kolanka bi têkeleyê raêxistî ra çûy, bentelon û gumlikê otîkirî li ber bûn. Çend pêngavek dihavêtin, pitir nêzikî wî dergehê keskê. ...rast e cadeya sereke hebû, pitirîya rêya xelkî di wê cadeya bi tîkelî rabû.” (Mihemed, 2005: 158).

Kesayetîyeka lawekî bi navê Xalid di vê romanê da û ji ber xêzana wî bi destên rejîma Beasê hatibû kuştin, lewra şet bibû, anku hişê xwe jidestdabû. Dema navbirî li nav bajarî bizav û hatinûçûn dikir, hîna tîrsa polîsên Beasê li cem hebû, li vêrê jî hindî bi lez diçû û hizr dikir her gave polis bi dûv ve ne. Lewra bi lez cadeyê ra derbaz dibû, piştî bi lez ji cadeyê derbaz bûy, wê komeka zarokan dît ku li ber cadeyê box we yarî dikirin. Li vêrê jî xuya dibe ku cade bûye mekanekî veguhastinê li cem kesayetîyên romanê:

“Pêngavên wî yên fir, ew salbendê cade dikire du la, ez li pey pêngavên wî çûm. Li mekanekî veder ji cadeyê, komeka zarokên cilik dirayî û pirç qijavîj û pêxwas yarî dikirin.” (Mihemed, 2005: 169).

Kolan

Mekanên vekirîyên weku kolan ji sîmayên here dîyarên bajaran e û kolan weku rehendekê vekirî yê mekanî cure nermatî û azadîyeka mezin dide kesayetîyên romanê. Kolan dibe arasteyên veguhastin û borîna rûdan û kesan û derbirînê ji çendîn kêlgehên wateyî dike. Li ser demê rejîma Beasê û hindî hind zordarî diderheqa miletî dikirin. Gelek caran hîna şev bi ser bajarî da nehatî, polîsên Beasê, rêk digirtin û hemî kolan ji mirovan vala dikirin û her kesê di nav kolan ra hatinûçûn dikir, yekser dihat desteserkirin û lêpîrsîn li gel dikir. Sîyabend lehengê romanê, li êvarîyekê da biçe cem xweştivîya xwe Nêrgizê ta xatira xwe jê bixwaze û dema di

kolanan ra derbaz bûy, wî dît kolan vala ne çi kes lê nînin, ev çende bû sedem ku cure tirsek bikeve di nav naxê wî da. Sîyabend dema çûye di kolana mala Nêrgizê da, yekser sîxorên rejîma Beasê lêpirsîn li gel Sîyabendî kir û pirsyar jê kirin ku çima hinde di nav vê kolanê ra tê û diçe û piştî hîngl yekser Sîyabend rêya male digire ber û dizivire ve. Li vêrê dîyar dibe ku kolan weku mekanekî vekirî, ji ber zordarîya rejîma Beasê mina zindanekê lê hatibû, xelk nedikarî bi azadî hatinûçûnê lê bike:

“Li wê êvara direnga kolan vala kirin û hêdî hêdî gewratîyê hemî dir girtin, roj dihêla asoyê da hate daûran û heta berzebû, perdeyeka tarî jî kete ser hêlên gewr û berze kir. Ê êvarê, pêngavên bitirs û şerim min dihavêtin. Recifkê dilê min girtbû û sed awaz digotin.

...di nav reşatîya şevê ra, dengêkî gazî min kir:

- law, ka hêrve were, tu vê şevê li çi digerî?

Tu li çi digerî? Û vê kolanê sê gêsî dikî?

... dê li çi gerim? Îsa, Mîsa, li ser xwe geryanek û dê zivrim mal.

Dengûbasên sîxorî û reşatîya wî gelek dibelav in.” (Mihemed, 2005: 76-77).

Li mekanekî dî ji vê romanê, kolan bûye rehendek bo veguhastina gelek kesayetîyan ji bo pêçvebirina rûdanên romanê û kesayetîyek lawekî bi navê Xalid dema li kolanekê ra dibore, kesek xwastinê dike û daxwaza alîkarîyê jê dike. Belê Xalid çi alîkarî nekir, ji ber ku Xalid bi xwe ji ber rûdana kuştina xêzana xwe bi destên rejîma Beasê hişê xwe jidesta bû û li vêrê kolan weku mekanekî vekirî bûye cevengek bo amajedana hindê ku gelek kesên bêguneh ji ber zordarî û sîtema rejîma Beasê mayîne bêxwedan û serberdayî û jîyana xwe li kolanan dibûrînin:

“Bi kolanekê da çû, wê xwazxwazokî dikir, destê xwe li ber dirêj kir. Xalid bi revê pivek lê veda û ezmanê xwe lê hîna derê. Bi hêminî borî.” (Mihemed, 2005: 186-187).

Bazar

Ew mekanê gelek qerebalixa mirovan lê hey, di nav bajarî da bazar e. Bazar mekanekî vekirî ye û yê bêsînor. Dîsa bazar weku mekan di nav vê romanê da çendîn rehendên delalî bi xwe ve girtîne û li mekanekî ji vê romanê, romannivîsî saloxdanek da ye bazarî û bi bazarekê vala û bêyî kesayetî li qelem daye, ji ber ku bajarek yê dagîrkirî be, bi xwe mekanên vekirîyên vî bajarî jî azadî namîne, belku sînorên vekirî yên bazarî û hemî cureyên din yên mekanên vekirî ji tîr girtin û zorî bi ser da tê kirin. Di nav vê romanê da bazar wisa hatîye saloxdan ku ew kesên hatinûçûn di nav bazarî da dikirin ne asayî bûn û cure tirsek li cem xelkî hebû, ji ber polîsên rejîma

Beasê. Di nav arasteyê vegêrana vê romanê da, nivîskar behsa wê rojê dike ya ku yek ji kesayetiyên romanê ku karê camçîtîyê li nav bazarî dikir, ev kese bi destên polîsên rejîmê hat girtin û wisa xuya dike ku jîyan di vê rojê da gelek bi lez bi rêve diçû û ji nişkekê ve polîsek têe nav bazarî û qesta dikana caman dike û dibêje vî kesî li gel me were, dê camên me çêkey, piştî hîngê tê girtin û bêserûşûn dibe:

“Wê rojê livîna mirovan di nav bazarî da ne ya rêkxistî bû, li hindav bajarî çûçik bilind difirîn. Hetavê pîstê mirovî digest, wê rojê hemî tişt berovajî dihatin pêş çav, jîyanê rîtmeka bi lez û bi zêmar bi xwe ve girit. Hesteka aloz di nav sîngl min da çêbû. Polîsek bi jûr ket û bzarê firotin û êxistina caman gerim kir. Lê piştî bazariya me jêk negirtî, xuda hafîz kir û çû.” (Mihemed, 2005: 162-163).

Ji vê çendê xuya dibe ku bazar weku mekanekî azadê vekirî bo her kesekî di nav vê romanê da weku mekanekî girtîyê bitirs hatîye nîşandan, ji ber ku serbaz û polîsên rejîma Beasê kontrola bazarî dikir û li dûv heza xwe xelk digirt û diêşand.

Meydan

Meydan di nav vê romanê da weku mekanekî vekirî û sinorên wê vekirî ne bo hemî kesan ku lê kom bibin. Meydan wisanê hatîye saloxdan ku ew Meydana li nîva bajarê hêdî hêdî mirov lê kom ve dibûn ta ku pir bûyî ji kesan, anku ev kombûna kesan li Meydana Bajarî ne karekê asayî bû, belku bi jimareka mizin ya mirovan li wir kom bûn ser hevdu:

“Li meydana bajarî hêdî hêdî ew bira mirovan pitir lê dihat û pitir deng û qerebalix zêd bûn û êdî we lê hat, te xîz hilavêtba ne dikevt erdê. Hemî di xoha xwe ra malîq bûn. ...ew xelkê li wê meydanê diçemîya, her weku jib o jêgirtina birînekê lêk kom dibin.” (Mihemed, 2005: 168-169).

Li mekanekî din ji vê romanê, ew meydana hatîye pirkirin ji mirovan û piştî ku baranek hatî, ew xelk hemî ji nav meydanê revîn, anku bi dîtina me, mebest jê ewe dema ku polîsên Beasê dihatin di nav meydanê da xelik ji ber wan direvîn û xwe rizgar dikirin:

“...Baranê, boştir lêkir û rêpîvanê berdewamî bi xwe da, cubar pitir bi erdê da çû û bêhna axê pitir bilind bû. Şirkên sîvandeyan mişên êxiste meydana û wê bazarê.” (Mihemed, 2005: 170-171).

Rûbar

Rûbar yek ji wan cureyên mekanan e ku pitir bo veguhastina kesan bikar tê. Dîsa pêxemet encamdana karan û pîşeyan jî bikar tê. Di nav vê romanê da rûbar weha hatîye saloxdan ku demê hêrişê serbazên Beasê çû ser gundên kurdan û di nav rûbarekî da derbaz bûn û yek ji kesayetîyên lawekî yên romanê li gel van serbazan bû û dema çekê wî havêtîye ber, ji destan kete di nav rûbarî da:

“... Lê, ez yê rastîyê bo we dibêjim. Dema komeka serbazan em li gel xwe li rûbarekê di nav çiyayan ra derbaz kirin, li wê derê tiveng dane min. sê caran ew tivenga malmîrat ji lepên min ket û destên min lerzîn...” (Mihemed, 2005: 98-99).

Li dawîya vê beşê giring e amajeyê bi vê yekê bidin ku ev her heşt cureyên mekanên vekirî yên me behs kirin û şirove kirin, di nav vê romanê da giştî û sereke ne û peywendîyeka rasterast bi rûdan û babetên vê romanê ve heye. Belê çend cureyên din yên mekanê vekirî di nav romanê da hatîne ku çî peywendî û karîgerîya delalî li ser romanê nîne, lewra ku em bi fer nabînin behs bikin, weku van cure mekanan: Pir, gelî, sîvande, derazînk, bîyaban, deşt, gir û nihâl.

3.2.2. Mekanên Girtî

Mekanên girtî, her di çarçoveyê giştîyê mekanên vekirî da ektivîya xwe di nav metna romanê da werdigirin. Mekanên girtî xwedan sînorekê dîyar û aşkera ne û bîyavê wan ne yê vekirî ye bo hemî kesan belku cure taybetmendîyekê bi xwe ve digirit. Cureyên mekanên girtî, di nav xwe da gelek awayan hembêz dike, hindek mekanên girtî hene ku aşna ne bo mirovî û xweşîyekê jê werdigire û hindek cure jî hene ku ne aşna ne bo mirovî. Belku bi zorî mirov lê dimîne, ev ên li xwarê çendîn mînakên pratîkî ne li ser cureyên mekanên girtî di nav romana *Sotingeh* da:

Zindan

Yek ji cureyên mekanên girtî yên di nav vê romanê da bûye mekanekî giring û sereke karîgerîya xwe ya delalî li ser tev romanê berceste kirî, zindan e. Zindan mekanekî girtîyê sînordar kirîye û kes bi zorî lê dimîne, anku kese ne bi heza xwe dimîne di nav zindanê da. Zindan ew mekan e yê ku bûye navendek bo vegêrana piranîya rûdanên romana *Sotingehê*. Zindan weku mekanekî girtî jî gelek mekanên din pêk tê yan jî komeka mekanên din yên girtî bi xwe ve digire weku avahîya mezinê zindanê, anku avahîyek mezin heye ku jûreka zindanê di nav da ye. Dîsa jûra

lêkolînê ku ev e jî dibe mekanekî din yê girtîyê her li ser binemayê zindanê hatîye avakirin. Jûra îşkencedanê, ev e cureyeke din yê mekanî ye ku her di çarçoveyê jûra zindanê da ye. Li destpêka vê romanê, nivîskarî saloxdana wî avahî kirîye yê ku zindan di nav da ye. Sîyabend lehengê romanê bi destên polîsên rejîma Beasê tê girtin û di nav arasteya vegêranê da, nivîskarê romanê amaje bi roja yekê da ye, dema diînin zindanê û saloxdana wê tirombêlê dike yak u pê hatîye veguhastin û amajeyê dide wî avahîya bilind ku zindan di nav da ye û piştî hîngê Sîyabend bi destên polîsan tê rakêşan ta ku diçe pişt şifşên asinî di nav zindanê da. Li vêrê ev avahîya bilind weku çarçoveyekê giştî bo jûra zindanê hatîye saloxdan û zindan bi xwe dibe beşek ji vî avahî:

“... Tirombêleka dergirtî, li hindav banê qemareya wê guhkên tivengê di dîyar. ...bi meydanka wî avahîya bilind û asê kevt û rawestîya. Di zelumên baş rapêçayî û tiblên wan li ser loleyên tivengan, xwe jê havête derê û xortekê çavgirêdayî û dest ji piştêve di kelamçe kirî, ji piştî tirombêlê rakêşan derê û her yekê ji alîyekî xwe ve dane ber mist û kêlincîya û bi jûr êxistin. ... Di kolaneka tarî û zirav ra rakêşan û li ber şifşên jûrekê rawestandin.” (Mihemed, 2005: 12-13).

Yek ji saloxetên serederîya rejîma Beasê li gel zindanîyan ew bû gelek pirsyar ji zindanîyan dikirin û dadgeha wan gelek gîro dikir ta ku nexweşîyên derûnî bo zindanîyan çêbibin û piştî Sîyabend zindankirî bo demekî dirêj dadgeha wî nekir û ma di nav zindaneka tarî û berteng da. Ev e saloxdaneke bo jûra zindanê ku rûberê wê gelek teng e. Dîyar e vî mekanê girtî gelek kartêkirin li ser derûnê Sîyabendî kirîye:

“Belku hest bi tirsê nekim di navbera van çar dîwaran da têkçûye me. Van ez kuştim. Eve sere çend heyvan e, pirsyarên dunyayê hemî ji min kirin. Ezê ditirsm nizamim boçî hinde gîro kirim? Hema bila ji rokja êkê ew pirsyar ji min kirban û nuke kêşeya min bi dawî hatibû.” (Mihemed, 2005: 18-19).

Li mekanekî dîn ê vê romanê nivîskarî amaje da ye hindek saloxetên jûra zindanê, ew zindana Sîyabend di nav da hatîye zindankirin ku jûreka pirî şeh e û bêhnên nexweş jê tên, dîsa amajeyê dide hindê ku ev jûre ya sar û berteng e:

“Pelên çavên wî diges in û çirîşkên wan dipejin kujîyên wê jûra şehgirtî û bêhnên genî bi ser hîlbûyî. Li qurnetekê çûye têkra û bayekê sar yê gumlekê wî ji rûsatîya leşê wî cuda dike.” (Mihemed, 2005: 20).

Avahîya mezin a girtîxaneyê ji bilî jûrên zindanê, gelek jûrên din di nav da hene weku jûra lêkolînê, piştî ku Sîyabend hatîye zindankirin û bo demê çend mehan ji nû hat veguhastin bo jûra lêkolînê ku eve jî dibe mekanekî girtîyê her di nav çarçoveyê zindanê da ku hebûna xwe berceste dike. Ew efserê lêkolînê bi heman awa givaştinê li ser Sîyabendî dike ta danpêdanê bi tawana xwe bike, belê Sîyabend danpêdanê nake, ji ber ku bêguneh e:

“Serî xwe rake û berê xwe bide min zendîq, eve dûmahî car bit, ez van pirsyaran ji te bikim...”

...bi xişkoki bo min bêje ka navê şaneya hewe çî ye û çend kes têda endam in? Hûn abonyên xwe didin kê? Kî serperîştîya kombûnên hewe dike?

...ew dare di destî da, da bin erzinka Sîyabendî û çavên wî ji erdê vekirin û sere wî pê bilind kir û gotê:

-Em dewlet in, dewlet anku desthilat, desthilat jî anku hêz.” (Mihemed, 2005: 41-42).

Jûra aşkencedanê bercesteşîya xwe di nav avahîya zindanê da wergirtîye û piştî ku Sîyabendî birîye jûra lêkolînê û lêkolîn li gel kirî, belê her wî danpêdan nekirîye, vê carê bire jûra eşkencedanê û çendeha cureyên eşkencedanê dan ber weku hêza karebê. Belê, Sîyabend bi pankê ve hilawîstin û her du pêyên wî êxistine dare felaqetê û bi vî rengî Sîyabend da ye ber eşkencedanê ta hose xwe ji dest day. Vî cure mekanî bîrhatinên nexweşên derûnî li cem Sîyabendî û tev zindaniyên din peyda kirin û bi vî awayî ev mekanê girtî jûra îşkencedanê karîgerîya xwe ya delalî li ser hemî romanê sepandîye, ji ber ku derbirîneka rasterast ji wê zulm û zordariyê dike yak u rejîma Beasê di derheqa law û xortên kurdan di nav zindanê da dikir:

“Hêza Karebê Sîyabend bêhêz kir, wayîr jê ve kirin û rakirine ji pêr ve. Werîs di nav pêyên wî ra birin û li dor tenîştên wî baş alandin. Li dûv xwe rakêşan û bi asinê pankê ve hilawîstin û werîs kêşan, bejneke pêyên wî ji erdê xilole bûn. Kêbilî pêyên wî di ser gozekê ra û pişt lê şarand. Qêrîyên wî di gewrîyê ra asê bûn û di sîngî da hedan.” (Mihemed, 2005: 46).

Mal (Xanî)

Mal ew mekanê aram ê her kesekî ye, anku sînorên xanî yan malê di aşkera ne û mekanekî taybetê girêdayî bi her kesekî ve ye. Mal weku mekanekî girtî di nav pêkhatiya xwe da ji komeka jûran û pêkhatiyên din pêk tê weku hewiş, lîwank, jûrên nivistinê, serşok, lînangeh, jûrên pêşwazîyê... Her mekanek ji evana her di bîyavê malê da hebûna xwe berceste dike. Rast e, mal mekanekî aram e û mirov di nav mala

xwe da, hest bi aramî û xweşîyê dike, belê gelek caran eger mirovî arîşeyek hebe yan fişarek derekî li ser mirovî hebe, vê carê mirov bi xwe di nav mala xwe jî da ne yê aram e û hest bi dudilî û nexweşîyê dike.

Di nav arasteya vegêrana vê romanê da, romannivîs amajeyê dide kesayetîyekî ku bi dîtina me her dê mebest jê Sîyabend be ku bi lez dergehê mala xwe diqute û diçe di malê ve bi Lîwaneka zirav diçe jûra xwe ya nivistinê, belê bi xwe di nav jûra xwe ya nivistinê jî da, ew yê aram nebû, her tirsek di dilê wî da di nav vî mekanê girtî da mal amajeyê bi sê pêkhateyên din yên mekanê mlê dane. Ew jî hewiş, lîwank û jûra nivistinê. Dibe mebesta nivîskarî ji bercestekirina vî mekanî ew e ku bi xwe mirovê kurd ji ber zulm û zorîya rejîma Beasê di nav xanîyê xwe yan mala xwe da jî yê aram nebû, belku her tîrsa vê rejîmê di dilî da bû:

“Dergeh hate qutan. Bi lez vekir û misteka avê li rûyê xwe kir. Piştî pentelonê xwe hildayî, di weê lîwanka zirav ra borî û bi lez heçku revdeka gurgan bi dûv ve û divêt xwe ji ber çavên wan winda bike. Ew lîwank birî û çû ser mekanê xwe û bédeng li ser kontika rûnişt xwar û westyanê rengê xwe bi ser dada. Tirseka mezin di çavan da hat nexşandin. Destên xwe têk borandin û li dor çokên xwe zincîr kirin.” (Mihemed, 2005: 9-10).

Li cehekê din ji vê romanê mal ew mekanê taybetê aramê mirovî bûye mekanekî nexweşê rûdaneka diltezîn lê rûda ye. Xalid yek ji kesayetîyên lawekî yê romanê ye û ji nişkekê ve li demê spêdeyê komeka polîsên rejîma Beasê hêrişî mala wî dikin. Hindek polîs dimînin jîderve û çavdêrîya dormanên xanîyê wî dikin û hindekên din diçin jûr û li dema Xalidî nivêj dikir û xûşka Xalidî û dayîka wî bi zorî girtin û birin û Xalid ji nehiş kir û her du jin bi zorî birin. Eve amajeyeka rasterast ye ji bo hindê ku Mal ew mekanê girtîyê taybetê li ser dema rejîma Beasê mekanekî ne aram bû. Belku hemî mal ji xwe ditirsîyan ku polîsên dujmin bi ser da bigirin:

“Ew bû dema di gel bangê spêdeyekê, tirombêlek li ber dergehê mala wan rawestîya û hindek çekdaran xwe li dorên xanî belv kirin û hindek jî bi jûr ketin. Wê gave Xalid li ser şemilkê bû û nivêj dikir. Li gel dengê qêjîya dayîkê û xûşkê, wî silava mila veda. Bi xar kire pê xwe û ji derazîna jûrê derbaz bû, êkê quntaxeka mîrata tîvengê li şilka serî da û bêhiş ket. Her du jinkên male, bi xortî kirine di tirombêlê da û bi lez çû.” (Mihemed, 2005: 69).

Çayxane

Çayxane mekanekî girtî ye ku xelik demê xwe lê diborîne. Anku ew mekane ku hemî kes diçinê ji bo bêhinvedanê û borandina demî, belê li serdemê rejîma Beasê bi xwe ev mekane jî hatibû hingavtin anku gelek caran xelk nedikarî bimîne li çayxaneyê ji ber sîxorên dujminî. Kesayetîyeka lawekî bi navê Xalid di nav vê romanê da û piştî ku ji ber kuştina dayîk û xûşkên xwe bi destê rejîma Beasê hişê xwe jidestday, carekê li çayxaneyê bû û diyalogek di navbera wî û kesayetîyeka din da bi navê Hecî Ehmed çêbû, piştî ku amaje da ye hindê ku bi şev pêşmergeyan hêriş kirîye ser rebîyên dujminî vê carê Hecî Ehmed tore bû û daxwaz ji Xalidî kir ku xwe bêdeng bike, ji ber ku tirsîya yek ji sîxorên dujminî li nav çayxaneyê be û zîyanê bigehîne wan ji ber axivtinên Xalidî. Ev car Hecî Ehmed ji çayxaneyê derdikeve û diçe. Ev çende amajeyeka rasterast ye ku li ser dema rejîma Beasê bi xwe mekanên demborandinê jî hatibûn dagîrkirin û kes nedikarî bi azadane li çayxaneyê bimîne û xweşîyê box we çêbike:

“Ew li paşîya çayxaneyê rûniştî, gelek bi çavên zîq û bi guhên bell ê meyze dikir, demê Hecî Ehmedî gopalê xwe kirîye stûn û erzinka xwe danaye ser kefa wî... Suhbeta şivêdî neke... ku her du rebîyên li hindavî bajarî hatibûn hingavtin. Boçî babo, rastîyek e û hemî dizanin... Hecî şaşka xwe xwar kir û ji çayxaneyê derket.” (Mihemed, 2005: 137-139).

Çayxane di nav vê romanê da bûye rehenda mekanekî girtî di nav da amajeyên rasterast dayne wê zordariyê yak u rejîma Beasê derheqa milletê kurd kirî. Li mekanekî din ji vê romanê amaje hatiye dank u li ber derê çayxaneyê polîsên Beasê hêrişî çayxaneyê kir û komeka gencên bêguneh girtin û piştî birîne zindanê çî belge li ser nebûn kanê çî tawan kirîye. Bi tinê ew behaneyê girt ku vî kesî nasnameya sextet heye. Anku behane lê hatiye girtin, eger di rastî da vî kesî çî tawan nekirîye:

“Li ber derê çayxaneyê qerebalixek peyda bû, polîs xir bûn, ewên li hemî dira dîyar. Xelik dane paş û kulma min bi nav çavên wî ve dîtin. Piştî em girtin wî got komîserê lêkolînê.

-Eve yek ji xirabkaran e û nasnameyeka sextet di berîkê da ye.” (Mihemed, 2005: 154-155).

Xwendingeh

Xwendingeh yek ji wan cureyên mekanî ye ku karîgerîyeka mezin dike ser bîrhatin û kesayetîya her kesekî û mirovî bîrhatinên xweş û nexweş li xwendingehê

hene. Anku xwendingeh dibe mekanek ji bo vejandina çendîn serhatî û bîrhatinan ku li dema borî bi sere mirovî hatîne. Di nav vê romanê da û li ser zarê vegêrê romanê, amaje da ye xwendingehê ya ku lehengê romanê Sîyabendî xwendina xwe lê tamam kirî û dide dîyarkirin ku ev xwendingeh e têkel nebû. Anku bi tine li yek xwendingeh yan kur yan kiç hebûn û merem ji vezivîna bîrhatinên vî mekanê girtî ew e ku dema vegêr behsê dilbera Sîyabendî ya bi navê Nêrgiz wê bi xwe daxwaza evînê ji Sîyabendî kirîye û Sîyabend ji xuya dike ku wî li çî mekanan têkelîya kiçan nekirîye û bi xwe li xwendingehê jî ew li xwendingehkê bû ki bi tenê kur lê hebûn:

“Di vî civakê gundî da, kiç daxwaza evînê bike. Di çavên min da mezin bû. Hezên min dilivandin. Hêla xwendineka din li xwe bikim.
...hêyyy, eve ew ez bûm yê xwendekar bi tenê li vêrgeha kuran xwendina xwe birîye serî û hez ji fêrgehên têkel nedikir. Te dît çawa hatim guherîn? Reftarên min baştir bûn.” (Mihemed, 2005: 19).

Li mekanekî din ji vê romanê Xwendingeh hatîye nîşandan weku mekanekî sivêlê pîroz di nav hemî civakên cîhanê da, belê demê hêrişên leşkerên Beasê dihatin ser gundên kurdan, bi xwe xwendingeh jî dihatin sotin û yek ji wan serbazên carekê hêriş birîye ser gundekê bîrhatinê xwe vedigêrin ku efserekê Beasê ferman lê kir ku ew xwendingeha gundî bisoje, çeqmaq li erdê da û şkand. Ev rûdane anku sotina û herifandina xwendingehan amajeyeka rasterast ji bo redeye mezinê wê zordarîyê ya ku rejîma Beasê li xelik kurd dikir:

“...ez di ber dergehê fêrgehê ra borîm. Wî efserî makîne ji berîka xwe îna derê û bi zimanê xwe got min:
Ha eve, fêrgehê bisoj e.
Dema min bi her du destan makîna wî vegirtî, min jûr da li erdê da û li bin pê xwe herişand. Ew gelek bi vê kiryarê dilgiran bû. Lewra agir berda sîvandeya fêrgehê û bi nik min ve hat û got:
Xwe serreq neke, yaxîbûn faydeyê te nake.” (Mihemed, 2005: 103).

Mizgeft

Peristgeh û mekanên perstinên olî di nav hemî civakan da hene û pêdivî ye van mekanan pîrozîyek taybet li cem hemî kesan hebe. Di nav vê romanê da û di nav rûdanên vegêrana wê da amaje bi Mizgefê hatîye kirin û lehengê romanê Sîyabend dema hatîye girtin û zindankirin vê carê dengê melayî bi rêka semeyê dihat wan

zindanîyan û ew mekanê di nav da zindan kirî li nêzîkî Mizgeftê bû, ji ber ku dengê melayî dihat guhên zindanîyan:

“Hevdem di gel vê li alîyê jûrê yê avahîya bilind dengê melayî ji bilindgoyan bilind bû, li dûv melayî qameta nivêjê girtin.” (Mihemed, 2005: 12).

Her weku berî niha me amaje daye hindê ku Mizgeft yan peristgeh ji wan mekanên pîroz in di nav hemî civakan da. Belê bi xwe mekanên perestina Xwedayê mezin jî ji zordarî û sîstema Beasê rizgar nedibû û li ser zarê yek ji kesayetîyên vê romanê amaje pê hatîye dan ku dema leşkerên Beasê hêriş dikirin gundên kurdan, bi xwe mizgeft jî disotin û ne ev bi tenê belku bi xwe melayê gundî jî kuştibûn. Ev kiriyara sotina mizgeftê çevengê rasterast ye ji bo dîyarkirina karên dermîrovî yê leşkerên Beasê di derheqa kurdan da kirin:

“Gund têkda bibû kadî û bi pinîyên reş esmanê wî hûnî bû. Mizgeft bibû komir, şaşka melayî li hewîşê girêl bibû. Lîfka wê di devê agirî da û agir bibû qiralê rojê, jîngeheka giran bû, hilmê davên xwe li dor gerdenê aland bûn.” (Mihemed, 2005: 144).

Dêr (Kenîse)

Her çende civakê kurdî û di piranîya qebareyê xwe da, weku olî musulmanan. Belê olên din jî di nav da hene, weku olê mesîhî û kurd hemî bi cave rêzgirtinê temaşeyî vî olî dikin û mekanên peristina olên mesîhî weku dêr/kenîse di nav bajarên kurdan da hene. Di nav vê romanê da ev cure mekanî jî hatîye behs kirin. Vegêrê romanê behsa wî avahîya mezin dike ya ku zindana wan kesan di nav da heyî, yê ku bi bêgunehî ji layê rejîma Beasê ve hatine girtin ku dêrek jî nêzî wê zindanê heye û dengê zenga kenîseyê dihat guhên zindanîyan û amajeyê dide wan rêûresman yê ku di nav kenîseyê da dihatin gêran. Dibe mebesta sereke ya nivîskarê romanê ji bercestekirina vî mekanî ew be ku divê amajeyê bide fireolîya civaka kurdî:

“Di wî avahîya bilintir ji gumbeda wê dêra bi rex pêvajoya jîyanê rawestyaye. Li wê dêra bi rex avahîya bilind ve, ku ji Kelha Bastîl asê û mikomtir, qeşeyî benkê zengila dêrê hejand. Zingêna wê bi ser bajarî hîlbû. Dîndar û yûn mildefên reş li ser milan, ber bi dêrê ve hatin û li nîva hole rawestîyan. Qeşeyî dest bi xwendina lavje û ayetan kir. Destên xwe ber bi banê bilind û mezin rast kirin. Hemîyan gotinên qeşeyî dubare kirin.” (Mihemed, 2005: 10-12).

Dikan

Ev cure mekanê girtî dikan, mekanekî here dîyar û berbelav e di nav vî bajarî da û rojane serederîya mirovan li vî mekanî tê kirin. Di nav vê romanê da amaje bi vî mekanê girtî hatîye kirin û kesayetîyeka lawekî ya romanê bi navê Filamerz û yekê din li ber derê dikana caman ji alîyê polîsên Beasê ve hatin girtin û zindankirin. Dibe mebesta nivskarê romanê ji bercestekirina vî mekanî vîya ye amajeyê bide hindê ku bi xwe kesên li ber dikanan yên bêguneh jî, ji ber zulim û zordariya Beasê rizgar nedibûn:

“Bireka zarokan yarîya çînkane dikirin û yek ji wan xwe li ber dergehê dikanê veşart. Rojeka gelek asayî bû, hevalê min Filamerz piştî pêkenîna xwe bi dawî hînay, bi kenîyeka bilind ji derê dikanê derbaz bû, ewên peyade yên di ber dikanê ra diçûn, têbînî ya me kirin li gel hindê teksîyek li ber dergehê dikanê rawestîya û du polîs jê derketin û bi navên me li gel me danûstandin kirin û bazarê êxistina caman germ kir.” (Mihemed, 2005: 163).

Zalgeh

Rejîma Beasê ji pêxemet hindê taku zêdetir kontrola xwe li ser kurdan bike, gelek zalgehên beşnînê li derdorên bajar û gundan çekirin û her tirombêleka sivêl hatiba ta çûba, ew tirombêl ebeşnîn dikirin û lêpîrsîn li gel hemî kesên li nav tirombêlê dihat kirin. Di nav vê romanê da behsê vî mekanê girtî hatîye kirin û du kesên lawekî di nav vê romanê da yek bi navê Evdî û Hevjîna wî ji gundî rêdikevin taku biçin bajarî, belê birêve û demê tirombêla wan nêzîkî zalgehê dibe, tirs xwe li naxê wan dide û piştî polîs hatên tirombêl hemî beşnîn û wêneyê xebatkarekî kurd di nav zembîla hevjinê Evdî da dîtîn, yekser polîsên zalgehê Evdî û Hevjîna wî pêkve girtin û dan lêpîrsînê:

“Wê nîvroyê, baraneka hûr dibarî, demê Evdî û hevjinê xwe ya dotmam li tirombêlê siwar bûyn û ber bi bajarî kevîne rê. tirombêl pitir nêzîkî bajarî bû. Di sînoran da, bane zalgehê dîyar kir...”

...li dûmahîkê pêngav mezintir lê hatin û di çavên Evdî û hevjinê wî da bû dergehê heftê yê dozexê. Awazeka melûl di serî da dijenî, li gel rawestîyana tirombêlê û vebûna dergehên wê, dilên wan jî rawestîyan...

...demê polîsî, sehkirîye zembîla hevjinê wî, wê lifka îşara xwe pitir kêşa ser demê xwe, piştî kit kit tiştên wê hatîn dîtîn, di binê zembîlê da wêneyê xabatkarekî navdarê berhingar dît...

Evdî bi hevjinê ve paldane di wê jûra biçûk ve û ferman dane şofêrî ku tirombêla xwe bihajot.” (Mihemed, 2005: 123-127).

Li dawîya vê beşê pêdivî ye amajeyê bidîn hindê ku ev her heşt cureyên mekanên girtî yên li serî ku me behs kirin, di nav romana *Sotingeh* da ku giştî û

sereke ne û delalet û ramana wan rasterast bi navûnîşan û babetê romanê ve heye. Belê ne ev cure bi tinê hatîne behskirin ji mekanên girtî, belku hindek amaje bi hindek cureyên din jî hatîne kirin, ji cureyên mekanên girtî weku dîwar, lîwank, bîstan, hewîş, kelhe, hol, jûrên bin erd, gor, kunc û hwd. Belê, van cureyên mekanên girtî çi karîgerîyeka mezin ya delalî bi babetên romanê ve nîne. Lewra em bi fer nabînin bi dirêjî li ser rawestîn, ji ber ku ev çend e dê bibe dirêjdarî di nav vê nameyê da.

3.3. Cureyên Mekanî di Romana *Gehnomê* da

3.3.1. Mekanên Vekirî

Bajar

Helbet giringtirîn rûdanên romana *Gehnom* di nav çarçoveyê mekanê vekirî di bajarî da bercestebûna xwe werdigirin. Vê carê pêdivî ye li destpêkê em vî curê mekanî şirove bikin ta bikarin bi temamî mekanên girtî yên di nav vê romanê da şirove bikin. Bajar yek ji wan sîmayên herî giring yên mirovatîyê ne û redeste werar û pêşketina her civakê ya girêdayî hebûna Bajarên pêşketî ye di nav wî civakî da. Ew bajarê di arasteya vegêrana vê romanê da xuya dibe, dîyar e bajarekê ne gelek mezin e belku bajarekê biçûk e û amaje tê kirin ku piranîya xelkê vî bajarî kesayetîyeka lawekîya vê romanê ku navê wî Mam Çîro ye nas dike. Anku di nav vî bajarê biçûk da Mam Çîro kesayetîyeka herenavdar e di nav da. Ev çende jî hindê digehîne ku dê Mam Çîro rolekê giring di nav rûdanên vê romanê da gêrî:

“Kes li vî bajêrê biçûk nemaye ku nehatbit vê çayxaneyê û Mam Çîro nenîyasit. Demek bû digotinê heke te zanîba du peyvan bixwîn û binvîsî, da xwe bo perlemanî berbîjêr bikî. Ev xelkê bi koreyî hez ji te dike, dengê hemîyan bo te bûn.” (Mihemed, 2022: 25).

Li mekanekî dî ji vê romanê bajar weku mekanekî vekirî yê xwe dan rehendên delalîyên vekirî yên naveroka babetê romanê hatîye li qelem dan û mina penahendekê aram bo wan kesan yên ku ji gundên xwe direvin ji ber şer û nexweşîyab li deverên sînorî û tînan bajarî. Sorûbelek yek ji kesayetîyên lawekî yên romana *Gehnom* e û demê mala wî li gundî firokeyên dujminî bombe havêtin gundê wan û her du kiçên wî bi sextî birîndar bibûn, ji ber vê çendê û ji neçarî hatîye

taxekê vî bajarî û çûye di xanîyekê bi kirê da, anku sorûbelek li bajarî ne bi dilê xwe ye û ji neçerî ma ye, ji ber ku gundê wî tê bombebarankirin. Bi dîtina me, mebesta nivîskarê romanê ji bercestekirina vê mekanê vekirî bajarî li vêrê ewe ku dixwaze amajeyê bide dîyardeya mişextbûna xelkê gundan bo nav bajaran ji ber ku şer û nexweşî li gundên wan rûdidin, vê carê pêxemet hindê gîyanê xwe biparêzin mişextî bajaran dibin:

“Sorûbelek şî caran jibîr nake ew bombeya ji nişkekê ve bi fêrgeha gundî ketî û her du kiçên wî birîndar kirin. Evro ji neçarî xwe di jûreka bikirê li kolaneka vî bajarî da heşar da ye û her şev ji ber xew vediciniqe û çavên xwe ji asmanî û valahîyê venake ta deng xeware dibe û digot, ewe min famkirî, gir gira topan û firokeyan ji guhên min dûr neketine.” (Mihemed, 2022: 31).

Li mekanekî dî ji vî romanê derazînkî bajarî hatîyeberecestekirin weku mekanekî vekirî û xwedan nîşanên sermayedarî û bazirganî, anku mekanên vekirî yên bajarî ketine jêr kontrola kesên dewlemend û xwedan desthilat û bo xwe projeyên akincîkirinê li ser ava dikin û paşî difiroşin kesên hejar. Di nav vî romanê da behsê mekanekî bajarî dike ku projeyek akincîbûnê bi navê Birayd Sitî yê akincîbûnê bi xêrhatina we dike. Wisa dide xuya kirin ku du hezar parçeyên zevîyê bo firotinê hene. Bi dîtina me mebeste nivîskarê romanê ji bercestekirina vî cure mekanê vekirî ewe ku xwestîye amajeyê bide hindê ku mekanên bajarî ku mulkê hemî xelkî ne, belê ketîne jêr kontrola kesên dewlemend û xwedan hêz û bi tenê ji bo berjewendîyên xwe yên taybet vî mekanî bikar diînin:

“Li derazînkî bajarî, li ser tabloyekê mezin nivîsî bû, projeyê Birayd Sitî yê akincîbûnê bi xêrhatina we dike, bi rex ve wêneyekê gelek mezin yê serekê mezin yê hilawîstî bû û li bin da nivîsî bû, bûka bajaran dê bibe yotopîya, 2 hizar parçeyên zevîyê bi bihayê guncav li hêvîya we ne.” (Mihemed, 2022: 188).

Taxa Gehnom

Tax ji cureyên mekanên vekirî yên heredîyar e di nav bajarî da, anku mekanekî vekirî yê di nav mekanekî vekirîyê mezintir da. Dibe li vêrê pirsyar bê kirin ku navê Gehnomê ji çi hatîye ku dibe navûnîşanê vî romanê. Sebaret navê Gehnom û her weku nivîskarî bi xwe amaje da ye vî çendê di perawêza berperê 10ê:

“Jêder dibêjin navê gelîyekê kûr e li tixûbê rojavayê bajarê kevn yê Orşelîmê, ku kelexên tawanbaran û qurbanîyan pêşkêşî Molox dikirin, firdane di wî gelîyê kûr da.” (Mihemed, 2022: 10).

Anku navê Gehnomê ji navê gelîkî hatîye wergirtin yê ku dikeve sînorê rojavayê bajarê Qudsê li welatê Filistînê û mekanekî nexweş û bi tenê kelexên kesên dibûn qurbanî dihavêtin di nav da, anku mekanekî nexweş yê kesên bêguneh di nav da tên komkirin. Ji encamê vê çendê bo me xuya dibe ku taxa Gehnomê yê ku di nav vî bajarê romana *Gehnom* da hatî behiskirin, mekanekî nexweş û kesên bêguneh yên ku bûne qurbanî bo kesên xwedan desthilat û erîstokrat lê xwemekan bûne. Vî taxî Gehnom karîgerîya xwe ya delalî li ser piranîya mekanên vê romanê sepanîye û bûye riwangehek bo bercestekirina babetê sereke yê rûdanên romanê. Di çend saloxdanekan da bo taxa Gehnomê, nivîskarî çendîn dîmenên balkêş dîyar dike. Yek ji wan saloxdanan ewe ku Gehnom mekanê kesên destkurt û hejar û sêwîyan e anku ew kesên bêxwedan li vî taxî dijîn û xanî û avahîyan van kesên li vî dijîn bêserûber in û ji naylon û kaxezan hatîne çêkirin:

“...Gehnom, îrema hejar û destkurtan, nihanîya sêwî û bêderan, nifreta her çar werzan. Çalka vehewandîna henaseyên teng û sîhwaneya rojên tengav...
...Gehnom dîmenê te yê bo min bûye îrem û di çavên yên dî da bi tenê parçeyeka naylonê sotî û gilêşxaneyek, hemû tişt û jîyandarên di goma te da dijîn.” (Mihemed, 2022: 64).

Lehengê vê romanê Hoşzan li mekanekî ji vê romanê behsa taxa Gehnomê dike û dîyar dike ku wî gelek çîrokên kesên hejar û belengaz bihîstine, anku ew kesên li vî taxî dijîn hejar û xwedanê çîrokên nexweş in û dengûbasên nexweş ku rûdanên nexweş bi serê xelkê vî taxî hatine:

“Ez li Gehnomê bûm, di nav kolankên wê da min çîrok û serhatîyên bîrsê û cengê bihîstine. Efsaneyên sêyr û entîke dihatin behskirin.” (Mihemed, 2022: 68).

Li mekanekî din ji vê romanê nivîskar amajeyê dide redestê vederîya taxa Gehnomê ji bajarî û dîr ji wan saxletên şaristanîyên di nav bajarî da heye û bi xwe revdên qaz û qulingan li hindav difirin:

“Birên qaz û qulingan li hindav Gehnomê taxa me yê ji vî bajarî veder bilind difirîn, mişext dibûn, qesta warên dîr û nenîyas dikirin.” (Mihemed, 2022: 77).

Li cehekê din ji vê romanê nivîskar amajeyê dide redestê cudahîyê di navbera bajarî û taxa Gehnomê da û lêkçiwandinekê di navbera kesayetîya sereke ya romanê bi navê Hoşzan û heyvê da dike, wisa xuya dike ku bajar yê bilind e anku kesên dewlemend lê dijîn, belê Gehnom mekanekî nizim e û kesên hejar û destkurt lê dijîn:

“Ez û heyv bi tenê li bajarî didîyar in, ew li bilindahîyê ye û ez li nizmtirîn mekan. Heyvê ciwanîyeka bêhevta heye, lê weku gulê ya bêdeng e. min her digot gulê, tu weku heyvêyî, ew esmanî hemûyê ciwan dike û tu li Gehnomê demên min dikî behîşt.” (Mihemed, 2022: 122).

Li mekanek din ji vê romanê nivîskar tekezê li ser nexweşîya vî taxî dike û behsa hindê dike ku Gehnom nexweş e û ew kesên diçin lê dijîn, ji neçarî diçin û dayîka Hoşzanî ji neçarî mala xwe bire taxa Gehnomê û li were akincî bûye:

“Ji neçarî li Gehnomê li ber lêva çemê kevn akincî bûm. Kolkekê naylonê çêkirî û ez û kurê xwe yê min ew bi bi gomtilekê pîsatîyê didît têda rûniştin.” (Mihemed, 2022: 212).

Ji encama vê nîşandana borî bo wateya mekanê Gehnomê xuya dibe ku mekanekî nexweş e dibe mekanê kesên hejar û bêdesthilat. Rast e ku mekanekî vekirî ye û her kesê bivêr dikare hatinûçûnê li nav bike, lê çi xizmetên jîyana sedema di nav da nînin.

Cade

Cade weku cureyekê mekanê vekirî hebûna xwe di nav hemî bajêr û gundan da berceste dike. Dîsa hemî cade dibe mekanekî hatinûçûna bizava kesayetîyan, anku em dikarin bibêjin ku cade sînore bizvînerê kesayetîyan berfirehtir dike. Di nav vê romanê da cade weku mekanekî vekirî rola xwe ji bo veguhastin û hatinûçûna kesayetîyan bi başî berceste kirîye. Vêgêrê romanê, behsa cadekê dike bi navê Azadî û behsê hindê dike ku ev cade ji kesên pale û karker pîr dibe û pîranîya tex û çînên xelkî di nav vê cadeyê ra derbaz dibin ku dikeve navenda bajarî:

“... Xebenkên dikanan têne rakirin û cadeya azadî ya dikeve nîva bajarî her du la ji karkeran pîr dibe. Fermanber qesta mekanê karî dikin û zenga fêrgehan tê lêdan. Boyaxçî sindoqên xwe rêz dikin.” (Mihemed, 2022: 22-23).

Cade dibe mekanek ku gelek kesayetî bi rêka wê debara jîyana xwe pê bikin. Di nav vê romanê da, kesayetîya sereke ya bi navê Hoşzan dema hîna zarok û ji ber hejarîyê diçû ser cadeyê û kelûpel difirotin weku kilînis û dîsa pêlav jî boyax dikirin:

“... Li gel bîrhatinên dayîka min. her ji dema min kilînis û tovik li ser cadeyan difirotin û karê boyaxkirina pêlavan dikir, min hez ji serbixweyîyê kirîye.” (Mihemed, 2022: 47-48).

Li mekanekî ji vê romanê, nivîskarê romanê karîye bi rêka cadeyê amajeyê bide dîyardeyeka neciwan di nav civakê da, ew jî dema hîlbijartina kesekî nehejî xweberbijêr dike û xelik hemî diçin ser cadeyê û piştgirîyê lê dîkin, ku li vêrê cade bûye ew mekan e yê ku gendelîyê di nav civakî da belav dike, anku her kes in dibin sedema hebûna vê gendelîyê di nav cadeyê da:

“Wê êvarê, li wê cadeyê jî, pêlên cemawerî bi destqutaneke germtir pêşwazî li gotara berêzî dikir û êdî berêzî bi xwe jî hay ji wan peyvan nebû yên ser kaxezê nivîsî û bi dengekê tijî soz û nerm digot, ez xizmetkarekê biçûk im bo avakirina xewnên hewe yên mezin û herifandina astengan dê karê me bit.” (Mihemed, 2022: 135).

Bazar

Bazar weku mekanekî vekirî, bîyavekê din yê mekanê vekirî li ber kesayetîyan berceste dike û dîsa bazar dibe mekanekî çalakê peydakirina rûdan û bizavan di nav romanê da. Kesayetîya sereke ya vê romanê Hoşzan, ji ber ku yê sêwî bû, ne dayîk hebû û bab, vê carê rojane da biçê ser cadeyan û karton û bitlên pêlastîkê kem dikirin û piştî hînge diçû bazarî û li wêrê ew karton û bitle difirotin ta ku bi rêka vî pareyî debara jîyana xwe bike û di nav bazarî da ew diçû dikanek weha ku kelûpelên wî bi bihayekê erzan dikirin:

“... ez jî hêdî bi kelexê xwe yê xwehir û piştî qos ve, dest bi vêdana bitlên vala û likeyan dikim û dibime dikaneka sere sîkê, kiloyê bi erzanantirîn biha difiroşim, ku caran bihayê wan parîyekê xwarinê pê nayê ku birsa min pê bişkêt.” (Mihemed, 2022: 23).

Di arasteya vegêrana romanê da, lehengê romanê Hoşzan dîyalogêkê li gel Gulê dike û di nav vê dîyalogê da xuya dibe ku ew çûye bazarî û ew dixwaze hemî kelûpelên nav bazarî bikire, her wisa xuya dike ku gelek kes li nav bazarê hebûn û gelek kelûpel jî li nav hebûn. Lê ji ber ku Hoşzan yê hejar bû û pare nebûn, vê carê nikarî box we tiştan li nav bazarî bikire. Ji vê çendê dîyar dibe ku Bazar li vêrê ew mekan e yê ku bûye mekanê kesên dewlemend û xwedan desthilat:

“Gulê, min xwe bi bazarî da berda, qerebalix bû, heçku xelik hemû daçirîne bazarî yan hero hose ye divêt, belku min hemû tişt divîyan.” (Mihemed, 2022: 105).

Meydan/ Gorepan

Meydan mekanekî vekirîye û hemî kesên bajarî dikarin hatinûçûnê di nav da bikin, belê weku erkê meydane di nav civakî da digere ewe ku dibe mekanê

xirvebûna kesan ji pêxemet danûstandinê li ser babetekê yan jî saxkirina bîrewerîyekê. Di nav vê romanê da, behsa meydana nehatîye kirin ji bo xirvebûna kesan, belku saloxdanek bi rêka Meydana Şoreşê da ye mekanê Çayxaneya Roslîn, anku meydana bi navê Şoreş heye û wêneyê çayxaneyê li ber Meydana Şoreş kêşaye:

“Xan Roselîn, Çayxaneya Xan Roselîn, li kujîyê serî yê Cadeya Azadî beramber Meydana Şoreş bû ku dikeve di dilê vî bajarê biçûk da.” (Mihemed, 2022: 34).

Çem

Çem weku mekanekî vekirî xwedan sînorên beredayî ye û her kesê bixwaze dikare hatinûçûnê bo bike. Di nav vê romanê da em bûye reye rehendekê delalî ji pêxemet bexşîna çendîn wateyan li ser taxa Gehnomê ku ew taxa hejaran e. Li mekanekî ji vê romanê xelkê vî taxa hejar li demê êvarîyan li ser çemî kom dibe û dema xwe bi kêfûxweşî diborandin:

“Li êvarîyan li ber lêva çemê kevn, agirek dihat hilkirin û hemû rengên wê lêk xir dibûn û muzîk dihat jenîn û sema dikirn. Li bin sahîya stêran stran û muzîk û kenî têkil dibûn.” (Mihemed, 2022: 68).

Li mekanekî din ji vê romanê, nivîskar wêneyê Çemî weha xuya dike ku bûye mekanekî pîroz bo kesayetîya serkîya vê romanê Hoşzanî. Dayîka Hoşzanî şîretan li kurê xwe dike û dibêjê, hişyar be ava çemî te li gel xwe nebe. Belê Hoşzan vî mekanî bi mekanekî parêzer û pîroz li qelem dide û dayîka xwe piştrast dike ku wî hevalînî li gel çemî heye û çem wî diparêze. Ji vê çendê xuya dibe ku ev mекane dibe yê bi metirsî be, dema ku ava wî radiibe, belê ew jê natirse û cure hevalînîyek li gel vî mekanî heye:

“Dayîka min digot min, hişyar be, rojekê ava vî çemî dê te li gel xwe bibe. Divêt têbigehî av û agir du tiştên tirsinak in dê te kujin, ew ji çî tiştî têr nabin. ... Min nedîşya bibêjim dayîka xwe, ji min netirse, min hevalînîyeka mezin li gel avê û çemê kevn û pêlên wî heye. Ew min diparêzin û ji çavên xelkê maytêker dûr diêxî.” (Mihemed, 2022: 77-78).

Ev mekanê vekirî çem di nav vê romanê da weku mekanekî xwedan karîn hatiye saloxdan ji bo cêbicêkirina hîvî û umêdên kesên bêdesthilat û hejar. Lehengê sereke yê vê romanê Hoşzan di arasteya vegêrana vê romanê da weha dîyar dike ku ew hîvî û umêdên xwe dinivîse û ew kaxez e dikire di nav bitlekê da û bitil dihavêt di

nav ava çemî da taku bigehe destê xweştivîya wî Gulê. Ji vê çendê xuya dibe ku çem li cem Hoşzanî bibû mekanekî veguhastinê ji pêxemet gehandina hez û hîvî û umêdan bo xweştivîya wî:

“Caran jî min name dinivîsîn û dikirine di betilan da û dihavêtin di rûbarî da û pêlên çemê kevn ew li gel xwe dûr dibirin. Min digot, belku li kinarekî bikevit destê Gulê.” (Mihemed, 2022: 163).

Gîfik

Gîfik weku mekanekî vekirî weha di nav rewşenbîrîya civakî da hatîye nîyasîn ku mekanekî pîs e û zibil lê tê komkirin. Di nav vê romanê da, gîfik weha hatîye wênekirinku mekanek e ji bo binaxkirina umdê û hêvîyan, anku ew omîd û hêvîyên li cem kesayetîya sereke ya romanê Hoşzanî heyn ku nahên cêbicêkirin yan jî di şîyan da ya nîne bên cêbicêkirin, wî ew hêvîyên xwe birin di nav gîfikê ji hemûyan pîstir li Gehnomê binax kirine:

“Nuke, min xewnên xwe hemû yên pêçayn û li ser gîfikê ji hemûyan pîstir li Gehnomê bingor kirine.” (Mihemed, 2022: 87).

Li mekanekî din ji vê romanê gîfik hatîye wênekirin weku mekanekî dibe eger ku gelek kes bi rêka komkirina karton û lekan parîyê nanê xwe ji nav derbêxin. Hoşzan kesayetîya sereke ya vê romanê di dîyalogekê da li gel Gulê xuya dike ku ew nikare biçe ser Gîfikê Mezin, ji ber ku gelek kes diçin wêrê bo komkirina karton û lekan:

“Min digotê Gulê, Gulê dê parîyekê nanî xom û dê likan komkim da bişêm subahî bifiroşim. Ez neşê biçime ser Gîfikê Mezin, yek: yê dûr e. du: gelek likefiroş tên wêrê û çi xêr têda nîne.” (Mihemed, 2022: 115).

Li dawîya vê beşê pêdivî ye amajeyê bidin hindê ku ev her heft cureyên mekanên vekirî yên ku me behis kirin, sereke ne û giştî ne di nav vê romanê da hatîn bercestekirin û karîgerîya xwe li ser hemî babetê romanê heye. Belê hindek cureyên din yên mekanê vekirî hene, belê çi karîgerîya wateyî û delalîya mezin li ser romanê nînin, lewra em bi fer nabînin bi dirêjî li ser rawestîna weku kolan ku her diçe jêr bazineyê taxa Gehnomê li gel vî taxî têkil bûye. Dîsa Şoste her diçe di çarçoveyê cadeyê da û li gel cadeyê wateya xwe gehandiye. Her wisa ev cureyên mekanî

Mekanên vekirî “Kanî û Daristan” çî karîgerîyê li ser tevaya rûdanên romanê nake, lewra me bi teselî behs nekir.

3.3.2. Mekanên Girtî

Çayxane

Yekem curê mekanê girtî di nav vê romanê da xwedan karîgerî li ser piranîya rûdanên romanê heye, çayxane ye. Anku Çayxaneya Roslîn yaku xwedanê wê kesayetîyeka lawekî ye bi navê Çîro. Çayxane di nav vê romanê da bûye navendek û piranîya kesayetîyên lawekî û kesayetîya sereke ya romanê Hoşzan li dor vî mekanî dizivirin, vê çayxaneyê navûdengîyeka mezin hebû û her kesekî bê wî bajarî pêdivî bû seredana vê çayxaneyê kirba, anku ev çayxane ye bibû dirûşim bo vî bajarî:

“Vê cadeyê hemûyê bi tenê çayxaneya Çîroy lê heye. Çayxaneyeka bi navûdeng e, her kesê bi mêhvanî û bi rêvîngî jî bê bajarî, dive sera çayxaneyê bide û çayekê lê vebixot. Ew moreke bi enîya bajêrî ve, ni tine çayê digere.” (Mihemed, 2022: 24-25).

Li mekanekî din ji vê romanê çayxane weku mekanekî wisa hatîye saloxdan ku ew kesên ji malên xwe bêzar dibin yan jî tore dibin, yekser qesta çayxaneyê dikin taku xema xwe lê birevînin. Her wisa gelek axivtin û dengûbasên bajarî li vê çayxaneyê dihatin gotin û belavkirin û navek bo hatibû danan û digotinê Westgeha Zanîn û Belbeleyê. Anku hindek kesan seredana çayxaneyê dikir, vê carê her yekê zanîyarîyek digot û bi vê çendê komeka zanîyarîyan li vê çayxaneyê xirve dibûn:

“Hemû entîkeyên bajarî li vê çayxaneyê xirve dibin, ewên ji malên xwe bêzar dibin yan jî ser karî westîyayî, karwanî û rebar yan heta şilatî êvelîyên kolanan hemû tén vêre û çayeka germ vedixon. ...vê çayxaneyê navûnîşanekê din hebû, digotinê Westgeha Zanîn û Belbeleyê. Heke yekê gotiba çî heye û çî nîne? Heta çayxane hatba girtin jî behis bi dawî nedihat.” (Mihemed, 2022: 28-29).

Kesayetîya sereke ya vê romanê Hoşzan, berdewam seredana çayxaneyê dikir û Çîroy xwedanê çayxaneyê rêzeka taybet bo Hoşzanê hebû û rojane dema ew diçû bitlên lastîkî komdikirin da biçe çayxaneyê û çayekê li çayxaneya Çîroy vexot. Mam Çîroy rêzgirtin li Hoşzanî digirt û gelek caran pareyê pîyaleya çayê wernedigirt. Ev çende dibû mekanê hêbetîyê hem bo Hoşzanî û dîsa hem bo ew kesên din li çayxaneyê. Her wisa gelek caran Mam Çîroy şîretên xêzanî li Hoşzanî dikirin. Her

weku babek şîretan li kurê xwe bike. Ev başî û qencîya Mam Çîroy li gel Hoşzanî fikir dibûne sedema hindê ku çendîn pirsyar li cem Hoşzanî peyda bibin. Ji ber ku çî kesan dilovanî bi wî nebirîye:

“Hemû spêdehîyan dema diçûm bitilên plastîkî yê vala û likeyên havêtinê vêdem û bibime dikana sere sûkê bifiroşim, min çayeka germ li çayxaneyê Çîroy ya weku rêzgirtin bo hevîna xwe bi Xan Roselîn navkirî vedixwar.

...qelsatî bibû morkek bi paş navê wî ve. Her kes ji dilovanîya wî bo mon hêbetî dibû û pirs ew bû ... çawa başîyê li gel vî Piştkovî dike? Hindeka bersiva xwe dida û digotin, dê bihêlin nakamekê xwelîser e bila wê xêrê ji destê Çîroy bibîne.

-Kurê min, eve tu ji hejde salîyê borî, weku zelaman reftarê bike. Rojên sext li pêşîya te ne. dilovanîya Mam Çîroy gumanek di hizra min ya şêlî da dirist û min pirsyar ji xwe fikir, boçî ev dilovanîya zêda? Nihênîya wî li gel min çî ye?” (Mihemed, 2022: 44-45).

Karîgerîya vî mekanê girtî Çayxaneyê li ser kesayetîya sereke ya vê romanê Hoşzanî gelek mezîn bû, gehişte wî radey, her gava Hoşzan li ber vê çayxaneyê ra diborî yan jî diçû çayxaneyê, yekser bîrhatineka dayîka wî dihat hizra wî ku her girêdayî Mam Çîroy bû. Dayîka wî şîret lê fikirin ku dema bivê bizane kanê babe wî kî ye? Yan jî her pirsêka hebe, her cem Mam Çîroy xwedanê çayxaneyê, dê bersivê bizane:

“Her careka di ber çayxaneyê ra diborî, bîrhatineka Mam Çîroy tê bîra min, hemû jê ew bûn yê dayîka min bo min gotin. Rast e Çîro li nik piranîya xelkî yê tehl û hestîgiran bû... Lê dayîka min çî cara ew nedîtû, her digot min, kurê min xelk çî dibêjin belê tu pirsyara xwe tinê bi Mam Çîroy bike, ew bi tenê dê ya rast bot e bêjît. Lewra jî min hest bi babîniya wî box we kir.” (Mihemed, 2022: 56).

Mala Êtîman

Kes li her mekanekî cîhanê hest bi aramî û xweşîyê nake. Tinê li mala xwe nebe. Mala Êtîman, ew mekanê girtî ye yê ku wan zarokan di hewînê yê ku mayîne bêsemyan di nav vê romanê da. Ev cure mekane hatîye rengvedan. Kesayetîya sereke ya vê romanê Hoşzan birîye Mala Êtîman, ji ber ku wî bab nebû, anku bebê wî ne yê dîyar bû, dayîka wî jî li taxa Gehnomê hatibû kuştin, ev car ma bû bêxwedan, ev rûdana kuştina dayîka Hoşzanî li ser hindek babet û dabûnerîtên kevnên civaka kurdî bû, ew bi xwe keseka bêguneh bû, belku ew û Hoşzan bibûne qurbanî bo dabûnerîtên kevn. Dema dayîka Hoşzanî hatî kuştin, bo demekê kesayetîya lawekî Mam Çîroy

ew li nav mala xwe xwedan kir. Belê piştî hîngê ji ber gotinên xelkî Mam Çîroy ew hinart Mala Êtîman:

“Hêj ez heft sal bûm, dayîka min ez hêlam di destê qederê da. Mam Çîroy bo demekî xwedan kirim. Piştî lome û axivtinên xelkî ku digotin vê bêesil û fesil dê çawa hêlîye di nav mala xwe da? Û şîret lê dikirin ke agirî ne berde dehmenên xwe, da xwe ji lomeyên xelkî biparêzî, ez havêtim Mala Êtîman.” (Mihemed, 2022: 50).

Piştî kesayetîya sereke Hoşzan ma ye li Mala Êtîman wî hest bi aramîyê nekir û vê carê dema du sal bi serveçûyn Hoşzan ji Mala Êtîman direve û her qesta taxa Gehnomê kir. Anku rast e hemî pêdivîyên jîyanê li nav Mala Êtîman hebûn, belê bo Hoşzanî mekanekî nexweş bû, hest bi aramîyê nedikir, lewra biryar da ji wî mekanî bireve:

“Piştî du salan ji manê, ji Mala Êtîman bi yekcarî revîm, weku her car min qesta mekanê bûna xwe kir ku bêhna dayîka min jê dihat, henaseyeka kûr û bêhneka fireh dida min.” (Mihemed, 2022: 113).

Mal/Kolik

Mala mirovî ew biyavê mekanê taybet e bi mirovî ve û mirov ji hemî alîyan ve hest bi aramî û xweşîyê dike. Mala Hoşzanî gelek sade bû, ji karton, teneke û totîyan çêkiribû, belê Hoşzan gelek yê aram bû di nav vê male da û dema ew ji Mala Êtîman derket, wî yekser qesta mal-kolikê xwe kir û wî hizir dikir di nav mala xwe da yê serbixwe û azad e:

“Da agirekê hilkim û li ber têhan wî, min û perdaxa xwe, xwe germ dikir. Ew ça, dibin wê kolikê ji kartonan, piştî ji Mala Êtîman derketim, min box we li ber kinarê cemê kevn li taxa Gehnom çêkirî, weku padîshahekî ew ça vedixwar. Wê kêlikê min xwe ji her tiştî bilindtir didît...
... Lê piştî ji Mala Êtîman derketim, êdî min hest dikir ku serbixwe ya min di tinêbûna min da ye.” (Mihemed, 2022: 47).

Dikan

Hoşzan kesayetîyeka sereke ya vê romanê, karê wî komkirina karton û bitilên lekî bû. Piştî ev kelûpel e ji nav sitlên gilêşî kom dikirin û dibirine bazarî û difirotime dikanekê ku dikeve sere bazarî. Dikan li vêrê weku mekanekî girtî yê ku dibe mekanekî xwedan delalet di nav rûdanên vê romanê da, ji ber ku dibe ew mekan e yê ku dibe sedema firotina kelûpelên Hoşzanî, ku bi vê rêkê dişet debara jîyana xwe bike:

“Min bitil komkirin û birine wê dikana li sere sûkê firotin. Min pareyê xwe hijmartin.” (Mihemed, 2022: 99).

Mala Çîroy

Kesayetîya lawekî Çîroy xwedanê çayxaneyê ye, mala wî dikeve qatê duyê ji avahîya çayxaneyê, anku li vêrê du mekanên girtî di nav yek pêkhatîyê da ne. Vî kesayetî gelek alîkarîya Hoşzanî û Dayîka wî dikir û xanîyê wî Qatê Duyê ji avahîya çayxaneyê ku ji sî jûran û lîwank û lînangeh û tewalêt û serşûyan pêkdihat. Ev jimareya mezin ya jûran yê xanîyê Çîroy amajeyek e bo hindê ku ew ji çîna dewlemend û xwedan desthilat e:

“Nihomê duyê yê çayxaneyê, mala wî bû, sê mezelik û lîwaneka mezin û lînangeh û tewalêt û serşoyeka ava germ Cakozî danabû.” (Mihemed, 2022: 26).

Xwendingeh

Helbet xwendingeh weku mekanekî girtî karîgerîyeka mezin li ser kesayetîya mirovî heye û dibe mekanek ji bo veğerandina bîrhatin û bîrewerîyan, anku em dikarin bibêjin mekanekî aşna ji bo mirovî, belê xwendingeh di nav vê romanê da bûye mekanekî girtîyê nexweş ji bo Hoşzanî, ji ber ku dema ew li xwendingehê hevalên wî gelek yarî pê dikir û êşandin digehandinê, lewra ev mekan e bo Hoşzanî dibû mekanekî girtîyê karî û pîrî nexweşî:

“Li fêrgehê heta şeşê seretayî min xwend bû, fêrî xwendin û nivîsînê bûm. Leş û derûnê min yê şkestî wekir bû fêrxwaz qese û gotinên kirêt bêjin min, qeşmerîyan bi min bikin.” (Mihemed, 2022: 78).

Ev yarîkirine bi Hoşzanî berdewam dibû di nav Xwendingehê da ta ku li dawîyê rêveberê xwendingehê dihat û ew xwendekarên din yê ku yarî bi Hoşzanî dikir, vê carê ji nû ew xwendekar e direvîn û her ev sedem e bûye ku Hoşzanî xwendingeh hêlayî:

“Dema rêveberê fêrgehê dihat, ew bi qêjî da revin û xeware bin. Vedana dengê wan tijî mejîyê min dibû, bi rojan ew deng ji kiloxê sere min dernediket.” (Mihemed, 2022: 79).

Sergor

Kesayetîya sereke ya romanê Hoşzan piştî ku jîyê wî bûye hejde sal hezeka mezin bû wî çêbû ji nû biçe ser gorê dayîka xwe. wî nedizanî, kanê gora dayîka wî li kûve ye. Vê carê daxwaz ji Mam Çîroy kirk u li gel bê ser gore dayîka wî. vî mekanî ew hestê xemgîn bo Hoşzanî peyda kir, yê ku eve çendîn sal in jê bêbehîr bûyî û aramîyeka derûnî bowî peyda kirbû:

“Lê piştî ez bûyeme hejde sal, min peroşîyek mezin ji bo dayîka xwe hebû, min divîya dûmahî westgeha lê hatî veşartin û mala wê ya duyê bibînim. Êvarîyeka direng min ji Mam Çîroy xwast ku hîngê di rêwremekê şermîn yê veşartina termê dayîka min da yê amade bû, gore dayîka min nîşa min bidit. Nîşan min da, di destnîşankirinê jî da yê dudil bû, got, hema dê eve bit.” (Mihemed, 2022: 51).

Nexweşxane

Kesayetîyeka lawekî bi navê Biro Pitat heye. Ev kesayetî alîkarîya Hoşzanî û Dayîka wî dikir û Hoşzan li gel wî diçû di pîkema pitatan da û li gel kar dikir. Rojekê Hoşzan nexweş dibe û ev kes e Biro Pitat wî digehîne nexweşxaneyê û bitlekê xwîne bo wî peyda dike û jîyana wî qurtal dike, anku nexweşxane bûye mekanekî nexweş bo bîrhatinên zarokîniya Hoşzanî:

“Rojekê Biro Pitat bi hawarkî gehandim nexweşxaneya Hawarharinê, min pêdivî bi xwîne hebû, xwîna min jî xwîneka qelis, di şîyan da bû hemû cureyan werbigire. Biro Pitat bitlekê xwîne bo min îna.” (Mihemed, 2022: 147).

Li dawîya vê beşê pêdivî ye amajeyê bidin hindê ku ev her heşt cureyên mekanên girtî yên ku me behis kirin, giştî û sereke ne û karîgerîya xwe li ser hemî babetê romanê heye. Dîsa hinek cureyên din yên mekanên girtî di nav vê romanê hatine, lê çi karîgerîyek li ser arasteya rûdan û vegêrana babetê romanê nînin, lewra me bi fer nedît, em nimûneyan ji van cureyan şirove bikin, weku vêla, pol, hewiş, Kelha Mezin, çêştxane.

ENCAM

Mekan mina rêgezeke hunerî yê pêkhateya romanê, bi rengêkî kûr û berfireh di nav her du romanên *Sotingeh û Gehnomê* da berceste bûye. Belku bi dîtina me her rehenda mekanî bûye sedem ku hemû rêgezên din yê hunerîyên metnên her du romanên navhatî kara û çalak bibin, belge jî li ser vê gotina me ewe ku navûnîşanên her romanê her ji mekanî hatine afirandin. *Sotingeh* anku ew mekan e yê tiştek di nav da tê sotin ku derbirîne ji zindanên rejîma Beasê dike. *Gehnom* anku ew taxa hejar û belengazan e.

Peywendîya mekanî bi kesayetîyên romanê ve bi rengêkî baş û bijare di nav her du romanên da hatine encam dan. Di romana *Sotingeh* da, peywendîyên rasterast yê mekanî bi kesayetîya sereke ya romanê ve ya bi navê Sîyabend hene. Di romana *Gehnom* da peywendîyên rasterast yê mekanî bi kesayetîya sereke ya romanê ve ya bi navê Hoşzan hene. Dîsa her du romanên li ser astê peywendîyên mekanî bi kesayetîyên lawekî jî ve peywendîyên rasterast berceste kirine.

Peywendîyên mekanî bi rûdanên her du romanên ve bi rengêkî baş û bijare hatine encam dan. Di nav romana *Sotingeh* da, peywendîyên mekanî rasterast bi rûdana girtin û zindankirina kesayetî ya sereke ya romanê ve Sîyabendî hebûye. Di romana *Gehnom* da, peywendîyên rasterast yê mekanî bi rûdana revîna lehengê romanê Hoşzanî ji mala êtîman heye. Dîsa peywendîyên rasterast yê mekanî bi rûdanên kesayetîyên lawekî yê her du romanên ve hene.

Peywendîyên mekanî bi demê her du romanên ve gelek bi başî berceste bûne di nav arasteya vegêrana wan da ku bûne sedem ku pitir naverok û babetên her du romanên ji bo xwendevanan aşkera bibin û bi giştî behsa dema rojê hatîye kirin. Mina Spêde û Êvarê. Her wisa behsa werzan û dema borî jî hatîye kirin.

Peywendîya mekanî bi diyaloga romana *Sotingehê* ve gelek bi başî hatîye encam dan û bûye sedem ku gelek wateyên wan mekanan derbirîne ji rûdan û babetên romanê bike. Lê beşê diyalogê bi giştî di romana *Gehnomê* da bi rengêkî lawaz di nav da hatîye encam dan. Ev car vê çendê karîgerî li ser peywendîyên mekanî kirîye bi diyaloga romana navhatî ve ku çend peywendîyekên sade û ne berceste di nav da tên dîtin.

Cureyên mekanî yê vekirî û yê girtî, bi rengêkî hemecur û berfireh di nav her du romanên da hatine rengvedan. Belê di romana *Sotingeh* da pitir heme curîya

cureyên mekanî hatîye bikaranîn ji romana *Gehnomê*. Di nav romana *Sotingehê* da mekanên vekirî yên weku bajar, cade, gund û tax weha hatîye wênekirin ku li jêr kontrola rejîma Beasê ne û ev mekan dagîrkirî ne. Di romana *Gehnomê* da cureyên mekanên vekirî yên weku bajar, taxa Gehnom, cade, gorepan weha hatine saloxdan ku wateya çînatîya civakê û çîna hejar û belengazan bo mînak taxa Gehnomê taxa hejar û belengazan e û xizmet têda gelek kêr in.

Cureyên mekanên girtî di nav romana *Sotingehê* da pitir tekezê li ser avahîya girtîxaneyê û zalgehên serbazî kirîye, ku derbirînê ji wê rewşa nexweş û nalebara xelk di nav da dijîya li serdema rejîma Beasê. Di nav romana *Gehnomê* da, pitir cextî li ser Çayxaneya Roslîn û Mala Hoşzanî û Mala Êtîman hatîye kirin ku derbirîneka rasterast jo wê rewşa civakî û aborîya xelkê taxa Gehnomê bi giştî û lehengê romanê Hoşzanî dike. Di nav her du romanên da, nivîskar karîyebi şarezayî cureyên mekanî di her du astan da bikar bihîne ji pêxemet xizmetkirina babetê sereke yê romanê anku ji bo derbirîna wateya sereke ya romanê.

Ew şarezayîya nivîskarî bi kar anî ji bo behiskirin û erkdarkirina mekanî di nav her du romanên da bûye sedem ku nermatîyekê bixe di nav hemû rêgezên din yên hunerî da di nav her du romanên da û di encam da karîye pitir xwendevanê romanê bo babetê rabikêşe. Hûrbînîya nivîskarê romanê di hilbijartina cure mekanî di nav her du romanên da ji bo wê rûdana guncay yan dîyaloga guncay li gel vî cureyê mekanê bi kar hatî, ev çend e bûye sedem ku dîmenên rûdan û dîyalogan pitir aşkera bibin di nav kesayetîyan da û derbirînê ji babetê romanê bikin. Nivîskarê romanê karîye bi rengekî metodî û plankirî hemû cureyên mekanî di nav her du romanên da biêxe di xizmeta îdolojî û naveroka romanên xwe da û vê çendê hevterîbîyek di navbera cureyên mekanî, babet û hizrên romanên da çêkirîye.

ÇAVKANÎ

- Abadî, F. (1952). *el-Qamûs el-Muhît*. Qahîre, Misir: Mustefa.
- Alneseer, Y. (2004). *Roman û Mekan - Ansîklopedîya Biçûk*. Bexda: Weşanên Rewşenbîrî.
- Baxtîn, M. (1986). *Şi'rîyet Distufîskî*. (C. N. el-Tikritî, Trans.) Bexda, 'Îraq: Toqbel.
- Benînî, Z. (2008). *Bunyet el-Xîtab el-Riwayî 'Inde Xadet el-Seman – Miqaribet Binyewîyet*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha el-'Eqîd el-Hac li Xîzr-Batînet-. Teza Doktorayê.
- Bexadid, X. (2017). *Bunyet el-Serd fî Riwayet el-Cezaîrye el-Muyeyser Quzt el-Şerîf li 'Ebdulehab Mensor Enmozecen*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Wehran. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Beyhatî, H. (2016). *Bunyet el-Hedes fî el-Mecmu'et el-Qerabîn li 'Îsa Şerît*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Bouira. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Bil'abid, E. (2008). *'Itbat, Cîrar Cînît min el-Nes îyla el-Menas*. Cezayîr: el-Dar el-'Erebyet lil 'Lum Naşrun.
- Bin Berîket, A. (2016). *El-Bunyet el-Serdîyet fî Riwayet Seyîdet el-Muqam li Wasînî el-E'rec*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha bîskera.
- Bin Haşim, Y., Ye'îşawî , H., & Qorarî, S. (2017). *Cemaliyat el-Mekan fî Riwayet Kamarad Refîq el-Heyf wel-Zaye*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Ehmed Diraya-Edrar. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Bin Tîşet, E., & Basî, E. E.-T. (2019). *Bunyet el-Şexsiyet el-Riwayet, Diraset Tetbîqîyet fî Riwayet Men Qetele Es'ed el-Mirorî lil Hebîb el-Saîh*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Şehîd Hemme Lexzer. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Botî, K. (2002). *Ferhenga Kameran Kurdî-Kurdî*. Dihok: Weşanên Spîrêz.
- Brinis, C. (2003). *Qamûs el-Serdîyat*. Qahîre, Misir: Mîrît lil Neşîr wel-Me'lumat.
- Buqret Şehret, & Ehlam, Ş. (2017). *El-bunyet el-Serdîyet fî Riwayet "Îmreet Bila Melamîh" li Kemal Borkanî*. Cezayîr: Zanîngeha Ûm el-Bowaqî. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Bû'ze, M. (2010). *Tehlîl el-Nes el-Serdî Teqnîyat we Mefahîm*. Cezayîr, Cezayîr: Îxtîlaf.
- Doskî, M. E. (2016). *Ferhenga Spîrêz Erebbî Kurdî*. Dihok, 'Îraq: Spîrêz.
- Ebas, H. S. (2017). *Romana Mêjûyî ya Kurdî Romanên Mihemed Selîm Siwarî Wekî Nimûne*. Zaxo, 'Îraq: Zanîngeha Zaxoyê. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- 'Ebdullah, L. O. (2018). Enwa' el-Mekan fî Riwayet el-'Erîz el-Kofe li Riwayet 'Ebdilhadî el-Fertuzî. *Govara el-Istaz*(22), 123.
- 'Ebdulrehman, M. (2021). *Rengberbûn*. Tehran : Weşamxaneyê Tehran .
- 'Ebdulrehman, M. (2023). *Peyvîna Avê Di Werzekê Behêda*. Dihok: Weşnaxaneyê Dezgehê Xanî yê Rewşenbîrî.
- 'Ebidulhuseyîn, M. Ş. (2017). *el-Zeman fî el-Riwayat 'Ebdilrehman Mecîd el-Rebî'i Diraset el-Seridîyet*. Bexda, 'Îraq: Zanîngeha Qadîsiye. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- 'Ebidulqadir, S. H., & Nasirî, W. (2018). *Delalet el-Mekan wel-Zemen fî Riwayet" Bab el-Sebt" li 'Ebid el-Qadir Mehdawî*. Cezayîr: Zanîngeha Şehîd Hemme Lexzer. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Ehmed, Ş. î. (2007). *Bunyet el-Şexsiyet fî E'mal el-Rezaz el-Riwayet: Diraset fî Zew el-Menahic el-Hedîse*. Uman, Urdun: Zanîngeha Mute. Teza Doktorayê.

- El-Behrawî, H. (2016). *Bunyet el-Şîkil el-Riway*. el-Muhemedîye, Fas: Weşanxaneyaya el-Merkez el-Seqafî el-'Erebî.
- El-Be'lebekî, M. (2008). *El-Mewrud el-Hedîs Qamûs Încilîzî-'Erebî*. Beyrut, Lubnan: Dar El-'İlmî lîl Melayîn.
- el-Cerîf, M. S. (2012). Bunyet el-Zemen fî el-Riwayet, Dîraset Tedbîqîyet li Riwayat el-Tis'înyat lîl Katib 'Ebidulkerîm. *Kovrara Îtîhad el-Camî'at el-'Erebîyet lîl Adab*(2), 1014.
- el-Cibûrî, Q. C. (2016). *el-Mekan fî Riwayat Tehsîn el-Kermîyanî*. Bexda, 'Îraq: Zanîngeha Alil Beyt. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- el-De'mî, R. H. (2017). *Bîna el-Şexsîyet fî Riwayat Mislun Hadî*. Bexda, 'Îraq: Zanîngeha el-Qadisîye. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- el-'Emorî, N. (2021). el-Mekan fî Riwayat Sebar we li Şakir el-Meyyah. *Kovara Larik*(41), 56.
- el-'Emrî, X., & Sehnîn. (2015). *el-Zemen el-Serdî fî Riwayetî "el-Halim" we "Yewm Rai" lîl Mewt" li Semîr Quseymî*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Ûm el-Bowaqî. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- el-Herbî, F. B., & 'Ubeyd, H. K. (2019). Bunyet el-Zemen fî Quses (Malayetebeqî lîl Însîan) li ('Bid el-Emîr el-Mecir). *Kovara Merkez Babil lîl Dîrasat El-Însanîyet*, 4(9).
- el-Nedşed, C. '. (2012). *el-'Ulema fî Riwayat Sehir Xelîfe*. Nablus, Filistîn: Zanîngeha el-Nejah Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- el-Reşîdî, B. N. (2012). *Sûret el-Mekan el-Fenîyet fî Şî'r Ehmed el-Seqef*. Oman, Urdun: Zanîngeha el-Şerîq el-Ewset. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- el-Tuncî, M. (1993). *Ferhenga Tesel di Edebîyatê da*. Beirut, Lebanon: Weşanxaneyaya Pertûkên Zanistî.
- el-Zehra, ' F. (2018). *el-Mekan Wedelalethî fî el-Rirwayet el-Mixarbîyet el-Mî'asire*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Cîlalî Lîyabes.
- Ewîlîye, R. B. (1991). *'Alem el-Riwayet*. (N. el-Tikrîtî, Trans.) Bexda, 'Îraq: Weşanxaneyaya Dar el-Şun el-Seqafîye el-'Ame.
- 'Ezîz, B. Î. (2012). *el-Hîwar fî Xîtab Celîl el-Qeysî el-Qesesî*. Bexda, 'Îraq: Zanîngeha Selaheddîn. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- 'Ezîzî, K. (2016). *Bunyet el-Hîwar fî Kibîrya we Hewa Lecîn Ostin*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha el-'Ereb. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Feradî, H. (2016). *El-Şexsîyet fî Riwayat "Meymunet"*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha bîskera. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Fetah, ' E. (2021). Tîqnîyat Bîna el-Şexsîyet fî Riwayat (Ser Sere fewqe el-Nîl). *Zanîngeha Bexdad Kulîye el-Adab*(102), 47.
- Foxalî, B. (2008). *el-Zeman wel-Mekan fî el-Şî'r el-Cahilî*. UMAN: Kovara el-Adab wel-'Ulum el-Însanîyet.
- Hacî, N. E. (2012). *Îstatîka Mekanî Di Hozana Hevçerxa Kurdî Da Li Devera Behdînan 1980-1990*. Dihok, 'Îraq: Zanîngeha Dihokê. Teza Doktorayê ya Çapnebûyî.
- Hefîdî, E. (2010). *Bunyet el-Zeman wel-Mekan fî Riwayat Muzexer 'Elîya li Reşîd Boseydîre*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Wehran. Teza masterê ya Çapnebûyî.
- Hemîdatu, C., & 'Emarî, K. (2019). *Bunyet el-Serd we Cemalîyet wel-Tefasîl (el-Hedes, el-Mekan, el-Şexsîyet) fî Riwayat Tîyor Eylol li Îmli Nesrullah*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Şehîd Hemme Lexzer.

- Hemîdî, N. (2015). Bunyet el-Hedes fî Riwayet "Behir el-Semit" li Yasmînet Salih. *Kovara Me'rîfet*(1), 58.
- Hemod, H. M. (2015). *el-Zeman wel-Mekan fî Bunyat el-Ş'r el-Hedis: Qesaîd Ehmed el-Mu'eynî*. Cezayîr, Cezayîr: Weşanxaneya Cidara.
- Henîye, C. (2013). *Suret el-Mekan we Delaletîhî fî Riwayat Wasînî el-E'rac*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha bîskera.
- Hesen, S. E. (2014). *el-Şexsîyet fî E'mal Ehmed Refîq 'Ûz el-Riwayet Dîraset fî Zew el-Menahic el-Neqdiye*. Xeza, Filistîn: Zanîngeha el-Îslamîye. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Îsmâîl, M. E.-S. (2010). *Bîna Feza el-Mekan fî el-Qise el-'Erebîyet el-Qesîre*. Qahîre, Misir: Weşanxaneya Daîret el-Seqafet wel-E'lam.
- Kazim, ' . H., & Kazim, S. C. (2012). Bunyet el-Hedes fî el-Î'traf el-Exîr li Malik bin Reyb. *Kovara Merkez Dîrasat el-Kufe*(25), 67.
- Kuyr, M., & Derdax, ' . (2017). *Bunyet el-Zeman wel-Mekan fî el-Riwayet el-Cezâîrîyet el-Mi'asîret Riwayet "Meqamat el-Zakîret el-Mensiye" Enmozecen*. Bexda, 'Îraq: Zanîngeha el-Şehid Hemme Lexzer. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Le'tîqî, F., Tiwatî, S., & Bin 'Elî, L. (2013). *Şi'rîyet el-Mekan Rîwayet "Celdet el-Zul Men Qale lî Şem'etî uf?" li 'Bid el-Rirzaq Bukbe" Enmozecen*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha el-'Ereb bin Mehdî. Teza Çapnebûyî ya Masterê.
- Lihemdani, H. L. (1991). *Bunyet el-Nes el-Serd. Min Menzor el-Neqid el-Edebî*. Beyrut, Lubnan: Weşanên El-Merkez el-Seqafî el-'Erbî.
- Lotman, Y. (1998). *Muşkîlet el-Mekan el-Fenî*. (S. Q. Diraz, Trans.) Beyrut, Lubnan: Weşanxaneya Elif.
- Menfirêd, C. (2011). *'Lum el-Serd- Mudxil Îlla Nezerêyet el-Serd*. Dîmesq.: Weşanxaneya Dar Neynewa lil Dîraset wel-Neşir wel-Tewzî'.
- Mihemed, B. (2005). *Sotingeh*. Dihok: Yeketîya Nivîskarên Kurd.
- Mihemed, B. (2022). *Gehnom*. Dihok: Yeketîya Nivîskarên Kurd.
- Moqerî, S. B. (2017). *el-Bunyet el-Zemenîyet wel-Mekanîyet fî Riwayet "Zakîret el-Cesed" lî Ehlam Mustexanîmî*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Muhemed bu Zîyaf- el- Mesîlet. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Mu'emerî, E. (2004). *Bunyet el-Xitab el-Serdî fî Riwayet "Fewza el-Hewas" li: Ehlam Mustexanimî*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Werqele. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Muhemed, E. B. (2018). *el-Hedes el-Riwaî wel-Royet fî el-Nes*. *Kovara Dewa*(12), 21-22.
- Muhîy, Î. H. (2016). Bunyet el-Hîwar fî Riwayet (Beyne el-Qelbeyn) lil Rîwaî ('Elî Xeyun) Dîrasrt Fenîye. *Kovara Kulîye el-Terbîyet el-Esasîye*(15), 61.
- Murtaz, A. (1995). *Şîrovekirina Gotara Vegêranê Ji Alîyê Helweşangerî û Semiyolojîyê ve*. Cezayîr, Cezayîr: Weşanxaneya Çapemenîya Zanîngehê.
- Mustefa, Q. (2009). *el-Delalat el-Wezîfîyet lil-Şexsîyet el-Hekaîyet fî Edeb el-Ezmet Riwayet el-Serab li Beşîr Muftî Unmozîcen*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Bîskera. Nameya Masterê ya Çapnebûyî.
- Nayif, D. F. (2022). *Seqafet el-Hîwar fî el-Riwayat el-'Raqîyet Riwayat 'Ebdulxaliq el-Rukabî Enmozecen*. *Kovara Lark*(46), 591.
- 'Ubeydî, M. (2011). *Cemalîyat el-Mekan fî Sulasîyet Henna Mîne*. Şam, Sûrye: Weşanxaneya El-Heyet el-'Amet el-Surîyet lil Kîtab.

- Qadir, R. H. (2006). *Mekan Di Romana Kurdî ya Devera Behdînan Da - Geryan li Babe Berze û Dozexa Mirinê Wekî Nimûne*. Dihok: Weşanên Yeketîya Nivîskarên Kurd.
- Qasimî, F. H., & Sa'dî, E. E. (2018). *Diraset el-Kirunutub el-Tehlîlîyet Min Menazir Mixaîl Baxtîn fî Riwaye "Du Dinya" we "Zakiret el-Cesed", bi Bihus fî el-Edeb el-Moqarin, Fesîlet 'Lmmîye- Mehkmet, el-Sinet ek-Sabi'et* (Cilt 28). Sinne, Îran: el-Şita.
- Qassim, S. (1978). *Bîna el-Riwayet: Dîraset Muqarînet li Sulasîyet Necîb Mehfu*. Qahîre, Misir: el-Heyet el-Mîsryet e-'Amet lil Kîtab.
- Qesrawî, M. H. (2004). *Bîna el-Zemen fî el-Riwayet el-'Erebîyet-Neqid Edebî*. Beyrut, Lubnan: Dar el-Nesir.
- Qewasim, E., & Qeys, Ş. (2019). *Cemalîyet el-Mekan fî Riwayet "el-Melîket" li Emîn el-Zawî*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Zanîngeha Şehîd Hemme Lexzer. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Raxib, N., & Hamidî, F. (2017). *Cemalîyet el-Mekan fî Riwayet Îmarat bil Sefîr fî Newal el-Se'dawî*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Buîyret. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Rehîm, Î., & Bil'uzuqî, M. (2021). *Alîyat el-Te'edid el-Luxewî we Hîwaryet el-Xîtab fî el-Riwayet 'Înde Mixaîl Baxtîn*. Kovara el-Mudewinet, 8(3), 3261-3276.
- Rizqî, Y., Bilkwasî, Y., & Semad, N. (2020). *Tecelîyat el-Mekan el-Meftuh fî Riwayet Lasîyra Dîmuyirtî*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha el-buyret. Teza Lîsansê ya Çapnebûyî.
- Roşdî, R. (1962). *Fen el-Qîsse el-Qesîre*. Qahîre, Misir: Ancilo.
- Sabîr, P. (2006). *Bînayî Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengî Diwemî Cihanî*. Silêmanî: Serdem.
- Şahîn, M. S. (2017). *El-bunyet el-Serdîyet fî Riwayat Ehmed Refîq 'Ewz "el-Qermetî", "'Eka wel-Miluk*. Kovara Mubte'es(69).
- Salih, S. (1997). *Qedaya el-Mekan el-Riwaî fî el-Edeb el-Mu'asîr*. Qahîre, Misir: Dar el-Şerqîyat.
- Sehlî, N. (2020). *Cemalyet el-Mekan fî Riwayet "Xeden Yewm Cedîd" li 'Ebdulhemîd Bin Hedûqe*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Ebû Bekir Belqaîd. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Şelaş, X. E. (2011). *el-Mekan wel-Mustelihat el-Mîqarîbet-Dîraset el-Mefhumatîyet*. Mûsil, 'Îraq: Zanîngeha Mûsil.
- Semar, K., & Şakîr, L. (2014). *Tecelîyat el-Mekan fî Riwayet Eşbah el-Medînet el-Meqtulet li Beşîr Muftî*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Ûm el-Bowaqî. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Şiwax, F. E. (2018). *el-Bîna el-Fenî lil Riwayet el-Îmaratîyet "Riwayet Mîn ey Şey Xulîqet? "lil Riwayet Mîsa el- Muhîryî Enmozecen*. Sûdan: Zanîngeha el-Neylîn. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Suleyman, B. X. (2013). *el-Hîwar fî Riwayet el-Î'sar wel-Mezenet li 'Îmad el-Dîn Xelîl - Dîraset Tehlîlîlet-*. Kovara el-Kulîyet el-'Lum el-Îslamîyet(13), 347.
- Tewam, E. (2016). *Delalat el-Feza el-Riwayî fî Zull Me'alim el-Sîmyaîtet*. Cezayîr: Zanîngeha Wehran. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Umer, E. E. (2007). *Şirîyeta Romanên Sidqî Hirorî*. Dihok, 'Îraq: Zanîngeha Dihokê. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Wehbe, M., & El-Muhendîs, K. (1984). *el-Mu'cem el-Mustelihat el-'Erebîyet fî el-Luxet wel-Edeb*. Beyrut, Lubnan: Weşanxaneya Mektebet Lubnan Naşîrun.

- Xadet, A. (2002). *Cemaliyat el-Mekan fi el-Ş'r el-'Erebî el-Moyeyser*. Tehran, İran: Weşanxaneya el-Xerîb.
- Xelîl, Î. (2010). *Bunyet el-Nes el-Riwaî*. Beyrut, Lubnan: Weşanxaneya el-Dar el-'Erebîye lil 'Lum Naşîrun.
- Xerîb, S. (2016). *Şi'rîyet el-Mekan fi Riwayet " el-Wiladet el-Sanyet" li 'Umer el-Bernawî*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha bîskera. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Xuzir, X. H. (2012). *el-Mekan fi Riwayet el-Şemma'iyet lil Rawy 'Ebdilsettar Nasir. Kovara el-Adab(102)*.
- Yemîne, B. (2021). *Bunyet el-Şixêye fi el-Rîwayet el-Cezaîrye el-Mitercime Rîwaye "el-Sedme" li Yasemîne Xezra Enmozecen. Kovara 'Lum el-Însanyet(69), 126*.
- Yeqtîn, S. (1997). *el-Xîtab el-Riwaî el-Zemen el-Serd el-Tesîr*. Beyrut, Lubnan: Weşanxaneya el-Merkez el-Seqafî el-'Eerebî.
- Yusif, A. (1997). *Teqniyat el-Serd fi el-Nezerîyet wel-Tetbîq*. Şam, Sûrye: Weşanxaneya el-Mueseset el-'Erebyet lil Dîrasat wel-Neşîr.
- Zaqot, W. M. (2019). *el-Bunyet el-Serdîyet fi Riwayet "Ehmed 'Umer Şahîn"*. Gaze, Filistîn: Zanîngeha el-Îslamîyet. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Zawî, E. (2015). *Bunyet el-loxet el-Hîwar fi Riwayet Muhemed Mîflah*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Wehran. Teza Doktorayê ya Çapnebûyî.
- Ze'reb, S. E. (2006). *Cemaliyat el-Serd fi el-Xîtab el-Riwayî*. Oman, Urdun: Weşanxaneya Mecid Lawî.
- Zetdîn, N. M. (2009). *Avakirina Rûdanê Di Romana Dawîya Şervanekî û Sontingehê Da*. Dihok, 'Îraq: Zanîngeha Dihokê. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Zexad, A., & 'Elam, S. (2020). *Bunyet el-Şexsîyet fi Riwayet Zebab Axir el-Nehar li Mustefa Weled Yusif*. Cezayîr, Cezayîr: Zanîngeha Bouira. Teza Masterê ya Çapnebûyî.
- Zeytonî, L. (2002). *Mu'cem Mustelehat Neqid el-Riwayet*. Beyrut, Lubnan: Weşanxaneya Dar el-Nehar.



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



22/04/2024

Tez Başlığı / Konusu

MEKAN DI ROMANËN BİLİND MİHEMEDÎ DA (MÎNAKA SOTİNGEH Û GEHNOMÊ)

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 97 sayfalık kısmına ilişkin, 22/04/2024 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından %0 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 0 (Yüzde sıfır) dur.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

22/04/2024

MUSAFAER SHARIF NASER NASER

Adı Soyadı : **MUSAFAER SHARIF NASER NASER**

Öğrenci No : 14950001083

Anabilim Dalı : **Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı**

Programı : **Örgün Eğitim**

Statüsü : Y. Lisans ☒ Doktora ☐

DANIŞMAN

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

18/04/2024

**ENSTİTÜ ONAYI
U Y G U N D U R**

20/04/2024

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

Enstitü Müdürü